

PERWERDE Û HÎNKIRINA KURDÎ: TECRÛBE-MODEL-PÊŞNIYAZ

Weqfa Îsmâil Beşikçi – Akademiya Payîzê

Edîtor: Şehmus KURT

2021

PERWERDE Û HÎNKIRINA KURDÎ: TECRÛBE-MODEL-PÊŞNIYAZ

Weqfa Îsmâil Beşikçi – Akademiya Payîzê

Edîtor: Dr. Şehmus KURT

NAVEROK

PÊŞGOTINA EDÎTORÎ

Ji Alîyê Felsefeya Perwerdeyê ve Perwerdeya Kurdî¹

Nurettin Beltekin²

DESTPÊK

Herwekî têtê zanîn di zanistê da du êkolên sereke hene: ekola giştî (ing. main stream, tr. ana akım) û ekola rexneyî (ing. critical, tr. eleştirel). Ekola giştî, zêdetir li jêr tesîra dewletê, pêwistiyên dewletê û yên bazarê şiklê xwe girtiye; bi gotineke din hemû zanîn û zanyariyên vê êkolê li gor pêwistiyên dewletê û bazarê nê. Berevajî wê, ekola rexneyî ew zanîn û zanyariyên ku ji bo dewletê, anku ji bo desthilatdar û hakimî hatîye çêkirin deşifre dike. Ji ber ku zanyariyên ekola giştî ji aliyê raya giştî ve wek rastî têne qebûlîkirin, ekola rexneyî wek armanc wan zanyariyan deşifre û pûç dike. Ew wiha dibêje, zanyariyên ku hûn dibêjin zanistî ne, di eslê xwe de ew zanyariyên zanistî nînin, erê belkî bi rêbaza zanistî hatîbine bidestxistin, lê ew ne li gor pêdiviyên însaniyetê, lê li gor pêdiviyên dewlet û bazarê hatîne hilberîn, anku ji bo pêdiviyên hinek însanên desthilat. Xeta min bi xwe ya akademî ev xeta rexneyî ye û ez li ser vê xetê dixebitim. Di warê perwerdeyê da jî ji vê xetê ra dibêjin perwerdeya rexneyî (ing. critical education, tr. eleştirel eğitim). Ekola giştî ya zanistê dibêj perwerde, xwendin û xwendîngeh ji bo pêdiviyên dewlet û bazarê ye. Lê ekola rexneyî dibêje nexêr, perwerde heq e, ew divê ji bo hemû mirovan bête dayîn. Ez di vê xebata xwe da li ser wan koman yan kesan bixebitim ku ji heqê perwerdeyê mane û dewlet û perwerdeya fermî pêdiviyên wan nabînin.

Ferqkirina êkolên ku di jor de hatîye behskirin bi reya felsefeya zanistî mumkun e. Felsefeya zanistî hewl dide ku xebatên pewrwerdehî bi awayê pirhêjmar bê kirin. Xebatên ku bê felsefe tînin kirin xeter e. Jiber ku formên zanistî jibo ihtiyacên desthildaran hatîye amde kirin. Ew jî zanist tînin ya xwe didin qebulkirin. Halbukî zanist ligor nêrînan, bawerîyan, qebulên pêşin, armanc ued. diguhere û bi vê şiklê pirhêjmar dibe. Perwerde jî ligor nêrînan, bawerîyan, qebulên pêşin, armanc ued. Diguhere. Bi gotinê din her kes ligor ihtiyaca xwe perwerdeya xwe jinû çê dike. Vê

¹ Jibo pêşniyaz û rastkirin Dr. Şeymus Kurt re sipasdarim. Engîn Ölmez jî bo deşifrasyon alîkarî min kir, sipas dikim.

² Zanîngeha Artukluyê Mêrdîn

xebat ji dixwaze jibo jinû çekirina perwerdeya zimanê Kurdî mîna gava yekemin gavêk bavêje û felsefeya perwerdeyê zimanê kurdî niqaş bike.

Di vê xebata xwe da, wek rêza pêşkêşiyê em dê ewil behsa *çalakiya felsefeyê* bikin. Em dê li ser van pirsan bisekinin; *Gelo çalakiya felsefeyê çi ye?, Di çalakiya felsefeyê da em çi dikin?* Li wir em dê li ser tecrûbeya xwe ya perwerdeyê hereket bikin. Paşî em dê li ser *felsefeya perwerdeyê* bisekinin. Di dawiyê da jî em dê li ser *felsefeya perwerdeya Kurdî* bisekinin û lê hûr bibin ka felsefeya perwerdeya Kurdî çi ye, çi nîne.

Çalakîya Felsefeyê

Her karê mirov heq dike bi *çalakîya felsefeyê* bê îfade kirin. Xebat û livên mirovan yên rojane, karên rûtîn, karên meslekî û karên din kar û çalakiyên felsefeyê ne. Eger mirov li ser ceribandînan xwe yên jiyane bifikire, ku jixwe ev karê her kesê ye, hingê ew fikirin karê felsefeyê ye. Ji ber ku jiyane bê fikirin nabe û herkes li ser jiyane xwe difikire û rastî û kêmasiyên xwe dibîne. Yanî mirov bi kûrahî li ser kar û kiryarên xwe difikire û wan bi me'ne dike. Eger mirov wisa neke, ji jiyane tu tiştî fehm nake û ew nemimkun e. Herkes ji jiyane tiştê fehm dike û li ser wan wan dîtînan jiyana xwe berdewam dike.

Îro herçend felsefe wek karê grûbekê, yanî karê felsefevanan bê terîfkirinê jî ew bi xwe terîfeke şaş û kêma e. Çunkî felsefe karê hemû însanan e. Herkesê xwedî fikir, xwedî aqil, xwedî dil û hîsan bi xwe dikare felsefeyê bike. Heta Platon jî wisa bûye. Lê Platon çi kiriye? Rabûye akademîyek vekiriye, êdî kesê çûye akademiya bûye felsefevan, yanî felsefekirin bûye karê xwendîgehê. Lê di eslê xwe da herkes li ser jiyana xwe, li ser me'ne û heqîqeta jiyane difikire. Yanî dixwaze fehm bike ka ew dinyayê li ser dijîn çi ye, çawa ye? Haqîqatê jiyane çi ye? Me'neya jiyana me çi ye? Yanî ew pirs bi xwe pirsên her kesî ne. Yanî pirsên bo fehmkirina haqîqetê. Her însan dipirse li ser vê dinyayê ka karê min çi ye? Em çima li ser vê dinyayê da dijîn? Kî em avêtine ser vê dinyayê? Ya dî jî ka em çawa dikarin jiyana xwe û dora xwe û tiştan bi me'ne bikin, vê jiyana xwe watedar bikin.

Dîsa dema ku em van karan dikin, gelo ji me ra sînor lazim in? Yanî dema ku em jiyane xwe berdewam dikin, gelo bêsînorî mimkun e? Di fehmkirina heqîqetê û me'nekirina dînya û jiyane da gelo sînorek heye? Gelo em dikarin her tiştî bikin? Ma ji me ra sînorek ne lazim e? Herwisa, sînor çi ye? Bi raya min sînor ehlaq û etîk e. Însan her çi kar bike bile bike, lê muvazeneyek û sînorek lazim e.

Herwisa dema em karê xwe dikin, em dikarin çawa karê xwe baş bikin, rind û xweş bikin? Yanî estetîzekirina jiyânê, estetîzekirina hîsan, gotinan yanî estetîzekirina dinyayê çawa dibe? Gelo ew çawa mimkun e? Belê, em li ser van tiştan difikirin. Bo nimûne jin her roj felsefeyê dikin, ew dibêjin ‘em çawa bikin ku mala me rindtir bibe, paqijtir bibe?’ Karê xemilandina xwe, ya mal û derdorê bi xwe karekî estetîk e û estetîk jî beşeke felsefeyê ye. Yanî ji bo felsefekirinê şart nîne ji beşa felsefeyê mezûn bibe. Beşa felsefeyê da çi ders didin, dersa dîroka felsefeyê didin. Felsefekirin karê her kesî ye ne ku karê bi tenê felsefevanan e. Çunkî van sê mijaran yanî *felsefeya hebûnê* (ontoloji), *felsefeya exlaq* (aksîyoloji) û *estetîkê*, em hemû dikin, hingê ew kar karên felsefî ne çalakîyên felsefî ne û em her roj van karan dubare dikin.

Felsefeyê Perwerdeyê

Di perwerdeya ziman da gelo ew sê mijarên felsefeyê çawa dikarin bêne şopandin. Yanî hebûna ziman çi ye? Ziman çima heye? Mîsalen, heqîqeta zimanê Kurdî çi ye? Ya duyem, sînor û qaîdeyên zimanî çi ne? Gelo di vî karî da sînorên etîkî hene yan tune ne? Yan jî divê kîjan ji wan sînoran bîn teqîb kirin? Ya sêyem gelo ew kar bi awayê estetîk çawa dikare bê kirin da ku xwendekar di pevajo ya perwerdeyê de aciz nebin? Hînkirina zimanî çawa dikare bê kirin da ku xwendekar di hînbûna zimanê kurdî da dilxweş bin, şa bin? Divê ew mijarên felsefeyê di karê perwerdehiya zimanê da çawa bêne tetbîqkirin?

Felsefeyê perwerdeyê de pirsên bingehîn hene û felsefe jî ‘eynî pirsan dipirse. Yanî pirsên felsefeyê û felsefeya perwerdeyê ji ser heman rêyê diherike. **Pirsa yekem** ev e: Kesê ku perwerde dibe kî ye? Wek tê zanîn hinek heywan jî perwerde dibin. Ew heywan têne perwerdekirin û di karen rojanê da tîn şixûlandin. Mesele kûçik hene, hesp hene, pezkovî hene li qutban di hinek karan da tîn şixûlandin. Dema ku em heywan perwede dikin divê bê pirs kirin gelo pezkovî çi ye? Kesek yan jî tişteki ku perwede dibe xwedîyê kîjan taybetmendîyan e? Madem însan perwerde dibe wê demê divê bê pirsîn ka gelo însan çi ye? Eger ew însan kurd e û eger taybetmendîyên kurdan jî heye divê ew jî îlave bibe. Pirs dibe “însanê kurd kî ye?”

Pirsa duyem, perwede çi ye? Heqîqeta perwede yê çi ye? Ew çi kar e? Perwerde li gor çi diguhere? Bo mînak, gelo perwerdeya însanan û heywanan yek e? Dîsa, gelo perwerde li gor mijaran diguhere? Bo mînak, perwerdeya matematîk û perwerdeya ziman yek e? Yan perwerdeya erdnîgarî û perwerdeya ziman yek e?

Dîsa di perwede yê da faktoreke girîng ku şekil dide perwerde yê, armanca perwerde yê ye. Tesbîtkirina armancê gava pir girîng e. Mîna rêberekê rê nişanî perwerdekar û mamosteyan dide.

Di xebata perwedeya zimanê kurdî de gelo armanc çî ye? Kurd dxwazin çî bikin? Bi xebata perwerdeya ziman dixwazin zar, xort û ciwan û yan jî mezin çî hîn bibin? Armanca perwerdeyê divê bête tespîtkirin. Ji ber ku ji bo perwerde faktoreke girîng e, divê komên armanc jî bête zelalkirin. Bi gotineke din perwede ji bo kê ye? Kurd dixwazin tenê zarokan yan jî hemû kurdan perwerde bikin? Li gor wan zumreyan perwerde hem ji aliyê me'ne, hem jî ji aliye şekîl û naverokê diguhere.

Pirsa din li ser naveroka perwerdeyê ye. Gelo di naverokê da divê çî hebe? Yanî naveroka perwerdeyê çî be? Divê mijarên naveroka perwerdeyê bête rêz kirin. Yanî dixwazin xwendekarên me kîjan mijaran hîn bibin? Ji hêla din hinek nêrîn hene dibêjin “naverokê ne hisab nekin” çunkî hûn nizanin ihtîyacê xwendekaran çî ye? Belkî xwendekar plana we ya rojane naxwaze, wê çaxê plana sazkerî wê rojê betal dibe. Divê li ser vê mijarê xebat bête kirin, divê derxin ortê ka çî û çiqas bête hinkirinê. Wisa em dikarin pirsan zêde jî bikin. Li gor taybetmendîyan, kom, cih, lehçe hwd. hemû faktor in û divê wan faktor bînin ber çavên xwe û li gor wan perwerdeyê bikin.

Em bi pirsaxwe ya yekemîn dewam bikin, gelo însan çî ye? Yanî însan hebûneke çawa ye? Çî taybetmendîya vê hebûnê heye? Ji ber ku behs behsa Kurdan e, wê çaxê dibe bête pirskirin “Kurd, însanekî çawa ye”? Niha em li ser hindê bisekinin:

Yek, Kurd xwedîyê tîkiliyên metafîzîkî ye. Yanî tiştên ku însan nabînin, nabihîzînin, bi wan tîkîlî datînin. Bi Xwedê re diaxivin, bi ruhan diaxivin, bi cinan diaxivin. Eger yekî axaftina Dersîmîyan bi Xwedê guhdar bike wê taybetmendîyê eşkeratir hîs dike. Dema ku ew bi Xwedê diaxivin dibêjin “Heqo no çî hal o?” Yanî eger mirov nizanibe dibêje her halde bi hevalê xwe re diaxive. Yanî tîkiliyeke “asoyî/horîzontal” çê dikin. Ew qas bi awayekî hîtabî dike “Heqo, Heqo no çî hal o.” Meriv dibê muhatabêkî hazir heye bi wî diaxive. Yanî tîkiliyeke pir xurt e. Tîkiliyeke kûr e yanî însan ta ji fîzîkê derbas dibe metafîzîkê, tîkiliyên metafîzîkê çê dike û ew ji xwe re dike rêyek.

Du, wek tî zanî di Kurdistanê da ew rêyeke sereke ye. Bi gotinên pisporên qadê, Kurdistan cenneta bawerîyan e. Cennetê tarîqatan û dînan e, yanî cur bi cur tarîqet û dîn li Kurdistanê heye. Yanî însanê Kurd wisan tîkiliyan çê dikin û tenê bi vanan nasekine, yanî metafîzîk di nav fîzîkê da jî ye. Mesele turbeyê wan hene, her cihî da heye û mîsyonên metafîzîkî didin wan. Di bîr û bawerîya Kurdan da mîsyon ne tenê ji bo însanan e, heman wext ew mîsyonê didin dar, kevir,

rûbar, av yanî her tişt xwediyê taybetmendîya metafizîkî ye. Wê çaxê di perwerdeya Kurdan da, divê ji bîr neçe ku Kurd xwediyê çi têkiliyên kompleks û kûr in.

Sê, jiyana kosmos. Jiyana Kurdan jiyaneke kozmoskî ye. Yanî ne tenê li ser erdê dijîn, ew bi kozmosan dijîn. Hemû kozmos erd û ezman, tav û stêrk hemû di nav jiyana wan da ne. Mînak, hevalekî min xwediyê qîzikekê bû. Dîsa xanimê wî hamîle bû û dîsa qîzikek bû. Wî kurek xwastibû. Lê dema ku qîza duyem hat hinek xemgîn bû. Dapîra wî bangî wî kirîye û gotîye “Kurê min were, hûn xortên dawî hinek tiştan nizanin. Ezman takîb bikin dema ku filan stêrk derket, paşî here nav cihê xanima xwe.” Wek tê dîtin, Kurd li gor stêrkan şekil didin jiyana xwe ya rojane. Di wê baweriyê da tekîliya hebûnên jiyana mirov û stêrkan heye. Lewma stêrkan mîna rehberên jiyana xwe dibînin. Jiyana kozmoskî ku em dibêjin bi perwerde û jiyana modern hinek kêmbuyê lê di na Kurdên berê da ew pir xurt bû. Dema ku diçûn rêwitiyê berê esman takîb dikir. Wan stêrka takîb dikirin, kehkeşan û ew objeyên esmanî takîb dikirin li gor wan diçûn rêwitiyan an nedîçûn. Kurd qirara xwe li gor stêrkan digirin. Rojekê ez li mal bûm, dîya min çûbû derva, hinek dereng hat. Bavê min got: ‘Ya ti vûn astareyê ina cîniyek esman de çîn o.’ Yanî li esman stêrka vê jinê tune ye. Çunkî esman, kozmos rehber e. Stêrk, tav, keşkeşan hemû ji bo hebûnen kurdan nîşane ne. Yanî jiyana kozmoskî nav kurdan da gelek jiyaneke xurt e.

Çar dîsa tabî însan tenê ne. Ew halekê pir kompleks e. Însan bi her unsurê kosmos tekîldar e lê dîsa têr nabe û di navxwe de xwe tînî û bêkes hîs dike. Ew tînetîya derûnî ye. Hêla din bi tabetmendî di demên moderne de ew tînetîya însan pir zede buye. Jiber ku însanê modern ji cosmos û cematê însanan veqitîye û tekîlî kêmbuyê naw qelebalixan de zî însan xwe aîda cihêk hîs nake û tenê dimîne. Ew îro buye yek naxoşîya derûnî (Kızılgeçirt, 2012).

Penc, însan dema ku hate ser dinê ji xwe ra kulturek çêkiriye, yanî bi vê kulturê dikare ser erdê de bijî. Li Kurdistanê li her cihê kultureke cuda heye. Ya koçeran cuda ye, ya bajariyan cuda ye, ya deştîyan cuda ye, ya çiyayan cuda ye. Hemû şaxên kurdan xwediyê kulturên curbicur in. Hinek cihên Kurdistanê hene mesela genim nagihije, çunkî wext teng e. Yanî ew qas bilind e li wê derê genim nabe. Lê mirov tînen Mêrdînê, hinar heye, hejîr jî heye yanî berên tropîkal jî hene. Lê cih hene genim nabe ew qas bilind e, yanî kulturê cuda cuda ne. Cihêk heye tenê kulturek heye, feqat li deşta Mezopotamyayê hezar kultur tevlîhev bûne. Mirov dikeve şuphê gelo ew Kurd e yan Kurd nîne, ew qas tevlîhevî heye. Cihên safî jî hene, tenê kurd e, mirov wê dibîne. Ji vî alî, însan têkiliyên xwe û xwezayê çêkiriye û kulturekî xas yanî taybet çandekî taybet çêkiriye.

Di perwerdeya zimanê vî xelkî da, divê kulturê wan jî baş bên zanin ku di perwerdeye de bên nişandin.

Şeş, însan di nav civakê de dikare jiyane xwe dewam bike. Kurdan jî ji xwe ra civakek çêkiriye û li nav wê civakê jiyana xwe berdewam bike. Ew civak pirhejmar e, yekhejmar nîne. Her kurd li nava civaka xwe ya taybet de dikare bijî. Yanî em bêjin Koçer di nav koçeran da dikare bijîn, yan jî Alewîyek li nav Alewîyan da rehet dike yan Êzîdî li nav Êzîdîyan da dikare rehet be yan jî li wê derê bi asayî dikare jiyana xwe berdewam bike. Perwerde divê wan civakan nas bike, baş nas bike. Îro hûn dizanin ew nifus hinek tevlihev bûye. Mîmkun e ku ji çend civakan xwendekar di sinifekê da hazir bibe. Mamoste divê wan nas bike, çunkî dema ku metîn tercîh dike, gotinên xwe dibêje divê hemû mensubên wan civakan bîne ber çavê xwe, paşê wê gotinê xwe bêje.

Dîsa ew însan - kurmancê nû dibêjin- takekes e, yek kes e yanî. Bav heye, dayik heye, mal heye, eşîr heye nizam qewm heye lê dîsa yek mirov e. Erê nav wê civakê da, nav wê deryayê da xwe tenê dibîne. Binêrin, li aliyekî bi xwedê re diaxive, aliyê da bi stêrkan têkilîyê çêdike nav kulture xwe da dijîne, lê dikare tenê jî be. Hebûneke em bêjin kompleks û pir tevlihev e. Alex Carel (1990), însanî wek “mahluqekî/hebûnekî meçhul” dide terîfkirin. Ji ber ku însan xwedîyê têkilîyên zêde û kompleks e, naye terîfkirin. Ew taybetmendîya însan, wî meçhul dike. Ew tarîf, di behsa însanê Kurd de zêdetir zor dibe. Çunkî Kurd, ji aliyê etnîk, erdnîgarî, kultur, ziman, bawerî û mezhep xwedîyê gelek beşan e. Terîf û famkirina vî însanî pir zor dibe, ew jî meçhulîyet dike taybetmendîyeke însan.

Peyvê duyem **perwerde** ye. Perwerde çi ye? Perwerde her çend di kurmancî de di halê sade nebe pirhejmar jî di zazakî de dibe. Di vê mijarê da behsa perwerdeyê nabe, ya perwerdeyan dibe. Bi gotineke din ji her aliyê ve perwerde. Tenê cureyekî perwerdeyê tune ye, gelek perwerde hene. Yanî perwerde xwedîyê wateya pirhejmar e. Li vê derê ya perwerdeyê zêde dike çi ye? Yek, însan perwerdeyê zêde dike. Çunkî însan cuda cuda ne, îhtîyacê her însan cuda ye, kulturê wan cuda ne. Ew jî faalîyetên perwerdeyê cuda dikin. Mînak, xwarin îhtîyacê hemû însanan e. Lê mitbaxa însanan cuda cuda ye. Xwarinê wan cuda cuda ne. Hinek millet hene xwarinê wan tûj in, nav xwarinên hinekan da tûjî tune ye. Hinek millet hene mitbaxê wan da goşt tune, yan jî pir kêm e, goştê masîyan heye, goştê mirişkan heye. Îhtiyaç yek e, lê ew tedarîk û şiklê dîtina îhtiyacan cuda cuda ne.

Sazgehên perwerdeyê jî perwerdeyê zede dikin. Mînak medreseya Kurdan tecrubeyeke taybet e. Di nav milletên din da bi vî şiklî tune ye. Hucra, bere di gelek gundan de hucre hebûn û di van

hucreyan da ders dihatin dîtin. Dîsa di camiyan da ders tên dîtin. Hemû tecrûbeyên cuda ne. Ev tercûbe li her cihî nayên dîtin. Dîsa navê perwerdeyê cuda ye. Nav, di prosesa geşedanan civakê da diguherîn. Mînak, di Kurdîya îro da *perwerde* tê gotin, di Kurdîya berê da *xwendin* (Issî, 2011) dihat gotin. *Xwendin* û *perwerde* yek tişt nîne. Tirkan berê digotin *maarif*, niha dibêjin *egitim*. Bi xwe *egitim*, kesekî ku Tirkî zimanê dayika wî ye, esla egitim ji bo însanan naşixlîne, çunkî heywan *egitim* dibin. Di Tirkîya bere da însan *egitim* nabin, heywan *egitim* dibin, yanî *egitim* didin heywanan.

Dîsa navkirinên jî zimanê Ewropayî hene; *education*, *éducation*, *educazione*. Ew jî xwediyê maneyên cuda ne. Herçend berê wateyên perwerdeyê pirhejmar bin jî piştî avabûna dewleta netew û kapîtalîzmê, ew dixwazin pirhejmarîyê bikin yek. Yanî bi zanista perwerdeyê bi xwe dixwazin me'neya perwerdeyê bikin yek. Niha li Tirkîyê wek mamoste û xwendekarên perwerdeyê dizanin, tarîfeke perwerdeyê ya bi navûdeng heye. Ew tarîf li gorî nêrîna perwerdeya cumhuriyetparêzan e. Û demeke pir dirêj tarîfek din nehatîye pêkanîn. Ji ber ku perwerde wek amûrekî dewleta netew û kapîtalîzm hatîye çekirin, di warê perwerdeyê da terîfekî din neketîye holê. Çunkî dixwazin perwerde li gor armancê wan be. Ji ber wê çî me'neyên perwerdeyê hebin, hemûyan dikin yek.

Lê perwerde xwediyê me'neyên û armancên cuda cuda ye. Mesela, armanca yekem ya perwerdeyê însanê kamil e (Yıldız, 2018). Li gor hinek nêrînen kewneşopîparêz, perwerde ji bo gihandina însanê kamil e. Çunkî însan divê bikare sê hiqûqan biparêze. Eger însan dixwaze cewhera xwê ya însanbûn biparêze, muhafeze bike, divê bikare sê hiqûqan biparêze. Ew jî terbiyekê, perwerdeyekê dixwaze. Sê hiqûq çî ne? Yek, divê hiqûqa Xwedê biparêze. Du, divê hiqûqa însanên din biparêze. Sê jî divê hiqûqa xwezayê biparêze. Eger însan perwerde nebe kamil nabe, tu hiqûqan jî nas nake. Ne hiqûqa însanan nas dike, ne jî hiqûqa Xwedê nas dike, dibe yekî êrişkar. Ji ber wî însan divê wê êrişkarîyê xwe bi perwerde, bi terbiye bişkîne û bikare tabî'ê hiqûqê bibe. Wê çaxê dikare cevhera xwe û însanîyeta xwe biparêze, yan jî diguhere şiklê wehşan. Ew talûkeyeke mezin e. Ew nêrînek e. Jor de me gotibû *maarif*, armanca *maarif* ew e ku însanê kamil çêbike. Armanca perwerdeya hemû bawerîyan gihandina însanê kamil e. Di eynî wextî da armancê felsefenasan jî însanê kamil e. Bi navên cuda cuda nav dikin lê hem li Rojhilatê hem jî li Rojava însanê kamil armanca sereke ya felsefeyan e.

Armanca duyem ya perwerdeyê “guhertina tevgera xwestekî” (îng. terminal behaviour change; tr. istendik davranış değişikliği) ye (Beltekin, 2014). *Guhertina tevgera xwestekî* xwestina kê

ye? Helbet xwestina dewletê ye, xwestina bazarê ye, xwestina civakê ye. Yanî însan li gor civakê, li gor bazarê, li gor dewletê hinek tevgeran qezenç dikin an jî hîn dibin. Yanî zanîne hîn dibin, lê tabî ew zanîn hatiye wergirtin an nehatiye wegirtin li ser tevgerê fam dikin. Lewma zanîne tenê li ser tevgerê tarîf dikin. Eger zanîn hatibe wergirtin, hingê tevgerên wan diguhere em bêjin. Ew jî ji ber ku dewleta neteweyî ji pir kultur û dînan û em bêjin ji pir zimanan teşkîl bû, wan xwestin bi rêya perwerdeyê netewekî çêkin. Ew perwerdeyê komariyê ya hatiye çêkirin, armanca wê perwerdeyê jî guhertina tevgera xwestekî ye. Yanî mesele li Tirkîyeyê hûn dizanin, dibêjin her kes bila bi Tirkî biaxive, her kes bila li gorî jiyana ‘esrî jiyana xwe çêke, mejîya we bila li gorî ronahî çêbe û hwd. Ew dibêjin ew çêkirina *Tirkê nû* armanca perwerdeyê ye.

Pênaseya din jê ew ku perwerde çalakîyeke azadîyê ye. Ew jî fikra Paulo Fereire (2018) ye; pedagojiya bindestan (îng.pedagogy of the oppressed; tr. ezilenlerin pedagojisi). Ew temsîlkarekî sereke ye nêrîna *perwerdeyê rexneyî* ye. Wi çima perwerde wisa tarîf kiriye? Freire ji ji Amerîkaya Latîn e û hûn dizanin li wê derê demeke dirêj koletî hebûye. Paşî esîrtî û otorîteyên eskerî çêbûne. Paşî dîsa hûn dizanin feqîrî, hemû feqîrên dinyayê li Emrîkaya Latînî ne. Dewletên Latînî li vê derê gelek bend û qeyd hene li ser însanan. Hem ji aliyê sîyasî hem ji aliyê etnîk û dînî; hem jî ji aliyê aborî gelek qeyd û bendê wan hene. Însan mîna esîr li wan deran dijîn. Lewra ji bo wan divê perwerde çî bike? Divê perwerde wan însan azad bike. Binêrin wan her tiştê xwe, xwendin û nivîsandin û perwerdehî jî li gor azadîyê çêkirine. Yanî em perwerdeyek çawa takîp bikin ku însanê me qeyd û bendê xwe bişikine û ku bikare zincîrên xwe bişikine? Niha tabî divê Kurd jî wê pirsê ji xwe bipirsin. Gelo armanca Kurdan çî ye di perwerdeyê da?

Pênaseyeke din a perwerdeyê xwerealîzekirin e (Gutek, 2014). Mesela ew xwerealîzekirin, îro jî hûn pir dibihizîn, ew ji humanîstan re maye. Humanîst çî dibêjin; di her însanî da tov heye, divê ew hêşîn bibe. Perwerde çî ye, perwerde proseseke rehberî ye, rehberî bikin ku ew zarok an jî xwendekar bikare wî tovê xwe biteqîne û hêşîn bibe, karê we perwerdekarên ew e. Ser wan de te’de nekin, otorîte çênekin û şekil nedin wan. Çunkî tovê wan heye, ew tov bi xwe eger hûn alîkarî bikin ew bi xwe derdikeve ortê.

Dîsa pênaseyeke din a perwerdeyê takekesîbûn yan jî takekesîkirin e. Ew çî ye, ew jî lîberalîzm e (Gutek, 2014). Yanî hûn dizanin lîberal takekesan dixwazin, civakê naxwazin. Însan ji takekesan, yanî civak ji takekesan têne teşkîlkirin. Wê pirsê ji bo Kurdan em bipirsin; gelo ya me

divê çî be. Divê Kurd dema ku armanca xwe ya perwerdeyê tayîn dikin, kîjan armancê dîyar bikin an jî armanceke çawa tesbît bikin?

Niha li jor jî min behs kir, gelek nêrîn hene derbarê perwerdeyê da, divê perwerde çî bibe naveroka perwerdeyê çawa bibe. Ew pirs ji bo Kurdan jî wisa em bêjin, Kurd divê însanê kamil ji bo xwe bike armanc. Hevsengîyekê çêbike ji hemûyan re. Yan jî ji xwe re tiştêkî din, armanckw din çê bike. Li lîteratura perwerdeyê nikaşek heye bi du terzan çêkirine; yek *educere* ye, ya din jî *educare* ye. *Education* termê perwerdeyê ye ku li Ewropayê tê şixulandin, koka wê Latînkî ye û ji du kokan tê: Yek *educere* ye yek jî *educare* ye (Bass û Good, 2004; Beltekin, 2014). Pir dişibin hevdu û ew bi xwe nakokîyek e, yanî nakokîya perwerdeyê ye. Çunkî *educere* xwerealîzekirin e. Wate didin û qîmet didin xwe, yan jî xwe realîze dikin. Ew *educere* ye, yanî potansîyelê însan çî be wê derdixe ortê. Bi wan qîmet û maneyekê werdigire. Mesele yek dibe ressam, dibe muziknas, ji hêla hunerê xwe îfade dikin.

Yek jî *educare* ye. *Educare*'e ke din jî heye ku *karê* Kurdî ye. Ew hînkirina kar e, ya meslekê ye, mirovan hînî tiştêkî dikî û bi vê hînê meriv hinek amûr digire da bi van amûran bikare jiyana xwe berdewam bike, refah û aboriya xwe zêde bike. Ew tişt jî *educare* ye. Niha ew du tiştên nakokî ne. Dema ku em hînî tiştêkî dibin, ji bo *educare* a yekem an ji bo ya duyem em bikin? Perwerde dibêje hevsengîyekê çêkin navbera wan de; hem xwe realîze bikin hem jî bi vê realîzekirinê bikarin li dinyayê bicivin, yanî bikarin nanek qezenc bikin. Ew herdu armanca, yanî hevsengîya *educare* û *educare* armanca perwerdeyê ye.

Lê belê ew hevsengî xirab bibe pir zor e. Niha mesela li Tirkîyeyê, li Ewropayê û li gelek cihên din yekem armanca perwerdeyê bûye *educare*. Em bixwînin da meslekekê hîn bibin û bi wê meslekê ve heyata xwe qezenç bikin, yan jî heyata xwe berdewam bikin. Ew tabî dema ku ew hevsengî xirab dibe, perwerdeyê me'neya xwe wenda dike. Tenê hînkirina meslekê di destên mirov da dimîne û eger ew nikare wê meslekê jî bi dest bixwe, jixwe wê me'neyê, wê prestîj û qîmetê di xwe da hîs nake. Ew kesên ku *educare* dinirxînin, dibêjin wan dîploma wergirtiye, lê mirov di kesê xwedî dîploma de qîmetekê hîs nake. Yanî çawa mirov ew qas bixwîne û lê çawa mumkun e ku tu qîmet tu prestîj, em bêjin tu wasfekî mirov nebe? Mesela ew perwerdeya ku armanca wê însanê kamil e, ew wisa dinirxîne ku armanca xwendinê meslek wergirtin nîne. Eger mirov bixwîne dibe ku cewherê insanîyetê zêde bike, yanî ew însan hin zêdetir li ber çavên insanîyetê wê xuya bibe. Bila xuya bike, lê meriv fam nake çima çunkî *educere* wenda bûye. Heta hûn dizanin teşbîha Qur'anê çawa ye digot ew alîmên ku qîmet û qencî têda nayê xuyakirin,

ji wan re dibêjin ‘keren ku kîtab barkirî’, yanî xwendiyê dîplomaya wan heye, îcazê wan heye lê ew wasîf, wasfê însanîyetê li gel wan tune ye; îrade tune ye, şeref tune ye. Yanî ew îlmê xwe difiroşe. Ew hewsengî divê çawa çêbe; divê xwendekar piştî xwendina xwe dibe însanekî baş, gava karek dane wî divê heqê wî karî bide. Bikare wan çê bike, di wî warî da bikare karekî bike; anku du tişan bike, yek bibe însanekî baş û qenc, ya duyem jî karekî baş bike. Heke em wan nêrînan ji bo Kurdî, ji bo perwerdeyê Kurdî tetbîq bikin, divê çawa bibe hem Kurdî mîna qîmetekê, mîna wateyekê hîn bibe hem jî bikare bi Kurdî nanê xwe derxe, divê herdu hebin. Yanî bi Kurdî bikare mesele şîr binivîse, bikare hîkaye binivîse, bikare nivîsên akademîk binivîse û bikare pê baş biaxive. Dîsa divê nanê xwe ji vê perwerdeyê xwe re bigire. Her du divê çê be, divê sentezekî makul çêbike.

Divê ev pirs jî hebe; em perwerdeyê ji bo çî û ji bo kê dikin? Berî dewra modern, berê dewleta neteweyî û kapîtalîzmê, perwerde ji bo feydeya însanan bû. Armanca perwerdeyê însan bû û pêşveçûna însan bû. Însan divê ji her alî xwe pêş ve bibe. Gelo di dewra modern da perwerde ji bo çî ye? Erê ew dîsa ji bo însan e, lê dewlet wek şîrkê însanî lê zêde bûye. Di dewra modern da perwerde zêdetir ji bo dewletê, ji bo civaka modern, ji bo bazarê û qadên din ye. Yanî êdî dema ku mirov ji perwerdeyê tiştekî hîn dibe tenê ji bo xwe hîn nabe. Dibêje ez dê çawa wan zanînan hîn bibim ku bikare li gor dewletê be; mesele di dewletê de bixebitim, yan jî dewlet min ceza neke. Yanî awan şîyanewerîyan dixwaze ku dikarin bi dewletê re bixebitin, pê wan di nav civakê da xwedî cih û xwedî prestîj be, di bazarê da bikare ji xwe re karekî peyda bike.

Îro, ew bazar yan jî aborî ji bo perwerdeyê bûye armanca yekem, mirov dibêjin ez bi perwerdeya xwe ve dikarin di bazarê da ji xwe re karekî peyda bikim. Ew bûye yekem armanc. Niha mesele çî ye: Di perwerdeyê da pêşveçûna dewletê, pêşveçûna civakê, pêşveçûna bazarê bûye armanc. Mesela niha ez sîyasetmedaran guhdar dikim, ‘perwerdeya şîyanewer (nitelikli eğitim)’ dibêjin, yanî *perwerdeya şîyanewer* çî ye? Dibêjin ew wasfên ku dikarin pê ve di bazarê navneteweyî de malê me bifiroşin, îxracata me zêde bike, teknolojiya me nû bike. Dema ku armanca yekem êdî bû *educare*, însan li gelek cihên baş perwerde dibe, lê ji aliyê însanîyetê ve, ji aliyê kamilbûne ve xwediyê xwediyê wasfên baş nabin.

Ji bo ziman jî divê ev bêne pirsîn; gelo em ziman çiqas bidin hînkirin? Zimanê Kurdî em bidin hînkirin an jî ji bo hînbûna wî rêberî bikin? Gelo em perwerdeyê ji bo zimannasîyê bikin, yanî gramera kurdî hîn bikin? Xwendekarekî min hebû, eslê wan Kurmanc bû, lê li bajarê Mêrdînê mezin bûbû, lewma Kurmancî ji bîr kiribû, Erebbî di nav malê da belav bûbû. Wextekî li

Zanîngeha Artukluyê qursa zimanê Kurdî vebû, ew jî çû. Ew got da zimanê xwe hîn bibim. Vegeriya hat got ‘Mamoste, ez çûm, hema gramerê vedibêjin’. Got, kursa hînbûna ziman e. mirov hatiye zimanê xwe hîn bibe, lê naverok çî ye zimannasî ye. Gelo ma şart e hemî kurd zimannasîyê hîn bibin. Na ew yek warekî pir taybet e û zor e. Gelek grubekî piçûk vê warê de xwedî pisporî be, ew bes e. Divê em perwerdeyê ziman ji bo çî bikin? Ji bo çar, çar şîyan, yan jî jîrîyê ziman çêbikin: xwendin, guhdarîkirin, axaftin û nivîsîn. Ji bilî wan tu tişt lazim nîne ji bo Kurdan. Ew şîyan ji bo jîyanê lazim in, da kesek bikare jiyana xwe bike Kurdî. Ew jîyan, çerxa jiyana wan bi Kurdî biherike mesele ew e. Ew çar şîyanên zimanî ji bo me hemûyan lazim in, lê zimannasî tenê ji bo grûbeke berteng lazim e. Çima em behsê wan şîyanan dikin; divê hemû Kurd, di hînkirin û perwerdeya zimanê xwe da wan çar şîyayan ji xwe re wek armanc tayîn bikin.

Niha em hatin termê xwe yê din; *ziman*, ziman çî ye? Madem em daxwaza perwerdeya zimana Kurdî dikin, wê çaxê derbarê wî zimanî da divê mejiyê me, serê me zelal be. Dema ku em daxwaza perwerdeya zimanê Kurdî dikin, gelo qesta me çî ye, em dixwazin em çî bikin? Di eslê xwe eve mesele û nêrîneke kevn e. Gava li ser ziman em metnekî dixwînin, dibêjin ziman amûrek e. Jixwe min berî niha behsa wê kir, gava bo armancên zimannasîyê gramer hate nivîsandin, li piştta her kitaba gramerê da hûn dikarin vê îfadeyê bibinin: *Ziman amûrek e* (Göçer, 2012). Ji bo çî amûr e ziman; ji bo îfadekirina hîs, raman, fikr û hestên din. Nivîsandin di heyata me de mîna amûrek e, ew bi rêya ziman dibe. Lê divê bê gotin ku ziman amûrekî bitesîr e. Pir bi tesîr e. Îro jî em behsa vê amûrê dikin. Nêrîneke din jî li ser ziman dibêje ziman *pratîka civakê* ye (Güntaş Aldatmaz, 2020). Ew pênase jî dîsa li ser fonksîyona zimanî tê îfadekirin, lê heqîqatê ziman di vê tarîfê da zêdetir tê dîtin. Mesela dema ku em tîna dinyayê, em tîna nav zimanekî. Bo mînak, kesek li Colemêrgê bê dinyayê, tîna nav zimanê Colemêrgê, her kesê tîna nav zimanê civaka xwe. Ew ziman her tiştê mirov ava dike. Nasnameyê we ava dike. Bawerî heye, fikra xweza heye, tîkiliyên însanan hene, hasilî derbareyî jiyana Colemêrgîyan her tişt di nav zimanê Colemêrgîyan de heye. Ya din ew ziman çandê çêdike, bi mînak hinek term hene, termê zimanî, ew her tiştî bi termekê îfade dikin û ew term nîşaneyê wê çandê ye. Pênaseya din, tabî ziman amûra afirandin û veguhestina bîrê ye (Güntaş Aldatmaz, 2020). Yanî ziman *bîrekê* çêdike, bîra çandî bîra ragihandinê û bîra veguhestinê em bi vê bîrê jiyana xwe dewam dikin. Bi vê bîrê navbera di xwe de ragihandinê çêdikin û dîsa ew bîr kultura me çandê me vediguhêze.

Dîsa ew em werin ser kosmosê, di jiyana kosmoskî ziman tene li nav însanan nayê axaftin. Çunkî li kosmosê dengê heye ku têkiliya xwe bi dengê însanan heye. Hinek zimannas û ekolojist li ser vê mijarê pir dixebitin û tesbîtên gelek balkêş dikin (Güntaş Aldatmaz, 2020). Mesela ew dibêjin li cihê ku hinek ziman wenda dibin, li wir cureyekî çukan jî wenda dibe. Dema ku dengê zimanekî li cihekî kêr dibe, yanî zêrî dibe, cureyekî çukan jî li wê derê kêr dibe. Yanî dibêjin di navbera kosmosê de têkiliyêke fîzîkî heye. Di navbera wan da, aynî wext navberê dengê kosmosê da jî têkilîyek heye. Eger yek kêr be, wenda bibe, ewê din jî di bin tesîrê wan da dimîne. Kosmosa dengê ew e. Yanî dema ku em behsa ziman dikin, em behsê çukan jî dikin. Jixwe li kaînatê pir deng hene, em hinekan dibihîzin, hinekan jî nabihîzin. Helbet di navbera van dengên da jî hi caran hevserî xirab dibe. Dema ku hevserî xirab dibe, hinek cureyên candaran jî heyata xwe wenda dikin. Jiyan me di nav dengên da, di nav zimanan diherike. Em hemû civak, hemû mîlet di nav zimanekî da jîyan xwe berdewam dikin. Lewra Heidagger dibêje ‘ziman mala hebûnê ye’. Yanî ew mirov di nav mala zimanê xwe da dikare jiyana xwe berdewam bike.

Felsefeya Perwerde ya Zimanê Kurdî

Hingê dema ku em behsa zimanê Kurdî dikin, em çî dibêjin? Divê em çî bibêjin? Yek, zimanê kurdan e. Li jor min behsa zimanê Kurdan kir. Ew çar pênc taybetmendiyên Kurdan di nava zimanên wan da jî hene. Eger em perwerdeya zimanê Kurdan bikin, divê em li ser têkiliyan wan, kultura wan, baweriya wan, civaka wan baldar bin. Her Kurdek, bi xwe divê wek takekesek bê dîtin. Divê têkiliyên wan yê civakî neyên jibîrkirin. Êşên Kurdan, tarîxa Kurdan, nakokiyên Kurdan, ferqên Kurdan bêne temsîlkirin. Mesela Dersîmî ji *zarok* re dibêjin *doman*. Dema mirov peyva *doman* dibihîzin, ew kesê dibêje *doman* ew bi xwe Dersîmî ye û Elewî ye. Eger ji *zarok* yek bibêje *qij* mirov dizane ku ew kes Çewligî ye. Eger kesek bibêje *geda* mirov dizane ku ew kes Pîranî ye. Binêrin heqîqat yek e lê peyv zêde ne. Yanî ew ferqa ziman divê hebe. Ew *god* dibêjin, her peyv qoda baweriyekê ye, ya cihekî ye, herêmekê ye. Divê em wan bînin ber çavên xwe.

Dîsa zimanê qedexekirî pir muhîm e, zimanekî birîndar dike ew qedexekirin û birîndarkirina zimanî divê tu mirov ji bîr neke. Di dersên xwe de jî divê cih bide wê naverokê. Lewma ew qedexekirin û birîndarî elameta zêrfiyê ye, elameta bêprestîjîyê ye. Divê ew jî mîna zimanekî biprestîj were dîtin. Di dinyaya perwerdeyê da taybetmendiyên wisa pir muhîm in. Kurdî

zimanekî zeîf û em bêjin belengaz nîne, ew zimanê eserên edebîyatê yê hêja ne. Ew zimanê dengbêjan ne, zimanê helbesta ne, zimanê tarîxnasan e, zimanê alîman e. Divê di perwerdeyê da ew taybetmendîya ziman jî bê îfadekirin.

Herwisa ji me ra çarçoveyek lazim e, çarçoveyeke teorik. Wek tê zanîn di warê perwerdeyê da gelek felsefeyên perwerdeyê û teorîyên hînbûnê heye. Niha divê Kurd ji nava wan, yek, du, sê heb ji bo xwe kompoze bike. Anku ji bo me kîjan baştir e? Biryara wê bide, yan jî felsefeya xwe bi xwe ava bike, teorîya xwe damezrîne. Mesela Tirkan di dema avakirina cumhurîyetê da felsefeya *îdealîzm* û *realîzm* û felsefeyên perwerdeyê *daîmîti* û *esasîti* tercîh kir. Çunkî wan dixwast neteweyek nû çêbikin wan felsefeyan îmkana wê dide. Niha jî *pragmatîzm* û *egzîstansiyalîzmê* tercîh dikin çunkî ew dixwazin di bazara global da cihê xwe çêke û *pragmatîzm* û *egzîstansiyalîzm* îmkana dide vê yekê. Binêrin dema ku şertê dinyayê diguhere, felsefe anku tercîhê felsefeyê jî diguhere. Wê dema *îdealîzm* û *realîzmê*, Tirkan teorîyên hînbûnê yên bi wan ve girêdayî, yanî tevgerparêzî (behaviourism) tercîh kiribû. Niha, jî *konstruktîzîmê* tercîh dikin. Yanî îro dibêjin ku *konstruktîzîm* hewce ye.

Niha di mînaka Kurdî da, *teorîya rexneyî* pir îmkanan dide Kurdan. Ew teorî dibêje perwerde ji bo hinek armancên taybet hatiye danîn û her kes ji bo îhtîyacên xwe de perwerdeya xwe ava dike. Ev gotin temamen yên *teorîya rexneyî* ne. Mesela Kurd dikarin ji teorîyên hînbûnê û hînkirinê jî çend heban ji bo xwe tercîh bike. Kîjan ji baştir pişt dide armancên wan, ew dikarin yek du heb yan sê heb ji wan tercîh bikin. Herwisa ji aliyê kevneşopîyê ve teorîya civakî ji bo Kurdan pir muhîm e. Çunkî Kurd zimanê xwe di nav civakê de didin hînkirin. Bi xwe ew teorî jî wê dibêje. Yanî hînbûn, bandoreke civakî ye. Yanî însan li ser hevûdin tesîrê dikin û ji wî alî ve hînbûn realîze dibe. Ya din jî Kurd dikarin ji wan sentezekê çêbike, feqet ew tabî êdî tercîha mamosteyan e.

Li jor behsa vê mesele bû. Yanî di warê perwerdedeya zimanî da tiştê herî zêde zor dide me gramer e. Hevalên me yên ku dest bi vî karî dikin, dest diavêjin gramerê lê ew gramer û hînkirina gramerê meseleyeke pir kevn e. Bingeha vê gramerê nîzama xwezayî ye. Nîzama xwezayî ta ji wextên kevn maye. Li gor vê nêrînê li dinyayê hevsengîyeke tabî heye, nîzamek heye û ji ber wê her tiştekî nîzama xwe heye. Di zimanî jî da nîzam heye, ew gramer e. Ew nêrîn bi fizîka Newton pir hêz girt çunkî fizîka Newtonî ew nêrîn îzeh kir. Hinek bingehên wan dişidîne û her tiştî mîna sistemekê mîna pergelekê tarîf kir. Ziman jî wisa ye. Nîzama ziman yan jî ew pergala ziman ji awanîyan tê meydanê û her awanî jî xwedîyê fonksiyonekê û demekê ye. Ew her yek

awanî karê xwe tîne cih, ew dibe çerxkar, digere, digerîne. Ew tasdîx, yanî ew femkirina kosmosê ya berê tasdîxa ziman bixwe bûye. Binêrin *deng* dibêjin, *deng* bi xwe li ser yek me'neyê nîne. Deng tên, li cihêkî bi hevra peyvan çêdikin, ji peyvan rêz çêdikin û ji rêzan jî axaftin û nivîsandin tê meydana, ziman tamam dibe. Ew aynî mîna fabrîqeyekê dixebite. Lê faydeyê vê ji me re tune ye. Em vê yekê bizanin çi dibe, tu tişt nabin, ziman pêşve naçe. Lê em vê çar tiştan yanî *guhdarkirin*, *axaftin*, *xwendin* û *nivîsandin* bibinin û wan bizanin, yanî em wan hîn bikin, hingê em dikarin zimanê xwe her li her derê baxivin, bikarbînin. Helbet ji bo wan ji me re çi lazim e? Pratîka hînbûn û hînkirinê lazim e.

Mesela rêbazên hînkirinê hene. Rêbaz, strateji û teknîkan qasî du sed rêbaz em hînî xwendekaran dikin. Mesela teknoloji heye îro, dîsa ji bo perwerdeyê materyalan çêdikin. Feqat dema em wan çêdikin, li jor tercîha me ya felsefî, tercîha me ya teorî, ya hînkirinê divê hevdu bigirin. Mesela berê dema ku *îdealîzm* û *realîzm* felsefeyên perwerdeyê bû û *tevgerparêzî* teorîyê hînkirin bû rêbaz li gor wan bûn. Rêbaz gotin bû, mamoste pirsan dipirsîn, heqîqeta tiştan digotin tamam dibû. Lê niha dema ku *egzistansiyalîzm* û *konstruktîzîm* wek felsefeya perwerdeyê tercîh bikin, wê çaxê rêbaz jî diguhere. Niha di rêbazê de keşîfkirin heye, zêde giranî didin keşîfkirinê. Yanî ew tercîh ta ji serî heta binî divê hemû hevdu bigirin. Li gor Kurdan, li gor zimanê Kurdî, tercîha felsefî, teorîya hînkirinê û rêbazên hînkirinê divê hemû hevdu bigiri û da ku perwerdeya zimana Kurdî ya pêşverû bê holê.

ÇAVKANÎ

Beltekin, N. (2014). Okul ve Öteki Yurttaşlar: Kürt Politik Aktörlerinin Eğitimsel Deneyimleri.

İstanbul: Vate Yayınları

Beltekin, N. (2014). İşgücü Talebi ve Eğitim İlişkisi Üzerine Bir Analiz (İş İlanları örneği). *Elektronik Sosyal Bilimler Dergisi*, 13(51).

Bass, R. V., & Good, J. W. (2004, June). Educare and Educere: Is A Balance Possible In The Educational System? *The Educational Forum*, Vol. 68, No. 2, pp. 161-168.

Carrel, A. (1990). İnsan Denen Meçhul (R. Özdek, Çev.). İstanbul: Yağmur Yayınları.

Freire, P. (2003). *Ezilenlerin Pedagojisi*. (Hattatoğlu, D., & Özbek, E., Çev.) İstanbul: Yapı ve Kredi Yayınları.

Gutok, G. L. (2014). *Eğitime Felsefi ve İdeolojik Yaklaşımlar*. (Kale, N., Çev.) Ankara: Ütopya Yayınevi.

- Güntaş Aldatmaz, N. (2020). Topluluk Dillerinin Kaybolması ve İletişim: Kırmancca (Zazaca) Örneği. Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü
- Göçer, A. (2012). Dil-Kültür İlişkisi ve Etkileşimi Üzerine. *Türk Dili*, 729(1), 50-57.
- Issı, M. (2011). Kürt Basını ve Kürdistan Gazetesi (1898-1902). *Şarkiyat*, (9), 127-147.
- Kızılgeçit, M. (2012). Modern Psikolojide ve Tasavvufta Yalnızlık. *Recep Tayyip Erdoğan Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, 1(1), 131-150.
- Yıldız, A. (2018). Etik Bir İdeal Olarak Tanrı-İnsan ve İnsan-ı Kamil: Said Nursi'ye Referansla Nübüvvet ve Felsefe Geleneği Üzerinden Bir Bakış. *Katre Uluslararası İnsan Araştırmaları Dergisi*, (1), 161-178.

PERWERDEYA ZIMANÎ DI AKTÎVÎZMA ZIMANÎ DA; TECRÛBEYA TZPKURDÎ³

Ronayî ONEN

Destpêk

Aktîvîzma zimanî formeke çalakîyên kolektîf e ku armanca wê vejîna çandî û zimanî ya komeke zimanî ya bindest û nasîna wê ya sîyasî ye (Fishman, J. 1991). Armanca çandî ya vejandinê ew e ku berê zimanê bindest veguherîne ber bi zimanê serdest ve. Armanca siyasî jî vesazkirina mafên zimanên bindest ên di qada giştî da ye. Ango aktîvîzma zimanî di xwe da du xetan dihewîne; hewldanên vesazkirina polîtîkayên serdestan bo lehê zimanên bindest û hewldanên

³ Nivîskar ji bo nivîsandina vê gotarê ji teza xwe ya doktorayê sûd wergirtiye ku sernavê wê “Türkiye’de Hâkim ve Muhalif Politikanın Gerilim Alanlarından Biri Olarak Kürtçe Dil Meselesi”. MSGSÜ, Sosyoloji Anabilim Dalı, 2020.

berevajîkirina helwestên li hember zimanên bindest. Li vir mebest hem helwesta serdestan hem jî helwesta bindestan bi xwe ye.

Di vê peywendê da aktîvîstên zimanî ew kes an jî kom in ku hewl didin statuya fermî ya zimanên bindestan ji nû ve saz bikin û / an jî ji bo bipêşxistin û berbelavkirina wan zimanan kar û barên bi ray û bîryar bimeşînin (Spolsky, 2012). Ew li hember siyaseta asîmîlatîf a dewletan siyaseteke nû pêşniyar dikin û / an jî bo vejîna zimanên bi xeteraya wendabûnê ve rû bi rû mane nexşerêyekê didin ber xwe. Li vir “û / an jî” tê bikaranîn lewma aktîvîzmeke an jî terîfeke aktîvîzmê ya yekpare tune. Dibe ku komek an jî rêxistineke aktîvîstan her duyên navborî bi hev re bike armanc an jî yekî ji wan. Aktîvîzma zimanî di peywendê de fireh de hewla veguherîna siyaseta zimanî ya fermî, civakî an jî malbatî ye. Aktîvîzma zimanî wekî ku di terîfa Gitlin a aktîvîzmê de heye dibe ku bi qasî raya giştî bibihîze bi dengê bilind heta biqirecir û girseyî be (Gitlin, 2012) an jî dibe ku di qadên samîmî û bisînor de bi awayekî bêdeng û takekesî be.

Di vê peywendê de takekesên ku hewl didin zimanê bav û kalan hîn bibin jî wekî aktîvîstên zimanî têne qebûl kirin. Darrell Kipp ku li ser aktîvîzma zimanî dinivîse dibêje ku hewldanên bi vî rengî dikin ku ziman bisitire û derbasî nifşên nû bibe ji ber vê yekê bo zimên biqîmet in (Kipp, 2000).

Dema mirov bala xwe dide siyaseta zimanî ya hin welatan, dibîne ku bi saya pêketinên bi destê rêxistin, komên biçûk heta takekesan hin guherîn pêk hatine. Wekî di mînakê îbranîkî de aktîvîzma zimanî carinan dibe perçeyeke têkoşîna komên etnîkî ya ji bo xweserî an jî serxwebûnê, carinan jî wekî di mînakê Hawayîyan de ji hewldanên komeke biçûk pêk tê ku rê li ber guherandina siyaseta zimanî ya dewletekê vedike (Spolsky, 2009, r.204). Zimanê Hawayîyan li ber wendabûnê bûye û komeke dê û bavan daxwaz kiriye ku zarokên wan di perwerdehiyê de li gel Ingilîzî zimanê dayikê jî bi kar bînin. Wê daxwazê rê daye aktîvîzmeke lokal û di encamê de zimanê wan li gel zimanê Ingilîzî wekî zimanê fermî hatiye destnîşankirin.

Bernard Spolsky destnîşan dike ku du muxatebên aktîvîstên zimanî hene; serdestên ku li ser zimanî tehakûm/pêkutiyê pêk tînin û axêverên wî zimanî (Spolsky, 2009, r.204). Di gel vê peywendê di vê gotarê da ji aktîvîzma zimanê Kurdî qest ev e; Hemî peyan an jî hewldanên ku di siyaseta zimanî ya Devleta Tîrkiye û / an jî siyaseta zimanî a Tevgera Kurd da veguherînan dikin armanc. Ne tenê di siyaseta zimanî de, heman demê di reftar an jî boçûnên zimanî (*language attitude*) de jî armanc veguherîn e.

Aktîvîzma zimanê Kurdî her kiriye armanc ku berê veguherîna Kurdî (language shift) ya ber bi Tirkî ve di lehê Kurdî de biguherîne. Ev armanc di xwe de têkoşîna li hember desthilatdariya zimanê Tirkî ya simbolîk (dawerî) û pragmatîk (kêrperest) dihewîne. Rehenda (*dimension*) pragmatîk a vê têkoşînê amadekirina bingeheke civakî û fermî ye da ku zimanê Kurdî wekî zimanê rêveberî û perwerdehîyê bê bikaranîn. Rehenda simbolîk jî bi rêya berbelavkirina bikaranîna zimanê Kurdî vejandina nirxa simbolîk a zimanê Kurdî ye.

Wekî ku dê bê ravekirin, aktîvîzma Zimanê Kurdî du muxatabên xwe hene; dewlet / desthilatdar û aktorên siyasî û sîvîl ên Kurd. Aktîvîzma Zimanê Kurdî pir-rehendî (multi-dimensional) û pir-kirarî/aktorî (multi-actor) ye. Helbet li gel reh û şaxên wê yên ji cihokên cûda xwedîbûne mêjûyeke xwe heye.

Mirov dikare mêjûya wê bigihîne Ehmedê Xanî (1650-1707) û ji wir bîne rewşenbîrên Kurd ku di destpêka sedsala 20an de bang li Kurdan û desthilatdarên Osmanî kirine bo zimanê Kurdî. Ji wê demê çend mînak dê giringîya zimên a di cîhana ramanî ya rewşenbîrên Kurd ên demê de destnîşan bikin.

Yekemîn saziya fermî ya xwendekarên kurd Komeleya Xwendekarên Kurd - Hêvî (*Kurt Talebe-i Hêvî Cemiyeti/KTHC*) bû ku di sala 1912an de hatibû avakirin û heta sala 1914an xebatên xwe berdewam kiribûn. Ji manifestoya komeleyê ku di hejmara ewil a Hetaw-î Kurdê de hatiye weşandin, diyar e ku endamên komeleyê wisa bawer dikir kir ku netewe bi rêya zimên hebûna xwe diparêzin;

Her neteweyekê zimanê xwe heye, ew netewe hem bi zimanê xwe diaxivin hem jî bi wî zimanî dixwînin û dinivîsin. Berê kurdan jî zimanê xwe yê mikemel hebû ku pê dixwend û dinivîsand û wan bi wî zimanê xwe gelek pirtûk hebûn, lê belê piştê ew ziman hêdî hêdî hat jîbîrkin û tenê li herêmên derveyî ê bajaran hat bikaranîn. Lê belê, neteweyek nikare bi nîv-zimên hebûna xwe biparêze. Neteweyeke wisa ne dibe xwedî şiyanwerî ne jî pêşveçûnê; lewre wezîfeya ewil a komeleyê ew e ku zimanê kurdî derbixin asta zimanekî wisa ku bi kêrî xwendin û nivîsînê bê; pirtûkên bi zimanê kurdî çap bikin û wan li seranserê Kurdistanê berbelav kin da ku kurd hînî zanist û şiyanweriyan bibin (Malmîsanij, 2002, rr.257-261).

Rewşenbîrên serdema navborî hem bang li serdestan kiriye ku rê li ber bipêşketina zimanê kurdî negirin hem jî bang li gelê kurd kiriye ku li zimanê kurdî xwedî derkevin. Xebatên Celadet

Bedirxan (1893-1951) ên li ser zimanê kurdî qonaxeke din a girîng e di aktîvîzma zimanê Kurdî de.⁴ Mirov dikare ji wir xwe bigihîne Musa Anter (1920-1992) ku bi helbesta xwe ya bi navê “Qimil” mêjîyê desthilatdaran hejandiye (İleri Yurt, 31.08.1959). DDKOîyên⁵ ku di salên 1960î de di dadgehan de heyîna zimanê Kurdî parastîye qonaxeke din a Aktîvîzma Zimanê kurdî ye (Devrimci Doğu Kültür ... 1975, r. 22). Di vê peywendê de nivîskarên kovara Tîrêjê ku her bang li rewşenbîrên Kurd kiriye da ku li zimanê xwe xwedî derkevin û peyrewên wan ên ku di salên 1990î de dengê Kurdî di çapemenî, kovargerî û wêjeyê gurtir kirin jî hejayî bibîrxistinê ne. Lê ji bo ku em qala aktîvîzmeke girseyî ya zimanî bikin divê em berê xwe bidin salên 2000î. Lewre aktîvîzma zimanê kurdî encax di salên 2000î de bideng bû.

1. Aktîvîzma Zimanê Kurdî ya Girseyî

Di destpêka 2000î da di siyaseta Tirkiyeyê da veguherîneke vegotinî pêk hat. Yek ji sedemên vê veguherînê berendamtîya Tirkiyeyê ya Yekîtîya Ewropayê (YE) bû. Li ser daxwaza YE'yê, dewletê di warê bipêşxistina mafên çandî da hin soz dan. Di vî warî de hin gav jî hatin avêtin.⁶ Ji van gavan a yekem di Cotmeha 2001î de pêk hat. Di benda 26an a makeqanûnê de hikma “(...) nabe ku di ravekirin û belavkirina ramanan de zimanekî ku bi qanûnan ve hatiye qedexekirin bê bikaranîn” hate derxistin, her wiha di benda 28an de jî îbareya “Nabe ku bi zimanekî ku ji aliyê qanûnan ve hatiye qedexekirin weşan bê kirin” hate jêbirin.

Bi vê yekê re bingeha makeqanûnî ya mewzûata ku pêşî li ber bikaranîna zimanê kurdî ya di ragihana girseyî ji holê rabû. Derbira “zimanê bi qanûnê hatiye qedexekirin” ji makeqanûnê hate derxistin (Resmî Gazete, 2001). Dîsa di Tebaxa 2003an da Pakêta întîbaqê ya 7an rê li ber perwerdeya kurdî ya di kursên taybet da vekir (Resmî Gazete, 2003). Ev yek bi vesazkirina Kanûna Perwerde û Hinkirina Zimanên Biyanî ve pêk hat ku tê de îbareyeke wekî “ziman û zaravayên ku hemwelatîyên Tirk di jiyana xwe ya rojane de bi kar tînin” hate bicihkirin. Li dû van vesazkirinan hinên din jî pêk hatin wekî rê li ber perwerdeya kurdî ya di zanîngehan da jî vebû. Bi kurtasî mirov dikare bêje siyaseta zimên a Tirkiyeyê di salên 2000î de ji siyaseteke qedexeker veguherî ser siyaseteke sazgêr. Helbet ku meriv vê veguherîne bes bi pêvajoya

⁴ Bo agahîyên firehtir bnr. Onen, 2019

⁵ Devrimci Doğu Kültür Ocakları: Rêxisitna ku ji aliyê rewşenbîrên Kurd ve di sala 1969an de hatiye damezirandin. Damezirandina vê rêxistinê wekî destpêka jêveqetîna çepgirên Kurdan a ji çepgirên Tirkan tê qebûlkirin. Rêxistinê xebatên xwe heta sala 1971î domandine.

⁶ Di der heq vesazkirinên nû yê serdemê bo agahîyên firehtir bnr. Sadoğlu, 2017

Yekitîya Ewropayê binirxîne dê ev yek analîzeke kême be. Lewre hin sedemên dîtir ên konjunktûrî hene her wiha ev guherîn bi siyaseta hikûmeta demê ya pragmatist jî peywendîdar e.⁷

Li aliyê din di destpêka salên 2000an de di vegotina Tevgera Kurd a serdest da jî guherînek pêk hat. Tevgera Kurd eşkere kir ku dê ji serxwebûnê wêdetir li çareyeke hundirîn bigere, sîyaseteke sîvîl bimeşîne û bidestxistina mafên çandî derxe pêş.⁸ Bi vê veguherînê Tevgera Kurd mafên çandî û zimanî zêdetir derxistin pêş û di encamê de aktîvîzmeke zimanî ya girseyî dest pê kir.

Di mêjûya aktîvîzma zîmanê Kurdî de yekem pêketina girseyî ji aliyê xwendekarên zanîngehan ve pêk hat. Di salên 2001-2002an de ji aliyê xwendekaran ve bi daxwaza “dersa Kurdî ya bijarî” derdora 10 hezar daxwazname hatin dayîn. Xwendekaran bi van daxwaznameyên ku bi dirûşma “Zîmanê min hebûna min e” hatibûn nivîsandin daxwaz kirin ku kurdî wekî derseke bijarî di zanîngehan de bê hînkirin. Ev daxwaza perwerdeya kurdî bû ku piştî çend salan dê dewsa xwe ji daxwaza perwerdeya bi kurdî re bihişta. Di encama vê çalakiyê de lêpîrsîn li xwendekaran vebûn, gelekê wan ji zankoyan hatin bidûrxistin.

Wekî hate bilêvkirin di sala 2003an da di benda 2932an a qanûna Perwerdehî û Hîndekariya Zîmanên Biyanî da guherînek pêk hat. Li gorî vê qanûnê hîndekariya zîmanên biyanî yê ku ji aliyê Dewleta Tirk ve nayên nasîn, qedexe bû. Guherîna vê qanûnê rê li ber perwerdeya zîmanê Kurdî vekir.

Bi vê yekê re Kurdan li bajar û bajarokên wekî Riha, Diyarbekir, Batman, Stenbol, Edene, Wan, Qoser, Bazîd û hwd. kursên Kurdî vekirin. Lê di 2005an de bi biryarekê ve ev kurs hatin girtin. Wekî sedem bal hate kişandin ku “li cihanê tu gel zîmanê xwe li kursan hîn nabin.” Ji ber ku hemî kurs di heman demê de hatibûn girtin diyar bû ku ew kurs bi biryareke bi giştî û navendî hatine girtin. Girtina kursan nîqaşeke dorfireh da destpêkirin û di encamê da rê li ber aktîvîzmeke zîmanî ya girseyî û birêxistin vekir. Jixwe di daxuyanîyên ku dihatin dayîn de dihat destnîşankirin ku dê daxwaza perwerdeya bi zîmanê dayikê bê kirin (Evrensel, 01 Ağustos 2005).

⁷ Ji bo analîzeke dîtir bnr. Onen, 2020.

⁸ Tevgera Kurd di salên 2000an de bi sê têgîhên cûda vegotîneke nû ava kir û ji ser wan telebên xwe yê sîyasî jî nû ve terîf kir -Komara Demokratîk, Xweserîya Demokratîk û Konfederalîzma Demokratîk- Bo agahîyên firehtir bnr. Jongerden û Akkaya, 2012, s.22

Ya rastî mirov dema bala xwe dide konjoktura wê demê, mirov dibîne ku girtina kursan ne pêkhatineke tesadufî an jî biryareke jixweberê bûye. Lewma ev dem ango sala 2005an di heman demê de bû şahidê veguherîna vegotina Tevgera Kurd jî, vegotina ku di destpêka salên 2000î xwe disipart komara demokratîk di wan deman de dewsa xwe da vegotina konfederalîzma demokratîk. Di model an jî pêşnîyara komara demokratîk da Tevgera Kurd telebên xwe yên sîyasî ji desthilatdariya xakî wêdetir wekî meseleyeke demokrasiyê ji ser siyaseta nasnameya pîranîparêz pênase dikir. Vê modelê li Tirkîyeyê hin reform pêşnîyar dikirin û sazkirina demokrasiya bingehhemwelatîti teleb dikir. Di vê çarçoweyê da mijara zimên jî wekî mijara pîranîparêzîya zimanî û çandî dihat bicihkirin. Lê belê modela xweserîya demokratîk wekî modeleke xwebirêvebirinê ya demokratîk telebên statûyê û desthilatdariyê derxistin pêş (Serxwebûn, 2005, r.2) Tevgera Kurd bi vê modele mafê rêveberîya sîyasî û îdarî teleb kir. Di vê vegotin û nexşerêya pê ve girêdayî da daxwaza xwesîreyeke heremî hebû, lewma daxwazên di der heq zimanî da ji daxwazên dera Kurdî ya bijarî veguherî daxwaza perwerdehîya bi Kurdî û pejiwandina zimanê kurdî wekî zimanê fermî. Ji lewre di peywenda mafên kolektîf ên gelekî zimanê Kurdî ket navenda dîskura sîyasî ya tevgera Kurd. Bi ser de “bipêşxistin û berbelavkirina bikaranîna zimanê kurdî wekî qadeke girîng a têkoşînê” hate destnîşankirin (Serxwebûn, 2005, r.21).

Li dû girtina kursan nîqaşên berbelav hatin kirin li ser nexşerêyeke bo kar û barên di der heq zimanî da û di encamê da biryara avakirina tevgera zimanî hat dayîn. TZPKurdî di vê atmosferê de ava bû. Di rêzîknameya tevgerê ya ku di sala 2006an de hat belavkirin da armanc wisa hatibû diyarkirin;

“TZPKurdî ji bo parastin û bipêşvebirina zimanê kurdî xebatê dike. Armanca wê bi riya xebatên lêkolînî û zimanzanîyê bipêşvebirina zimanê kurdî, bi riya propagandayê pêşvebirina hişmendiya kurdî û bi riya xebatên hîndekariyê jî bilindkirina asta zanî û naskirina zimanê kurdî ye.”

Yek ji armancên TZPKurdî bipêşvebirina zimanê Kurdî bû. Ev yek bi fikara bilindkirina nirxa pragmatîk a zimên ve girêdayî bû. Ji bo zimanê kurdî bigihêje asteke modern û wekî zimanê rêveberî û perwerdehîyê saz bibe dê xebatên lêkolînî û zimanzanîyê bihatina kirin. Bi ser de ji bo berbelavkirina bikaranîna zimên jî dê xebatên hişmendiye di nav gel de bihatina kirin û dîsa xebatên hîndekariyê di rojevê de bû ev her du xal jî bi fikara bilindkirina nirxa sembolîk a zimên

ve girêdayî bû. Wekî ku ji rêzîknameyê jî diyar e TZP Kurdî di destpêkê de bangeke hundirîn bû. Armanca ew bû ku hişmendîya zimanî ya di nav gelê Kurd de bê bipêşxistin û bikaranîna zimên bê berbelavkirin.

Wekî hate gotin aktîvîzma zimanî ya birêxistinî bo vejîna zimanên ku bi xeteraya wendabûnê ve rû bi rû mane nexşerêyekê dide ber xwe. Ev nexşerê hin çalakîyan di hundirîne ku yek ji wan berbelavkirina bikaranîna zimên û zindîhiştina zimên e. Ev yek bi bingeha xwe bi fikara wendabûna zimanî ve têkildar e ku ji bo neteweperweran manendî wendabûna neteweyê ye. Heke ziman ne zindî be, dê hebûna neteweyê jî gumanbar be (Hroch, 1994, r.33). Di heman demê de ji bo kesên çandparêz wendabûna zimanekî, wendabûna dewlemendiyeke ji mîrateya dinyayê ye. Lewre ji bo aktîvîzma zimanî ya birêxistinî plansaziyeke zimanî hewce ye da ku rê li ber wendabûna zimên ve bê girtin û ziman di hişmendîya axîverên wî zimanî bibe xwediyê nirxeke bilind a sembolîk.

Têgeha 'plansaziya zimanî' ji aliyê zimanzan Einar Haugen ve ji bo hemî hewlên hişmendîyê bikaranîna zimanî ku armanca wan guherandina reftara zimanî ya civatake zimanî ye (Haugen, 1996). 'Ji pêşniyara peyveke nû bigire heta afirandîna zimanekî nû' her hewldan di nava vê têgehê da cih digirin. Plansaziya zimanî di qadên cûda de hin çalakîyan di hundirîne:

Plansaziya statûyê (Statu Planning) tê wateya bidestxistina erkên nû yên zimanî wekî mînak sazîkirin/pejirandina zimanî wekî zimanê perwerdeyê, an jî wekî zimanê fermî. Ev yek zimên ji aliyê siyasî û civakî ve ji nû ve saz dike. Sazîkirina sîstemê nivîskî ji bo zimanê devkî, destpêkirina reformên bilêvkirinê, afirandina têgehên nû û çapîkirina pirtûkên rêzîmanî di çarçoveya çalakîyên berbelav ên plansaziya korpûsê (corpus planning) da cih digirin. Standardîkirina zimanî hêmaneke bingeîn a plansaziya korpûsê ye, ku wekî afirandîna û avakirina yekîtiya rêzîkên zimanî tê qebûlîkirin. Plansaziya prestîjê (prestige planning) derbarê avakirina paşxaneyê erênî ya psîkolojîk e, ku ji bo serfiraziya demdirêj a çalakîyên plansaziya zimanî gelekî girîng e. Bilindîkirina nirxa sembolîk a zimanî dike armanca. Helwestên berbelavkirin û bipêşxistina hînbûn/hînîkirina zimanekî jî wekî çalakîyên plansaziya hînbûn/bidestxistinê (acquisition planning) tên pênasekirin (Deumert, 2000 rr. 384- 418).

Dema mirov li kirinên TZP-Kurdî hûr dibe, mirov dibîne ku bi kirin û çalakîyên xwe hewla plansaziyeke giştî ya di nava civaka Kurdî de daye çî bi ser ketibe çî neketibe. Beşa bê dê di vê çarçoveyê da hewla analîza kirinên TZPKurdî bide.

2. Banga xwedîderketina li zimanê Kurdî (Plansazîya Prestîjê)

TZPKurdî kongreya xwe ya yekemin di 24-25ê Sibata 2007an de bi beşdarîya 50 delegeyan pêk anî. Di encamnameya kongreyê da bes bendek bo dewletê bû û bang li hikûmetê dikir ku “rê li ber polîtîkayên asîmîlasyonê bigire”. Lê bi pênc bendan di serî de sîyasetmedarên Kurd û nûnerên sazî û dezgehên Kurdan bang li gelê Kurd dikir ku li Kurdî xwedî derkevin û hemî kar û barên xwe bi kurdî bikin (Azadiya Welat, 27.02.2007).

Ev banga hundirîn a TZPKurdî di temama metnen wê da banga sereke bû û bi domdarî dihat kirin. Wekî ku berdevkê TZPKurdî yê demê Kahir Bateyî di yekem kongreya KURDÎDERA Amadê da bang li siyasetmedarên kurd kiriye ku dev ji siyaseta bi Tirkî berdin û bi Kurdî kar û barê xwe bimeşînin (Azadiya Welat, 15.01.2007).

Dema mirov bala xwe dide metnên destpêkê yê TZPKurdî mirov dibîne ku bi rêya rêxistineke ji binî ve di reftarên zimanî yê Kurdan de hewla veguherînekê dida di lehê Kurdî de. Geşepêdana hişmendîya zimanî ya di nav gelê Kurd da hîma bingehîn a vê peyanê bû. Wan bi domdarî û bi girîngîdanekê mezin bang li siyasetmedarên Kurd dikirin ku çalakîyên xwe bi kurdî bikin û xizmeta polîtîkayên asîmîlatîf nekin.

Pierre Bourdieu wisa angaşt dike ku ziman ji alava ragihanê wêdetir kapîtaleke civakî û sembolîk e ku rê dide domandina têkilîyên hêz û îqtidarê. Ziman çendî nişaneyê nasnameya kolektîf be jî wekî alava kontrola civakî jî erk digire. Li gorî Bourdieu tercîha zimanî li gorî zanîna axîvêr a di der heq nîrx û wateya civakî ya zimanan dîyar dibe. Ev nîrx dibe ku bi awayekî hêsa aboriyî be her wiha dibe ku nîrxêke çandî be wekî rêzdarî, şanazî an jî asta perwerdeyê. Ev nîrx di bazarên cûda de vediguherin. Wekî mînak zimanek çendî xwedîyê nîrxêke kêma ekonomîk be jî ji aliyê nasnameya komekê dibe ku xwedîyê nîrxêke bilind a sembolîk be (Bourdieu 1991, s.37). Li gorî Bourdieu kirinên di der heq zimên de ne tenê dîzayna ragihanê ne di heman demê de hewla bidestxistina hêz û karbidestîyê ne (Bourdieu û Wacquant, 1992 rr.142-143).

Li gorî Bourdieu ziman wekî hewa, roj an jî axê ji bikaranîna herkesî re ne vekirî ye ew jî çavkanîyeke xwezayî an jî bêsînor wêdetir e, lewre di gihîna “zimanê meşrû” de wekhevî nîne. Çawa ku di bazara malen îktîsadî de yekdestî/pawan hene, di bazara malên zimanî de jî pawan hene (Bourdieu 2016, r.242). Dahundirandina van têkilîyên zimanî yê newekhevî û tehakûmê dike ku behreya bikaranîna zimanê serdest bibe sembola statû û prestîjê bi ser de jî kirarên ku dûçarî tehakûmê dibin zimanê xwe biçûk dibînin. Di vê peywendê de desthilatdarên kolonyal da

ku gelên bindest bixin bin serwerîya xwe li ser zimanên wan tehakûman pêk tînin. Ev yek di wextê de (niha jî heta radeyekê) di mijara zimanê Kurdî de wisa bû ji lewre aktîvîzma zimanê Kurdî her hewl daye ku nirxa sembolîk a zimanê Kurdî bilind bike ku di lehê Tirkî da kêmbûye.

Di vê peywendê da mirov dikare hewlên TZPKurdî yên bo berbelavkirina hişmendîya zimanî bi daxwaza bilindkirina nirxa zimên a sembolîk ve têkildar bike. Wan hewl daye ku prestîja zimanê Kurdî bilind bikin û bi bangên xwe, ji sîyasetmedar, rewşenbîr, karsaz û hwd. xwestiye ku Kurdî di qadên cûda yên wekî siyaset, hiqûq, rêveberî, perwerdehî û aborî de xuyabar bikin.

3. Hewldanên bo berbelavkirina bikaranîna Kurdî

Bo berbelavkirina bikaranîna Kurdî karê herî mezin ku hat kirin hînkirina Kurdî bû. TZP Kurdî li KURDÎDER'ên ku li gelek bajar û bajarokan hatibûn avakirin dersa hînkirina Kurdî da bi hezaran xwendekaran. Ev bêş dê li ser kirinên TZPKurdî yên bo berbelavkirina bikaranîna zimanên Kurdî bisekine.

3.1 Atolyeyên zimanê kurdî (Plansazîya hînbûn/bidestxistinê)

Wekî hate gotin di nav armancên TZPKurdî de hînkirina zimanê kurdî jî hebû. Ji lewre jî destpêkê û pê ve hînkirina Kurdî her di rojê wê de cihê herî mezin girt. TZPKurdî xwe li bajar û navçeyan ji ser sazîyên wekî KURDÎDER û Enstîtuyên Zimên ve bi rêxistin dikir. Li van sazîyan dersên Kurdî wekî atolyeyan hatin organîzekirin ji lewre girêdana wan a bi Wezaretê Perwerdehiyê çênebû. Wane di destpêkê da wekî sê astan hatin lidarxistin; asta yekem asta duyem û asta sêyem. Ya rastî perwedeya zimanî ji ser du rehan diçû. Reha yekem ji bo kesên ku qet bi Kurdî nizanin hînkirina zimên wekî zimanê duyem bû. Ji bo wan kesan sê ast hebûn. Reha duyem jî ji bo wan kesan bû ku bi Kurdî kêmbûn zêde dizanin û dixwazin Kurdîya xwe bi pêş ve bixin. Ji bo wan kesan du ast hatibûn plankirin. Bi ser de jî ji nav wan her du koman ji bo kesên ku dixwazin bidomînin asta mamostetîyê dihat dayîn. Atolyeyên Kurdî bi taybetîyeke xwe ji kursên zimên ên ji rêzê cûda bûn. Li van atolyeyan du komên armanckirî hebûn; kesên ku qet bi Kurdî nizanin û yên zimanê wan î yekem/dayikê Kurdî bû ango bi Kurdî baş dizanîn. Di rewşên asayî de mirov zimanê xwe yê dayikê wekî perçeyê perwerdeya bi giştî li dibistanan bi pêş ve dixin, lê Kurd bo vê yekê ji sazîyên navborî perwerde digirtin.⁹

⁹ Ji bo sazîyên ku Kurdî lê hatiye hînkirin bnr. Kurt, Şehmus. (2020). *Türkiye'de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018)*. Teza Doktorayê ya Neçapbûyî, Diyarbekir: Zanîngeha Dicleyê, Enstîtûya Zanistên Civakî, Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî.

Di vê rewşê de sazîyên ku hewla hînkirina Kurdî dikirin divîya plansazîya xwe li gorî van her du komên cûda bikirina. Di destpêkê de ji ber kêmtirîna tecrûbetîyê û kêmtirîna derfetîyê her du kom di heman polan de bi cih dibûn û ev yek hem ji bo şagirtan û hem jî ji bo mamosteyan dibû pirsgerêk. Bes di nav demê de bi plansazîyên navendî ev pirsgerêk –helbet dîsa li gorî derfetan- hate çareserkirin.

Hînkirina zimên a wekî zimanê duyem û bipêşxisitina zimanê dayikê du tiştên ji hev cuda ne. Hînbûn an jî bidestxistina zimanekî pêvajoya têgîhana zimanekî ye. Di vê pêvajoyê de mirov kapasîteya hilberandina peyv û hevokan bi dest dixê ku ji bo pevragehandina di zimanekî de hewce ne. Bidestxistina zimanê avahîyan, rêzikan û temsîlan di hewînê. Bikaranîna zimên a bi awayekî serkeftî girêdayî bidestxistina amûrên wekî dengsazî, peyvsazî watenasî û tûrikeke dorfireh a peyvan e. Bidestxistina zimanê duyem hînbûna zimanekî duyem e. Ev yek piştî ku zimanê yekem bi awayekî bi rêk û pêk ava dibe pêk tê. (Ji bilî rewşên asayî ku hin zarok bi duzimanê an jî pirzimanê mezin dibin.)

Armanca perwerdeya zimanê dayikê jêhaybûna jor-zimanê (*metalinguistic awareness*) ye. Ji jêhaybûna jor-zimanê qest, “têgihîştina bêkêmasî ya ji xwendinê; têgihîştina bêkêmasî ya ji guhdarîkirinê; têgihîştina bilêvkirin û nivîsandina bêkêmasî ya hest, raman, çavdêrî û sêwirandinên xwe” ye. Di pêvajoya perwerdeya zimanê dayikê de mirov gencîneya xwe ya peyvan dewlemendtir dikin; di qadên cûda de têgihên nû hîn dibin, ji lewre behraya xwe ya bikaranîna zimên û xwe îfade kirinê bipêşvetir dibin. Her wiha di vê pêvajoyê da mirov ji rêzîkên rêzimanê û avahîya zimên haydar dibin. Di hevoksazî, peyvsazî û dengsazîya zimanê xwe da digihêjin.

Di vê peywendê da rê û rêbazên perwerdeya kurdî ya wekî zimanê duyem û ya wekî zimanê dayikê jî li gel hin hêmayên hevpar ji hev cûda ne. TZPKurdî berî her tiştî bi plansazîya xwe ya navendî û bi materyalên xwe hewl da ku plansazîya xwe li gorî vê zanîne bike.

Di perwerdeya zimên da mijareke din a ku TZPKurdî pê re mijûl bûyî meseleya varyantên zimên bûye. Ji varyantan qest pêşî zarava û piştê devok in. Di mijara zaravayan da her çî qas serdestî û giranîya Kurmancî ber bi çav be jî li gorî xebatên qadê¹⁰ TZPKurdî her xwestiye ku xebatên xwe duzaravayî bimeşîne her wekî di perwerdeya kurdî da jî. Bi vê peywendê li gorî derfetan

¹⁰ Hevpeyvînên bi mamoste û rêvebirên sazîyên bi TZPKurdî re û analîza metnên TZPKurdî. (Onen, 2020)

(mamoste û materyalan) hewla perwerdeya kirmanckî û di rêjeyeke kêma da ya soranî daye. Di van zaravayan da jî atolye li dar xistine.

Dema mijar varyantên zimanî be mamosteyên bi TZPKurdî ve girêdayî tevî cihêrengîyên xwe hewl daye ku di perwerdeya zimanî da helwesteke pîranîparêz nîşan bidin. Wan li hember devokên cuda yên zimanî hewl daye ku jêhaybûnekê ava bikin û devokên cuda li der ve nehêlin. Wan hewl daye ku bi çarçoweya rêzikên ku rêzimannasan danîne, nemînin û bergiya xwe firehtir bikin. Ji lewre wan mamosteyan pêvajoyeke hînbûnê ya dualî saz kirine. Hema bêje pîranîya mamosteyan destnîşan kiriye ku wan di pêvajoya hînkirinê da ji şagirtên xwe jî hîn bûne. Şagirtên ji herem ango devokên cuda tevî pêvajoyê kirine û rê li ber vekirine ku ew jî rêzik, peyv û qalibên devoka xwe di polê de bînin ser zimên. Bi vî rengî hemî aktorên perwerdeya zimanî beşdarî pêvajoyê bûne. Lê helbet mirov nikare vê helwestê wekî helwesta gelemperî destnîşan bike. Di vî warî de du xetên sereke hene. Yek ji wan xeta rêzikparast e. Ya din jî xetê ku perspektîfêke sosyo-lingûîstîk (civak-zimannasî) diparêze û tu varyant an jî bikaranînên zimanî wekî ya sereke nahesîbîne. Mirov dikare bêje rêjeyeke mezin a perwerdekarên kurdî naverêyek ji xwe re dîtiye hewl daye ku di xeta duyem de bîmînin bes lingekî wan di ya yekem de ye.

Ji bo berbelavkirina bikaranîna zimanê kurdî perwerdeya zimên hewce ye û ji bo wê jî perwerdekar divêt in. Ji lewre TZPKurdî di gihandina mamosteyên kurdî da jî xebat kiriye. Hema bêje li temama şaxên KURDÎDER'an asta mamostetîyî jî vebûne. Di vê astê de rêzikên rêzimanî di asteke bilind da hatine nîqaşkirin, li gorî derfetan dersên dengsazî, peyvsazî, watenasî û hwd hatine dayîn. Dîsa li gorî derfetan rê û rêbazên hînkirina zimanî wekî zimanê yekem û duyem hatine nîqaşkirin. Perwerdekarên asta mamostetîyê li ser mijara zarava û devokan jî rawestîyane.

Xaleke din a perwerdeya kurdî jî amadekirina materyalan bû. Di destpêkê de kêmasîya herî mezin tunebûna materyalan bûye. Li ser hewcedarîyê xebatên amadekirina materyalan bi taybetî pirtûkên dersê dest pê kir. Ew dê wekî navgîna sereke ya dîsa Kurdî bihatina bikaranîn. Di vî warî da kêmasîya herî mezin ew bû ku pirtûkên ku ji bo hemî astan hatine amadekirin tunebûn.

Lewre li ber dêstê amadekaran mînak tunebûn. Metodolojîyeke birêkûpêk a hînkirina kurdî tunebû. Di destpêkê de li ser van xalan nîqaş hatin kirin:¹¹

Dê pirtûk ji bo kê bin; bo kesên bi kurdî dizanin an nizanin?

Honaka mijaran dê çawa be: Kîjan mijar dê bi kîjan komepeyvan & kîjan komepeyv wê bi kîjan mijaran ve bîn dayîn. Rêza mijaran dê çawa be?

Rêzikên rêzimanî yê nîqaşbar dê çawa bê dayîn?

Dê çawa ji zimanê devokî azad be?

Di dawîya van nîqaşan da hin ji pirsan bê bersiv mane, lê wek encam rêzepirtûkên bi navê *Hînkere*¹² derketine. Piraîya pirsan bi pêvajoyeke dirêj, di dema amadekirinê da hatine bersivandin. Pirtûk sê caran ji nû ve hatine nivîsandin. Her carê li gorî nirxandinên mamosteyên ku ew di waneyên xwe de bi kar anîne û tecrûbeyên nivîskarên a dersdayîna di pirtûkan da hin guherîn pêk hatine. Ev jî wekî tecrûbeya dersdayîna bûye pêkhatineke pir-aktorî. Nirxandinên ji qadê lê zêde kiriye û têşe daye pirtûkan.

Çi ya TZPKurdî çi ya aktorên din rojeva sereke ya aktîvîzma zimanê Kurdî berbelavkirina bikaranîna zimanê Kurdî ye û çalakîya herî berbelav a di vî warî da hînkirina Kurdî ye. Motîvasyona herî mezin a hînkirina zimên zindîhiştina zimên e lewre xebatên qadê nîşan didin ku bikaranîna zimanê Kurdî di nav gel de kêr dibe (Opengin, 2012).

Xala herî girîng û nîqaşbar a perwerdeya zimanên bindest, ji ber kêmasîya otorîteyeke fermî ya biryardar, nîqaşa standartkirina zimên e. Wekî seranserî cîhanê jî wisa ye aktîvîstên zimên ku hewl didin zimên berbelav bikin, bi hewcedarîya zimanekî standart ve rû bi rû dimînin.

3.2 Konferans û komxebatên li ser zimanê kurdî (Plansaziya korpusê)

Di nav armancên TZPKurdî da standartkirina zimanê kurdî jî hebû. Wekî tê zanîn, zimanê Kurdî di wan salan de kêr zêde bûbû zimanekî nivîskî lê dîsa jî hin tişt hebûn ku li ser tercîhên kom û derdoran diman. Hin tişt hebûn hêj ji hev zelal nebûbûn û lîteratura hin qadan hêj bi Kurdî ava nebûbû. Lewma TZPKurdî neçar bû ku di ware standartkirina zimanê de jî hin tiştan bike.

¹¹ Hevpeyvînen bi mamoste û rêvebirên sazîyên bi TZPKurdî re û analîza metnên TZPKurdî. (Onen, 2020).

¹² Rêzepirtûkên bo hînkirina Kurmancî ku ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê hatiye weşandin. Hînkere 1,2,3. Ronayî Onen, Samî Tan, Stenbol: 2009-2020, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.

Standardkirina zimanî wekî afirandin û avakirina rêzikên hevpar ên zimanî tê têrîfkirin. Di pêvajoya standartkirina zimanî de pêvajoya kodkirinê (codification) heye ku mirov dikare wekî avakirina standardeke zimanî an jî fermî ji bo qada hîlbijartî ya zimanî pêname bike. Bi pîranî li ser sê pêngavan dabeş dibe: nivîssazî / graphisation (çêkirina sistemeke nivîsandinê), rêzimansazî/ grammatication (bijartina rêzik/normên rêzimanî) û peyvسازی/ ferhengسازی/ lexicalisation (pênasekirina peyv) (Haugen, 1987). Pêvajoya kodkirinê, wekî di mînaka Fransayê da bi pîranî ji aliyê akademyên zimanî ve tene birêvebirin; lê dîsa jî, wekî di mînaka Kurdan da kodkirin hin caran bûye serfiraziya kesayetan; beriya birêvebirina kodkirinê ya ji aliyê akademyan ve kesayetan peyanên kodkirinê dane destpêkirin.

Dema em bala xwe didin pratîk û çalakîyên TZPKurdî em dibînin ku li mîrasa Celadet Bedirxan a zimanî bûye xwedî û bi xebatên xwe hewl daye ku li ser xebata Celadet zêde bikin. Ango wan jî wekî gelek kes, sazî û dezgehên kurdan hewl daye ku zimanê standart xurttir bikin. Ji aliyêkê bi pirtûkên xwe yê rêzimanî û bi amadekirina materyalên bo hînkirina Kurdî bandor li pêngavên kodkirina Kurdî yê nivîssazî û rêzimansazî kiriye. Ji ber ku pirtûka Hînkere gelekî berbelev bûye (diyarname.com, 10.01.2021) û TZPKurdî bi hezaran şagirt gihandine¹³ mirov dikare bêje ev bandor bo dema xwe ne bandoreke biçûk e. Ji aliyê din jî TZPKurdî hewl da ku di hin qadan de lîteraturekê pêk bîne. Bi xebatên pêkanîna lîterature û çapkirina ferhengan jî bandora xwe li pêngava peyvسازیyê kiriye. Wekî mînak bi hevkarîya TMMOBê li Diyarbekirê 2-15 Gulana 2012an de li ser têgîhên teknîkî komxebatek li dar xistin. Ev xebat di nav neh mehan de bi beşdarîya zimanzan û endezyaran ve pêk hat. Di dawîyê da ferhengeke têgîhên teknîkî ya sêzimanî hate amadekirin. Dîsa bi hevkarîya Şaredarîya Mezin a Amedê Komxebata Têgîhên Rêveberî û Bajarvanîyê hate lidarxistin. Ev xebat di sala 2011an da bi beşdarîya zimanzan û xebatkarên Şaredarîyan bi rê ve çû. Termên bîngêhî ên di rêveberîyan da tîkî bîkaranî hatin diyarkirin. Nêzikî 265 termên îdarî hatin darastin (Dengê Amerîka,2011). Dîsa bi hevkarîya Kongreya Demokratîk a Civakê û Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve Komxebata Tendûrîstîya bi zimanê dayikê hate lidarxistin. Bi beşdarîya zimanzan, bijîşk û kedkarên tendurîstîyê ve di warê tendurîstîyê da termên bîngêhî hatin diyarkirin (TMMOB web).

Ev û hin xebatên bi vî rengî ku ji aliyê TZPKurdî ve hatin birêvebirin valahîyên mezin di qada lîterature de tije kirin. Armanca xebatên bi vî rengî ji alîkî jî bilindkirina nirxa sembolîk a zimanê

¹³ Hevpeyvînên bi mamoste û rêvebirên sazîyên bi TZPKurdî re (Onen, 2020)

kurdî ye. Wekî tê zanîn yek ji taybetîyên bingehîn ê pergala mêtîngêrîyê sazgêra kontrolê ya li ser zimên e (Ashcroft, 1989, rr.7). Serdest pergale wisa saz dikin ku bi rêya qedexekirin, tune hesabandin, biçûkxistin û hwd zimanê bindestan wekî zimanekî paşverû û kêr dest nîşan dikin. Bi sepanên serdestan ên çewsîner û der-mirovî çand, raman û awayê jiyane vediguherin. Serdest li bindestên xwe wisa telqîn dikin ku ew ji çandê kêr û paşverû ne, lewre rajêrî wan in. Loomba balê dikişîne ser vê yekê ku di nav demê de bindest jî ji vê yekê bawer dikin û xwe bi çavên serdestên xwe dibinin (Loomba, A, 2000, s. 40). Ji lewre di têkoşînan dij-kolonyal de aktîvîst bêgav in ku ji serdestan hem di asta siyasî û hizrî da hem jî di asta hestî da qeb bixwazin (Loomba, A, 2000, s. 73). Ev qebxwestin ji redkirina hizra berzîya zimanê serdestan dest pê dike û bi hewla berzîkirina nirxa sembolîk a zimanê gelê bindest berdewam dike.

Di vê peywendê de hewla TZPKurdî ya bipêşxistina zimanê Kurdî, hewla berzîkirina nirxa sembolîk a zimanê kurdî ye di hişê kurdan û serdestan de. Armanç haydarkirina Kurdan e ku zimanê wan têra xwe heye. Di heman demê de ji serdestan re jî tê gotin ku zimanê Kurdî bo daxwazên wan têr dike ango wekî zimanê rêveberî û perwerdehîyê karîger e. Xebatên bi vî rengî helwestek e li hember desthilatdarîyê û bingeha meşrû ya daxwazên xweserîyê amade dikin.

Helbet xebatên bi vî rengî ne tenê ji aliyê TZPKurdî ve tên kirin, amadehîya bingehêke lîteraturî ya ji bo zimanê nivîskî û perwerdehîyê xema gelek kes û sazîyan e bi dehan salan e. TZP Kurdî ji yek ji tevkarê vê qadê ye û girseyîbûn û kolektîfbûna wê wê xweser dike.

4 Têkoşîna bo Perwerdeya bi Zimanê Dayikê (Hewla Plansazîya Statuyê)

Wekî me berê jî got aktîvîzma ku ji aliyê TZPKurdî dihat meşandin du muxatabên xwe hebûn. Û di destpêkê de TZPKurdî zêdetir dengêkî hundirîn bû bang li Kurdan dikir ku li zimanê xwe bibin xwedî, lê piştî çend salan bi guherîna vegotina siyasî jî bi taybetî bi bilindkirina daxwazên xweserîya heremî bi dengêkî girseyî bang li desthiladaran jî kir. Daxwazên kolektîf ên zimanî derketin pêş û ji bo Kurdî statuya fermî û perwerdeya bi kurdî hat daxwazkirin.

Di sala 2008an de TZP Kurdî daxuyanî da ku dê kampanyayêke bi daxwaza perwerdeya bi zimanê dayikê bidin destpêkirin. Di çarçoweya kampanyayê da li bajar û bajarokên cuda meşên girseyî pêk hatin, li kuçe û kolanan dersên kurdî hatin dayîn (Azadiya Welat, 19.09.2008). Roja ewil a serdema perwerdehîyê li dibistanan boykota dersan pêk hat. TZPKurdî bang li malbatan kir ku zarokên xwe bo rojekê neşînin dibistanan. Slogana derket pêş û sembola vê kampanyayê ev bû; Êdî Bes e! Em Perwerdehiya bi Zimanê Xwe Dixwazin! Ev kampanya bi salan dom kir, bi

vê kampanyayê daxwaza perwerdeya bi Kurdî ket rojeva Kurdan. Mobilizasyona li dor vê daxwazê cara ewil ewqasî girseyî bû. Di nav salan da dema boykota dibistanan ji rojekê bu hefteyek.

Di sala 2014an de kampanyayê li xwe zêde kir û di bangewaziya kampanyayê da hate eşkerekirin ku dê wê salê dibistanên Kurdî vebin. Li Diyarbekir, Cizîr û Geverê sê dibistanên kurdî ji aliyê aktivîstên TZPKurdî û nûnerên sazîyan ve hatin vekirin (Azadiya Welat, 15.09.2014). Di daxuyanîya di derbarê dibistanan da hate gotin ku “zarokên kurd ne bê alternatîf in, kurd ê bingeha perwerdehîya bi kurdî bi destê xwe ava bikin” (Azadiya Welat, 04.09.2014).

Armancên sembolîk û pragmatîk ên daxwaza perwerdeya bi Kurdî hene ku derûdoreke berfireh a Kurdan li vê daxwazê dibin xwedî. Armanca sereke ew e ku rê li ber mirin/wendabûna zimanî bê girtin. Ji lewre lîteratur wisa nîşan dide ku zimanên ku nebûne zimanê perwerdeyê bi xetereya mirinê ve rû bi rû ne (Kangas, 2000). Bi ser de xebatên qadê nîşan dide ku veguhastina kurdî ya di navbera nîşên berê û yên nû de kêm dibe û polîtîkayên asîmîlasyonê bi ser dikevin (Rawest, 2020). Ji lewre hewlên vesazkirina zimanê Kurdî ya wekî zimanê perwerdehîyê bi fikara veguhastina zimanî û rêlibergirtina asîmîlasyonê ve eleqeder e. Helbet ev daxwaz bi daxwaza desthilatdarîyê ve jî ji nêz ve eleqeder e. Daxwaza xweserîyeke çandî û zimanî sembolîzekirina nasnameya çandî û yekîtîyê ye di heman demê da meşrûtiya daxwaza desthilatdarîya heremî qewîtir dike.

Encam

Hemî peyanên ku damezirîna mafên zimanî yên Kurdî dikin armanc û hemî hewlên takekesî û/an jî kolektîf bo vejîn, zindîhiştin û bipêşxistina zimanê Kurdî aktivîzma zimanê Kurdî pêk tînin.

Aktivîzma zimanê Kurdî her kiriye armanc ku berê veguherîna Kurdî (language shift) ya ber bi Tirkî ve di lehê Kurdî da biguherîne. Ev armanc di xwe da têkoşîna li hember desthilatdariya zimanê Tirkî ya sembolîk (dawerî) û pragmatîk (kêrperest) dihewîne. Rehenda (*dimension*) pragmatîk a vê têkoşînê amadekirina bingeheke civakî û fermî ye da ku zimanê Kurdî wekî zimanê rêveberî û perwerdeyê bê bikaranîn. Rehenda sembolîk jî bi rêya berbelavkirina bikaranîna zimanê Kurdî vejandina nirxa sembolîk a zimanê Kurdî ye.

Wekî bal hat kişandin, aktivîzma zimanê Kurdî pir-aktorî û pir-rehendî ye. Ev gotar li ser yek ji wan aktoran rawestîya û aktivîzma zimanî ya ku ji aliyê TZPKurdî ve hatiye meşandin di

peywenda perwerdeya Kurdî û perwerdeya bi kurdî de nirxand. TZPKurdî ji bo bilindkirina nirxa sembolîk a Kurdî û vesazkirina zimanî ya civakî û fermî xebat kiriye. Ev tevger bi awayekî gelemperî xwediyê plansaziyeke zimanî bûye. Di çarçoveya plansazîya statuyê da bo ku Kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê xebat meşandine. Li gel şaredariyan cad kiriye ku bi rêya xizmeta bi Kurdî ve zimanê Kurdî di qada giştî da karîger bike. Di çarçoveya plansazîya korpuse de ji bo kurdî bibe zimanekî standard ê perwerde û rêveberiyê ji xebatên rêzimanî bigire heta xebatên termînolîyê çalakîyên bingehîn pêk anîne. Di çarçoweya plansazîya prestîjê de ji bo xuyabarbûn û nirxa sembolîk a Kurdî zêdetir bibe xebat meşandine. Di dawiyê de jî di çarçoweya plansazîya hînbûn/bidestxistina zimanî bi awayekî berfireh xebatên perwerdeya (bi) Kurdî kirine û ji bo bingeha hînbûn û hînkirina kurdî xurttir bike mamoste gihandine û materyal amade kirine.

Armanca vê gotarê fehmkirina ji hewl û armancên TZPKurdî bû, ji lewre li ser bandora wê ya li ser civakê û sînardarbûna wê nehat sekinîn. Bes, mirov dikare bêje vê tevgerê xwe gihandiye girseyeke mezin a Kurdan û di warê hişmendîya Kurdî da bandor li civakê kiriye. Ji aliyê sînardarbûna wê jî mirov dikare bêje demdemî di bin sîya jor-sîyasetê de maye û vê yekê hêza wê kêr kiriye. Ji aliyekî jî ber ku wekî perçeyeke Tevgera Kurd a serdest hatiye nasîn, hin şaxên din ên aktîvîzma zimanî tevî nebûne û vê yekê nehiştiye ku fikr û ramanê cuda lê zêde bibin. Ji aliyê din gelek caran jî ber rojeva sîyasî babeta ziman hatiye îhmalkirin an jî wekî xaleke talî hatiye dîtin. Aktîvîzma zimanî hêzeke civakî ye ku potansîyeleke mezin a veguherandina civakî dihewîne ji ber vê xala ku bal hat kişandin, TZPKurdî ji potansîyela xwe ya veguherandina civakî ya di derbarê reftarên zimanî de kêr kiriye.

ÇAVKANÎ

Haugen, E. (1987) "Language Planning" dnd Ammon U. Dittmer, N. Mattheier, J.K. *Sociolinguistics. An International Handbook of the Science of Language and Society*. Berlin / New York: de Gruyter rr.626-637.

Bill, A. Griffiths, G. Tiffin, H. (1995) *The post-colonial Studies Reader*, London: Routledge,

Bill, A. Griffiths, G. Tiffin, H. (1989) *The Empire Writes Back: Theory and Practice in Post-Colonial Literatures*, New York: Routledge

- Bourdieu, P. (1991) *Language and Symbolic Power*, Cambridge: Harvard University Press.
- Bourdieu, P. (2016) *Akademik Aklın Eleştirisi: Pascalca Düşünme Çabaları*, İstanbul: Metis Yayınları
- Bourdieu, P. Wacquant, L. (1992) *Düşünümsel Bir Antropoloji İçin Cevaplar*. İletişim Yayınları: İstanbul rr.142-143
- Crystal, D. (2015) *Dillerin Katli*, wer. Cansız, G. İstanbul: Profil yy
- Deumert, A.(2000) “Language Planning and Policy”, dnd. *Introducing Sociolinguistics*, Meshtrie, R. Swann, J. û Deumert, A. Edinburgh: Edinburgh University Press, rr. 384- 418
- Devrimci Doğu Kültür Ocakları Dava Dosyası*, (1975) Ankara: Komal
- Fishman, J. (1991) *Reversing Language Shift*. Philadelphia: Multilingual Matters Ltd.
- Fishman, J. (2001) *Can Threatened Languages be Saved? Reversing Language Shift Revisited*. Philadelphia: Multilingual Matters Ltd.
- Gitlin, T. (2012) *Letters to a Young Activist Paperback*, Newyork: Basic Books
- Hroch, M. (1994) *The social interpretation of linguistic demands in European national movements*. Florence: European University Institute
- Kangas, T. S. (2000) *Linguistic Genocide in Education or Worldwide Diversity and Human Rights?* NJ: Lawrence Erlbaum, Mahwah
- Kipp, D. R. (2000) *Encouragement, Guidance, Insights, and Lessons Learned for Native Language Activists Developing Their Own Tribal Language Programs*, Piegan Institute's Cut-Bank Language Immersion School
- Kurt, Ş. (2020). *Türkiye’de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968-2018)*. Teza Doktorayê ya Çapnebûyî, Diyarbakır: Dicle Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Loomba, A. (2000) *Kolonyalizm ve Postkolonyalizm*, wer. Küçük, M. İstanbul: Ayrıntı
- Malmîsanij, (2002) *Kürt Talebe- Hêvî Cemiyeti İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği*, İstanbul: Weşanên Avesta

Onen, R. (2019) *Ziman û Netewesazî: Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê*. Stenbol: Weşanên Peywend

Onen, R. (2020) *Türkiye’de Hâkim ve Muhalif Politikanın Gerilim Alanlarından Biri Olarak Kürtçe Dil Meselesi*, Teza doktorayê ya çapnebûyî, MSGSÜ, Sosyoloji Anabilim Dalı.

Öpengin, E. “Sociolinguistic situation of Kurdish in Turkey: Sociopolitical factors and language use patterns”, *De Gruyter Mouton*, DOI 10.1515/ijsl-2012-0053, IJSL 2012; 217: 151–180

Spolsky, B. (2009) *Language Management*. Cambridge: Cambridge University Press,

Spolsky, B. (2012) *The Cambridge Handbook of Language Policy*. Cambridge: Cambridge University Press

Rojname & Kovar

Anter, M. İleri Yurt, 31.08.1959

Sadoğlu, H. (2017) “Türkiye’nin Yakın Dönem Dil Politikaları”, *Pesa Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Cilt. 3, h.1

Jongerden J. û Akkaya A. H. (2012) “The Kurdistan Workers Party and a New Left in Turkey: Analysis of the revolutionary movement in Turkey through the PKK’s memorial text on Haki Karer”, *European Journal of Turkish Studies*, h. 14

“Encamnameya TZPKurdî”, *Azadiya Welat*, 27.02.2007

“Yeniden Yargılanma Kürt Sorununun Çözümüne Vesile Olmalıdır”, *Serxwebûn*, Köln: 2005, h. 281

“Yeniden Yapılanma Kongresi Kararları”, *Serxwebûn*, Köln: 2005, h. 281

“Divê Zimanê Siyasetê bi kurdî be”, *Azadiya Welat*, 15.01.2007, h. 154

Haugen, E. (1996) “Dialect, Language, Nation”, *American Antropologist*, h. 68, 1966, rr.922-935

“Li Dêrikê Perwerdehiya bi kurdî hat dayîn”, *Azadiya Welat*, 19.09.2008, sayfa:4

“Dibistanên Kurdî vedibin”, *Azadiya Welat*, 15.09.2014, s:7

“Zarokên Kurd ne bê alternatif in”, *Azadiya Welat*, 04.09.2014, sayfa:7

Çavkanîyên Fermî

Kanun No: 4709, Resmi Gazete: 17.10.2001, hejmar:24556

Resmi Gazete, 07.08.2003, Perşembe, hejmar: 25192

Çavkanîyên Internetê

“Rekorek din: Pirtûkek ziman jî gihîşt çapa 10'an”, *diyarname.com*, 10.01.2021

<https://diyarname.com/news.php?Idx=50925> (25.05.2021)

“Kürtçe dil kursları kapatıldı”, *Evrensel Gazetesi*, 01.08.2005

<https://www.evrensel.net/haber/163969/kurtce-dil-kurslari-kapatildi> (26.11.19)

T.C Avrupa Birliği Bakanlığı Web Sitesi

<https://www.ab.gov.tr/30573.html> (16.12.2017)

“Ferhenga Zaravên Teknîkî: Ferhenga Kurdî-Tirkî-Îngilîzî ya Teknîkî”

https://play.google.com/store/books/details/Hasan_G%C3%BCneyli_FERHENG_A_ZARAV%C3%8AN_TEKN%C3%8EK%C3%8E?id=dsvBBQAAQBAJ&hl=en_IE&gl=US (10.01.2021)

“Encama Komxebata Stnadartkirina Termên Îdarî ya bi Kurdi li Tirkîye” *Dengê Amerika*, 01.30.

2011; <https://www.dengeamerika.com/a/encama-komxebata-stnadartkirina-termen-idari-ya--bi-kurdi-li-tirkiye-114896854/1115255.html> (10.01.2021)

“Diyarbakır`da Düzenlenen Kürtçe Teknik Terimler Çalıştayı Sona Erdi”, *TMMOB Makine Mühendisleri Odası Web Sitesi*, <https://mmo.org.tr/haber/diyarbakirda-duzenlenen-kurtce-teknik-terimler-calistayi-sona-erdi> (30.1.2020)

Bila Saziya Zimanê Kurdî bê damezirandin, *Amidakurd*, 27.01.2011, http://www.amidakurd.org/ku/nuce/bila_saziya_ziman%C3%AA_kurd%C3%AE_b%C3%AA_d_amezirandin (s.e: 30.01.2020)

“Anadilde Sağlık Çalıştayı, Atasoyer Sağlık Ve Politika Okulu Web Sitesi, <http://atasoyersaglikpolitikaokulu.org/etkinlikler/dtk-anadilde-saglik-calistayi-sonuc-bildirgesi/> (30.1.2020)

“Ebeveyn ve çocuk arasında ana dilin durumu” *Rawest Araştırma Merkezi*, Şubat 2020

https://rawest.com.tr/wp-content/uploads/2020/02/Ebeveyn_Ana_Dil_Arastirmasi.pdf (22.03.2020)

Modelên Perwerdehiya Pirzimanî û Rewşa li Tirkîyeyê ji bo Kurdî

M. Şerif Derince

Kurte

Ji bo zimanê Kurdî di perwerdehiyê de were bikaranîn li Tirkîyeyê bi salan pê de têkoşîneke mezin hatiye meşandin. Beşeke girîng ji vê têkoşînê, li dor wê daxwazê dirûv girtiye ku kurdî bibe fermî û wek zimanê hîndekariyê were bikaranîn. Lê belê hejmara xebat û lêkolînên derbarê

çi cûre modêl dikarin bèn bikaranîn di perwerdehiya zarokên kurd de kê m bûn. Bi saya xebat, lêkolîn û têkoşînên girîng ên ji destpêka 2000'an heta çend salên dawî zêdetir derfet û dane berhev bûn ku mirov dikare hêsantir nîqaşên li modêlên perwerdehiyê ji bo zarokên kurd bike. Armanca vê gotarê ew e ku nîqaşek pêşkêş bike derbarê modelên perwerdehiya li ser bingeha zimanê dayikê û çar modelên perwerdehiyê pêşniyar bike ji bo hîndekariya zarokên kurd.

Destpêk

Ji bo zimanê kurdî bibe fermî û di qadên fermî de were bikaranîn bi salan e têkoşîneke mezin tê meşandin li Tirkîyeyê. Beşeke girîng ji vê têkoşînê, li dor wê daxwazê dirûv girtiye ku zimanê dayikê bibe zimanê bingehîn ê hîndekariyê di perwerdehiyê de. Ev daxwaz û têkoşîna ji bo vê daxwazê hêj jî bi awayekî çalak didome tevî hemû zehmetî, zordarî û qedexeyên di van çend salên dawî de diqewimin piştî têkçûna hevdiîtinên di navbera Tevgera Kurd û Dewleta Tirkîyeyê de ji bo çareserkirina kêşeya kurd. Ev jî nîşan dide ku bikaranîna kurdî wek zimanê perwerdehiyê çiqas girîng e ji bo kurdan.

Helbet, cureyên perwerdehiya bi zimanê dayikê li welatên cuda xweyî paşxane û sepandinên cuda ye. Lewma jî wate û rêbazên cuda yên perwerdehiya bi zimanê dayikê hene. Heta mirov nikare bêje ku di konteksta Kurdistan û Tirkîyeyê de nîqaşên li ser vê mijarê zelal û hevber in. Berevajî, mirov dibîne ku fikr û ramanên cuda, gelek caran jî nehevger, hene di vê qadê de. Bi armanca xurtkirina nîqaşan û piştgiriya hewl û têkoşînên pîralî ji bo piştewaniya perwerdehiya bi zimanê dayikê, Enstîtuya Diyarbekirê bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DISA) projeyek bi navê *Berî Her Tiştê Zimanê Dayikê* pêk anî bi alîkariya aborî ya Balyozxaneya Holandê li Tirkîyeyê. Di nav çarçoveya projeyê de, di navbera 2010 û 2012'an de sê heb komxebat bi mamoste, lêkolîner, berpisiyarên komeleyên ziman û perwerdehî û zimannasan re hatin çêkirin. Beşdaran wext û fikr û ezmûneyên xwe yên hêja parve kirine û gelek mijarên eleqedar zelal kirin. Paşî jî, nivîskarê vê gotarê, xebat û lêkolînên li ser modelên perwerdehiya pîrzimanî, zimanê dayikê an jî duzimanî bi awayekî berfireh û rexneyî tehlîl kir da ku navbera encamên komxebatan û nîqaş û lêkolînên mînakên cihanî de lihevhatinek çêbe da ku modelên ji bo perwerdehiya zarokên kurd li Kurdistan û Tirkîyeyê werin amadekirin. Encamê de raporek (Derince, 2012) berfireh derket.

Rapor ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de, ji xeynî peyde û çavderiyên xebata *Kula Ziman*¹⁴, kurtedîroka polîtîkayên zimên û perwerdehiyê li Tirkîyeyê, kêşeyên zarokên kurd ji ber ku kurdî di perwerdehiyê de nayê bikaranîn, nêzîktêdayînên derbarê bikaranîna zimanê dayikê di perwerdehiyê de û rewşa heterojen a xwendekarên kurd wek mijar cih digrin. Di beşa duyem de, pergalên perwerdehiyê û modelên zimên ku li tevahiya dinyayê tîr bikaranîn, nêzîktêdayînên cuda yê xwende-nivîsendetiyê, mamoste-gihandin divê çawa be ji aliyê cudahiyan zimanî û kulturî ve, hewcedariya mudaxilbûna dê û bavan di feraseta perwerdehiya pîrzimanî de û dawiyê palpiştên zanistî yê perwerdehiya pîrzimanî li ser bingehê zimanê dayikê hatine nîqaşkirin. Di beşa dawî de jî, li hemberî cudagerî û newekheviyên heyî, modelên perwerdehiyê yê li ser bingehê zimanê dayikê ku bikarin bîr bikaranîn wek parçeyekî bihêzkirina kurdan bi giştî û bi taybetî jî xwendekarên kurd, cih digrin. Di vê beşê de li dû her yek ji modelên hatî pêşniyarkirin, di kîjan polan de rastûrêkirinên bi çî awayî divê bîr kirin jî hatiye ravekirin. Her wiha tê destnîşankirin ku bi riya van modelan veguherîneke çawa dikare bê pêkanîn jî.

Di vê gotarê de, ev rapora behslêhatî û modelên tê de hatine pêşkêşkirin tîr nîqaşkirin. Lê belê, beriya nîqaşa modelên perwerdehiya li ser bingeha zimanê dayikê, divê çend tîbînî werin parvekirin derbarê hinek peyv û termên tîr bikaranîn de.

Termînolojî û Çend tîbînî

Berî her tiştî divê bê diyarkirin ku di vê xebatê de heta berevajîya wê bi eşkereyî neyê destnîşankirin gava hat gotin “xwendekarên kurd” behsa hemû xwendekarên kurmanc û zaza/kurmanc tê kirin, gava hat gotin “kurdî” jî behsa her du zaravayên kurmancî û zazakî/dimilkî/kirmanckî an jî zimanan tê kirin.¹⁵ Gava hat gotin “kurmancî” behsa zaravayê ku kurdên kurmanc wî bi kar tînin, tê kirin. Tenê gava hat gotin “zazakî”, behsa wan hemû binavkirinên wek dimilkî, kirmanckî an jî zazakî tê kirin. Li ser vê mijarê ji ber ku ji aliyê raya giştî ve bi awayekî berbelav “zazakî” tê bikaranîn, di vir de bêhtir binavkirina “zazakî” hatiye hîlbijartin. Yan na, em dixwazin diyar bikin ku em agahdar in ji beyana dewletê û qayîşkêşanên siyasî yê li derdorên cuda tîr meşandin li ser vê mijarê û em ne aliyekî vê yeke ne. Li ser vê

¹⁴ Coşkun, Vahap; Derince, M. Şerif û Uçarlar, Nesrin (2010), *Kula Ziman: Kêşeya Bikarneanîna Zimanê Zikmakî di Perwerdeyê de û Serhatiyên Xwendekarên Kurd li Tirkîyeyê*. DİSA, Diyarbakır. Ji bo bîdestxistina vê xebatê binêrin: <http://www.disa.org.tr/files/images/kulaziman.pdf>

¹⁵ Li ser vê mijarê nîqaşeke berfirehtir, di beşê 1.16. ê raporê de cih digre.

mijarê wek prensîb divê bîr û boçûn û helwesta mirovên ku wek zimanê yekem bi zazakî diaxivin bingehe bê girtin, bihevrebûna hevpar a kulturî, civakî û dîrokî ya kurmanc û zazayan li qelem bê xistin. Her wiha wek di beşên pêştir ên vê xebatê de hatî destnîşankirin, divê bê diyarkirin ku ev qayîşkêşan û nîqaş ji aliyê sepandinên perwerdehiyê ve jî belesebeb in heta radeyekê.

Xaleke din a girîng jî ew e ku modelên di vê raporê de hatî pêşniyarkirin doza ku tekane modela rast e nake û piştî rapor bi halê xwe yê dawî hate weşandin jî bi her cure pêşniyar, rexne û bîr û boçûnê dikare bê bipêşxistin. Dîsa bi heman awayî pêkan e ku mirov zimanên din jî têxe şûna wan zimanên biyanî yên di modelan de hatî pêşkêşkirin. Bi gotineke din, di van modelan de wek zimanê sêyem îngilîzî tê pêşniyarkirin, lê belê helbet li şûna îngilîzî dikare zimanekî din jî bê hilibjartin û dor û awayên fêrbûna van zimanan jî dikare cudatir be. Mijara girîng ew e ku bal bê dayîn bo pêşxistina pîrzimaniyê.

Her wiha, divê bi eşkereyî bê gotin ku mebesta vê raporê ne ev e ku analîzên dûr û direjî bike derheqê mijarên perwerdehî û zimanê dayikê de, berevajî armanc ev e ku xal û mijarên nebe nabe dest nîşan bike di nîqaşên ser perwerdehiya xwendekarên kurd de û modelên perwerdehiyê yên bi feraseta perwerdehiya pîrzimanî ya li ser bingehe zimanê dayikê de werin amadekirin de. Ji ber du sedeman ev cure rê girîng e. Ya yekê, hêj têra xwe xebatên saxlem û pêbawer kirî yên bi lêkolînên qadî hatine kirin derneketine û beyî ku ev xebat bîr kirin ne rast e ku analîzên hûrgilî werin kirin. Ya duwem, ev rapor ne tenê ji bo bisporên derheqê van mijaran de dixebitin, zêdetir ji bo cemeateke berfireh ji mamosteyan bigirin heta xwendekaran, ji malbatan heta bisporên bernameyên perwerdehiyê amade dikin hatiye nivîsandin.

Derbarê termînolojiyê de jî divê çend daxuyaniyên girîng bîr kirin. Serê pêşî sedema ku di vê raporê de li şûna bêjeyên “bi Zimanê Yekemîn” an jî “di Zimanê Dayikê de” tê gotin “Li Ser Bingehe Zimanê Dayikê” ew e ku bikaranînen berê bi awayekî berbelav ligel yekzimaniyê tîr pêwendîdarkirin û rîska sergirtina potansiyela pîrzimaniyê li xwe digrin. Ji aliyê din ve sedema ku tenê nayê gotin “pîrzimanî” ew e ku hem zimanên navborî tev bi awayekî tevahîspêr wekhevane nake û girîngiya zimanê dayikê têra xwe dupat nake û hem jî bêjeya “zimanê dayikê” xwedî raboriyeke dîvdirêj a têkoşîna polîtîk e ku divê neyê jibîrkin.

Dîsa peyva “pirziman” ku me bikaranîna wê pêşniyar kirî, ji ber wê yekê ye ku rewş û sepanînên zimanî yên rojane –bi taybetî yên kurdan- yên piraniya gelên cîhanê baştir eşkere dîke û sepanîna zimanî ya esas pêdivî pê heyî pirzimanî bi xwe ye. Bi bikaranîna têgîna pirzimanîyê tiştên ku em dixwazin bal û dêhn bikêşin ser ev e ku tevahiya modelên perwerdehiyê ya me di vê xebattê de pêşniyarkirî, wek encam armanca pêşxistina pirzimanîyê dipejirînin.

Wekî din jî, du sedemên bingehîn ên bikaranîna peyva “pirzarava” hene. Ya yekem bi modelên tîpîkî pêşniyarkirin armanca ew e ku zarokên zimanê wan ê dayikê kurmancî ye hem di kurmancî de hem jî di zazakî de; zarokên zimanê wan ê dayikê zazakî ye hem di zazakî de hem jî kurmancî de bibin xwedî besatî. Ya duwem jî bal dikêşe ser vê yekê ku di devokên cuda yên kurmancî an jî zazakî de be jî, bi bikaranîna elîfbayeke hevpar, dikare perwerdehî bê kirin.

Dîsa bi heman awayî peyva “dînamîk” jî ji ber du sedemên hatiye hilbijartin. Ya yekem, modelên perwerdehiyê yên di vê raporê de hatî pêşniyarkirin, dihesibîne ku di navbera zimanên dixwaze wan bi pêş bixe de –palpişt bi nêzîktêdayîna pirşayanî ya di raporê de bi hûrdekarî hatî eşkerekirin- tîkiliyêke dînamîk heye. Li gorî vê, besatiya kesên pirziman a di her yek ji van zimanan de, ji zimanê kesên yekziman cudatir e, ji loma jî kesekî pirziman ne tenê ew kes e ku di mejiyê xwe de çend zimanan li ba hev dihewîne, lê ew kes e ku derfet heye bikare van zimanan bi awayekî hev xwedî bike bi kar bîne û bi vî awayî çav bi yekzimanan bikare xwe bi awayên cuda îfade bike. Her wiha, ev têgîn, pêwendîdar ligel vê yekê bal dikêşe ser vê yekê ku pirzimanî qonaxek e û her tim di nav guherîn û pêşveçûnê de ye. Ya duwem jî ev modelên di vir de hatî pêşniyarkirin, doza wê yekê nakin ku bi halên xwe yên hatî pêşniyarkirin bimînin. Wê yekê ji xwe re dîke armanca ku li ser her ku hat bikaranîn hewcedariya şert û merc û pêdiviyên tîpîkî guhertin, divê her cure modela perwerdehiyê bi berdewamî xwe nû bike. Bi gotinek din, gava ev modelên perwerdehiyê an jî yên wek wan hatin pejirandin û dest bi sepanîna wan hat kirin, divê bi berdewamî ji nû ve di ber çavan re bî derbaskirin û li gorî pêdiviyên xwendekar-mamosteyan ên diguherin divê di bernameyên perwerdehiyê de jî guhertin bî kirin.

Bikaranîna Zimanê Dayikê di Perwerdehiyê û Modelên Berbelav

Derheqê mijara perwerdeya duzimanî an jî ya pirzimanî de, mirov dikare behsa qederek modelan bike ku bi navên cuda cuda tîpîkî zana. Hinek van modelan de, zimanê dayikê tenê di dema derbasbûna perwerdeya bi zimanê duyem de tê bikaranîn (modela derbaskirinê); hinekan de jî

mebest ev e ku zimanê nû bê hînbûn, derûdoreke pirzimanî geş bibe û bê parastin bi handan û arîkariya zimanê dayikê (modela parastin û domandinê). Bi giştî modelên wek derbaskirinê zêdetir hewl didin ku bi navê entegrasyonê xwejbîrîkirin (asîmilasyon) pêk were; yê wê wek parastin û domandinê jî didin ber xwe ku pirzimanîyeke tekmîl geş bibe. Derheqê sepandin û encamên van modelan de, lêkolînên curbecur hatine birêvebirin li qederek herêmên seranserê cîhanê. Van lêkolînan cih çêkirine ku em armanc û rojevên veşartî yê wê modelên perwerdeya ziman baştir fehm bikin û her wiha tê bigehin ka ev model li ser kîjan bawerî û qebûlên sebare hînbûn û hînkirina zimanan hatine duristkirin (Benson, 2009). Wekî din, bi saya wan modelan, encamên ku hatine armanckirin rontir û zelaltir bûne. Bo nimûne, perwerdeya bi zimanê serdest her wext rû nedaye ku ev zimanê serdest baştir bê hînbûn; bi heman şiklê her modela bi navê perwerdeya duzimanî bi rastî jî duzimanîyek pêk neaniye. Ji rexeke din ve, senifandina modelên perwerdeya ziman ên curbecur ku seranserê cîhanê tîk bikaranîn nîşan dane ku perwerdeya ziman de tenê yekî rast an jî xelet tune; beravajî vê yekê modelên curbecur dibin tixmetixm li gor taybetî û rastiyên herêman. Li jêr hinek modelên ku berbelav in li gelek welatan hatine rêzkirin û şîrovekirin bi kurtî.

Modelên Tîk Bikaranîn di Perwerdehiya Ziman de¹⁶

Modela yekzimanîkirinê/xeniqandinê: Ev modela ku bi inglîzî wek “submersion” tê binavkirin, Tirkiye jî nav de, di gelek welatên ku mufredatên xwe li gor prensîb û pratîkên tesîra wan herî xeternak ji aliyên ziman û perwerdeyê de tîk sepandin. Di vê modela ku ast û kalîteya perwerdeyê wê gelek kêmtir e, tenê bi zimanê serdest perwerde didin. Ji bilî zimanê serdest, zimanên din ên wî welatî tîk piştguhkirin, tenê zimanên xweyî prestîj ên Rojava wek zimanê duyem tîk hînkirin. Wê encama vê modelê, li cihên ku zimanê dayikê nikare bê parastin ji ber sedemên curbecur, gelên xweyî zimanên bindest gelek zehmetiyan dikêşin di raguhastina zimanên xwe de û bi vî rengî hingî diçe yekzimanîyek rû dide di zimanê serdest de. Bi gotineke din, zimanê dayikê tê xeniqandin. Sedema esas a wundabûna zimanên ji xeynî tirkî ji destpêka dîroka Komara Tirkiyeyê heta niha ev yek e.

¹⁶ Nîqaşên di vê beşê de zêdetir ji van çavkaniyan sîd wergirtiye: Baker, Colin (2006), *Foundations of Bilingual Education and Bilingualism*, 4.çap, Clevedon, UK: Multilingual Matters.; Benson, Carol (2009), ‘Designing effective schooling in multilingual contexts: going beyond bilingual “models”’. ‘Nav *Social Justice through Multilingual Education*, (ber.) Mohanty, Ajit, Minati Panda, Robert Phillipson û Tove Skutnabb-Kangas. Multilingual Matters., û ya dawî Skutnabb-Kangas, Tove (1984) *Bilingualism or Not: The Education of Minorities*. Clevedon, UK: Multilingual Matters. Ji rexê tesnîfê ve, gotara Carol Benson (2009) jî nav van de bûye mînak.

Modela derbaskirinê: Ev model zêdetir li cihên ku xwendekarên ji malbatên bindest û kêmbûnê perwerde digirin tê bikaranîn ku li van deran rêjeya dewamkirina dibistanê û serketina di dersan de gelek kêmbûn e nav xwendekaran de. Bi bikaranîna vê modelê armanc ev e ku xwendekar bikarin zûtir û rihettir derbasî xwendin-nivîsandinê bibin û dewamkirina dibistanê zêdetir bibin. Di vê modelê de, xwendekar di destpêka dibistanê de yek-du salan bi zimanê xwe yê dayikê perwerde digirin, lê piştî wê bi lez û bez, beyî ku rolekê bidin zimanê dayikê, xwendekar mecbûrî derbasî perwerdeya bi zimanê duyem, yanî zimanê serdest, dibin. Mînakê herî navdar li cîhanê rewşa zarokên ji malbatên Latîn (Hîspanîk) ên li Amerîkayê ne ku ewil bi îspanyolî dest bi xwendin-nivîsandinê dikin û piştî yek-du salan derbasî perwerdeya bi tenê inglîzî dibin. Li gor piraniya lêkolîner û bisporan, sereke armancê vê modelê ev e ku xwejbîrîkirin (asîmîlasyon) leztir çêbe bin navê entegrasyonê de; lewma derbasbûna xwendin-nivîsandinê hêsantir jî be li gor modela ku yekser bi zimanê serdest dest bi perwerdeyê dike, newekhevî û cudakariyên di nav perwerdeyê de nayên xelaskirin, hînbûn û parastina zimanê dayikê çak pêk nayê; her wiha zehmetî û kêşe dewam dikin di hînbûna zimanê duyem de jî (Wayne û Collier, 1997).

Modela Parastin-domandinê: Di vê modela ku ji bo perwerdeya xwendekarên ji zimanên bindest tê bikaranîn de, herî kêmbûnê ji 6 heta 8 sala perwerdeyê ser esasê zimanê dayikê an jî yeke pirzimanî tê danan, zimanê(n) serdest hêdî hêdî dibe perçeyekê perwerdeyê û piştî demekê dibe zimanê hînkirina hinek dersan. Taybetî li Efrîqeya Başûr, Bolîvya, hinek herêmên Hîndîstanê û Etiyopya'yê mînakên serketî ên vê modelê hene. Hin dibistanên li Welatê Baskê (Coşkun et. al., 2010) û Katalunyayê jî dibin nimûneyên vê modelê. Lêkolîn û amar (îstatîstîk) nîşan didin ku dibistanên bi vê modelê perwerdeyê didin encamên gelek muspet û serketîtir didin bi qiyasî modela derbaskirinê (Benson, 2009; 68).

Yek ji modelên parastinê jî modela programên perwerdehiya pirziman a pileदार e ku Malone (2010) pêşniyar kiribû ye. Di bernameyên wiha de xwendekar ji bo xwende-nivîsendetiyê bi zimanê herî baş dizanin û herî pir bi kar tînin, yanî li dibistanên ku bi zimanê wan ê dayikê perwerdehiyê didin dest pê dikin. Piştî di zimanên dudu û sisiyan de ewil hunerweriya guhdarî kirin û axaftinê, piştî van jî hunerweriya xwendin û nivîsandinê li awayekî pileदार tînin fêrkirin. Bi saya vê yekê xwendekar bi zimanên xwe yê dudu û sisiyan dikarin tîkiliyên rojane bidomînin, ji alî din jî ji bo fêrbûna zanyarên razber û akademîk bi xwe-bawerî dikarin van zimanan bi kar bînin. Bi wê şiklî hem zimanên zarokan ên dayikê û hem jî zimanên nû tînin fêrbûn.

Modela duzimanîkirinê/herikandinê: Ev modela ku bi ingilîzî wek “submersion” tê binavkirin, zêdetir wek perwerdeya bo zarokên ji malbatên çîna navîn, yanî yên dewlemend, tînan zanîn. Di vê modela ku hem ji aliyê qelîteya perwerdê hem jî ji aliyê geşbûna pirzimanîyê encamên gelek serketî didin, hem zimanê xwendekaran hem jî ya ku dixwazin hîna wan bikin xweyî prestîj û statûyeke bilind in û piranî piştgîriyeke xurt digirin ji civakê. Xwendekar ne bi zimanê xwe yî dayikê, lê bi zimanekî duyem dest bi perwerdeyê dikin; lê belê mamoste her du zimanan jî baş dizanin û gelek qîmet û rêzê didin zimanê xwendekaran ê dayikê. Mînakên herî navdeng yênan vê modelê, bernameyên duzimanîkirinê ne di frensî û ingilîzî de li Qenedayê. Lê belê, heke modeleke bi vî rengî li herêmeke bê bikaranîn ku ji aliyê aborî destnexweş, ango feqîr, û cihên ku cudahiyan girîng ên statû û prestîjê hebin navbeyna zimanan de, bi ihtîmaleke mezin dê encam bişibe modela xeniqandinê, yanî yekzimanîkirinê. Ji ber ku di rewşeke wisa de zimanê ku ji mêj ve hemberî pêkutiyên maye, yanî zimanê zarokan ê dayikê, piranî hem ji aliyê mamosteyan hem jî ji aliyê mufredatê tînan piştguhkirin û ev ziman hingî diçe ber bi wundabûnê diherike. Bi vî şiklî di pratîkê de modela ku me wek yekzimanîkirinê-xeniqandinê binavkiribû tê sepandin.

Modela du-berî: Ev model hem ji aliyê pêşveçûna akademîk hem jî ji aliyê duzimanîyê ve encamên gelek baş dide. Li dibistanên ku bi vê modelê perwerde didin, xwendekarên xweyî zimanekî kêmîneyî û yênan ji zimanên serdest bi hev re di heman sinifan de beşdarî dersan dibin; perwerde li gor pêdivî û taybetiyên xwendekaran, piranî nîvenîv bi her du zimanan tê sepandin; lê belê heke zimanê kêmîneyî di salên derbasbûyî de hatibe bêquwetkirin û armanc ev be ku dîsa bê bihêzkirin, zêdetir giranî didin zimanê kêmîneyî û dibe ku perwerde heta rêjeya %90 bi zimanê kêmîneyî be. Ji ber ku zimanê serdest jixwe xweyî prestîj e û li derveyî dibistanê têra xwe piştgirî digire, ti rêyek din tine ku neyê hînbûn an jî kêm bê hînbûn. Li gor lêkolîner û bisporan dibistanên ku heta rêjeya %90 ser esasê zimanê dayikê perwerde dide dibin wek modela parastin-domandinê ji bo xwendekarên ji zimanên bindest; her wiha ji bo xwendekarên ji zimanê serdest jî rê çêdike bo duzimanîkirineke rêk û pêk. Di astengiya herî girîng di vê modelê de ev e ku xwendekarên ji zimanên serdest zêde ji dil nabin ku beşdarî van dibistanan bibin. Taybetî li gewrebajaran (metropol) sepandina wan zehmettir e, bes mînak hene ku li bajarên piçûktir û navçeyên ku tîkiliyan rojane û yênan danûstendînan bi gelek zimanan tînan danan, modelên bi vî şiklî bînan birêkxistin û encamên serketî derxînin. Bo nimûne, li Amerîkayê di hin dibistanan de,

zarokên ku zimanê wan ê dayikê îspanyolî ye ders digirin ligel zarokên inglizî-axêv ji mamosteyên duzimanî, û her du ziman jî bi rihetî tèn bikaranîn.

Helbet nabe ku yek ji van modelên jorê hatine îzahkirin bi rihetî û hêsanî bê hîlbijartin û li herêmeke bê bikaranîn beyî ku bi berfirehî li ser nîqaş bèn kirin. Bi heman şiklî, ne mecbûrî ye ku tenê yek ji van modelan bê bikaranîn. Bereqs, mirov dikare bêje di heman herême de modelên ji hev cuda divê bèn birêkxistin. Lê ya mûhîm ev ku divê perwerde bi giştî ligel hemû şîrîkên wê ji aliyên zimanî, civakî-aborî û lojîstîkî (wek mamoste û çavkaniyên materyalî) baş bê zanîn û bernameyên perwerdeyê li gor vana bèn duristkirin. Ji rexê din, wexta modeleke perwerdeyê li herêmekê bê bikaranîn, nayê vê maneyê ku divê ev model heta hetayê wisa dewam bike. Li gor pêdiviyên û guherînên dû re derdikevin guherîn û lêanîn her gav mimkun in û heta dikarin yekcar vê modelê betal bikin û yeke din durist bikin an jî derbasî yeke din bibin.

2.32. Pirsgirêkên Derheqê Modelên Perwerdehiya Ziman¹⁷

Wekî ku gelek lêkolîn bi rengekî ron û zelal nîşan didin, modelên mîna yekzîmanîkirin/xeniqandinê û yên derbaskirinê hem di maweya kurt û hem jî ya dirêj de pirsgirêkên zimanî û civakî derdixin. Bikaranîna modelên wisa li ber bicihkirina wekhevîyê û xelaskirina zerar û ziyanan di perwerdehiyê de astengiyên mezin pêk tînin.

Lê dîsa jî divê mirov bibêje ku modelên li jorê hatin îzahkirin ji hinek kêmasî û pirsgirêkan rizgar nînin. Her çiqas hin zêdeyên hinekî ji van modelan hebin jî, wexta politikayên perwerdehiyê duzimanî wek regez (prensîp) bèn qebûl kirin jî, pirsgirêka esil sepandina van regezan e. Her yek ji van modelan di nav xwe de dibin cure cure û her wiha pratîkên cuda rê didin ku li herêmên cuda encamên cuda derkevin di bikaranîna heman modelê de. Wekî din, modeleke ku li gor taybetî û pêdiviyên herêmekê hatiye duristkirin dibe ku li herêmeke ku xweyî heman armancan e encamên cuda bide. Pirsgirêkeke din jî ev e ku wexta ev model bèn duristkirin û sepandin, wisa tê ferzkirin ku xwendekar tenê yekzimanî ne, bi gotineke din an tenê zimanê xwe yê dayikê xeber didin an jî zimanê serdest. Lewma nayê dîtîn û fehmkirin ku ev xwendekar gelek caran rastî gelek zimanan tèn di jiyânê xwe yên rojane de. Bes, zêdebûn û lezbûna rê û rêçikên danûstendin û çûnhatinê taybetî van salên dumahîkê de, rewşeke ji her wextê durehtir (hîbrîd) derxistiye ji kinarên zimanî û nasnameyî ve. Mirov nikare bibêje ku ev

¹⁷ Ji bo nîqaşeke berfirehtir a vê mijarê binêrin Benson, *Designing effective schooling*, r.70-76.

model dikarin bibin bersiv ji bo durehiyeke vî rengî. Li Tirkiyeyê, piraniya xwendekarên ku zianê wan ê dayikê ne tirkî ye jixwe zimanê xwe yê dayikê, tirkî wek zimanê duyem û li hin herêman jî zimanekî sêyem an çarem bikar tînin di jiyana rojane de berî ku dest bi dibistanê bikin. Bo nimûne, gelek zarokên ku zimanê wan ê dayikê kirmanckî/zazakî ye an jî zarokên erebî-axêv ên li şehrên Kurdistanê dijîn herî kêm sê zimanan seh dikin û dikarin van bikarbînin ji bo pêdiviyên xwe yên cuda cuda berî ku gav biavêjin dibistanê. Bi heman şiklî, gelek zarokên ji Mêrdînê ku zimanê wan ê dayikê erebî ye, berî ku dest bi dibistanê bikin zimanên wekî erebî, kurmancî, tirkî û sûryanî, heta ji ber geşbûna turîzmê zimanê ingilîzî seh dikin û van zimanan li gorî pêdiviyên xwe bikartînin ku ew jî rewşeke wisa derdixe ku Garcia (2009) jê re dibêje axaftina navzimanî (translanguaging).

Ji rexê din, modelên ku dê bînan bikaranînin di merhaleyên cuda yên perwerdehiya ziman de divê hevaheng bin li gel ezmûnên ku dê piştî her merhaleyê ferz be li ser xwendekaran. Wexta hemû perwerdehiya seretayî (ji 6 heta 8 salên destpêkê) hemû bi zimanê dayikê were birêkxistin û wan salan de pêşveçûn û serketinên girîng bînan bidestxistin jî, heke dibistanên ku piştî wan salan tenê bi zimanê serdest perwerdehiyê bidin an jî heke ezmûnên navendî yên ku sertesarê (hemû derê) wî welatî tenê bi zimanê serdest bînan birêvebirin, dê û bavên bi zimanên kêmnîneyî diaxivin, dê ihtimaleke zêde zarokên xwe neşînin dibistanên pirzimanî ên ku ser esasa zimanê dayikê perwerdehiyê didin. Jixwe birêvebirina ezmûnên navendî têra xwe pirsgirêkan derdixe, lê wexta ezmûnên navendî mecbûrî bin jî, vêga lazim e ev ezmûn pirzimanî bînan amadekirin.

Ji ber van pirsgirêkan, piraniya modelên perwerdehiya ziman li gelek welatan bi gelek xeletiyên tînan sepandin; ihtimala wan a serketinê neçûye ser ji ber kêmasiyên din; û her wiha ji bo berjevendiyan siyasî hatine pêlîstin.

Lewma ji xeynî nîqaşên li ser modelên cuda cuda yên perwerdehiya ziman, divê qaîdeyên hînbûn û hînkirina zimanan baştir bînan îzahkirin û belavkirin ji bo ku çêtir bînan fehmkirin ji aliyê kesên wek mamoste, dê û bav, bisporên mufredatên perwerdehiyê û xwendekaran ku pêwendîdarê vê meselê ne. Bi saya hewl û cehdeke wisa şert û mercên her xelkê li her herêmekê dê baştir bînan zanîn; armancên ku divê bînan bidestxistin û rê û rêçikên bidestxistina van armancan dê çêtir bînan destnîşankirin. Hinek xebatên ku divê di vê wextê de bînan birêvebirin ev in (Malone, 2010):

- Tespîtkirina qebiliyetên zimanî yên zarekî û nivîskî yên xwendekar, dê û bav û mamosteyan,
- Lêkolîna seh û meylên derheqê zimanan de bi awayekî berfirehî,
- Bilindkirina hişmendiyeke derheqê hînbûn û hînkirina zimanan de
- Tespîtkirina daxwazên civakî û takekesî bi beşdarên ji her rengî
- Çespandina armancên perwerdehiyî û zimanî
- Nirxandineke ron û zelal a çavkaniyên heyî yên kes, materyal û pereyî
- Tespîtkirina gavên ku dê bîn avêtin di demeke nêz, navîn û dirêj de ji bo ku armancên destnîşankirî bîn bidestxistin,
- Amadekirina modelan ji bo ku armancên destnîşankirî bîn bidestxistin bi şerta tim bîn çavderîkirin û rastkirin,
- Sepandina qedemeyên plankirineke çerxî (tr:döngüsel, in:cyclical), tetbîqeke ceribandîne, nirxandin, pîvandî û tehlîlkirinê.

Tenê piştî ev gav bîn avêtin mirov dikare modelên cuda yên perwerdehiya ziman amade bikin ku ev model bikarin bibin bersiv ji bo pêdiviyên curbecur.

Pirzimanî û Pirşayanî wek Qonaxeke Dînamîk li Dijî Yekzimanîyê

Li piraniya welatên cîhanê, di derdorên zimanzaniya raser (serdest) de yekzimanî wek pîver (norm) tê girtin, di dema lêkolînan de metodên lêkolînan û alavên berhevkirina daneyan li gor vê pîverê tên duristkirin. Bi vî şiklî jî zimanên kesên pirziman ku jiyanên xwe yê rojane de zimanên xwe bo armancên cur bi cur bikartînin wek xweser û ji hev cuda tên nirxandin. Lê ya rastî, hema bêjin her derê dinyayê insan ji bo pêdivî û danûstendînan xwe yên rojane tuşî yekî zêdetir zimanan tên û van bikartînin. Li tu deverê cîhanê tenê yek ziman tune. Serde jî ligel giloverbûna (globalbûna) têkiliyên civakî têkiliyên zimanan ji her wextî zêdetir û leztir bûye. Ev yek jî dinyayê ji her wextî zêdetir dike pirzimanî.

Di derheqê vê mijarê de nêrîna (perspektîfa) “pirşayanîti” ya ku zimanzan Cook (1995; 2006) pêşniyar dike gelek kêrhatî ye. Pirşayanîti, bi maneya xwe ya fireh, wek “hebûna zêdetirî yek

zimanî di mejiyê de” tê pênasekirin. Bi vî rengî, zimanên kesek pirzimanî ne zimanên wekî ku rex hev in, lê wekî rewşa pirşayanîtiya tevayî pêktîne tê dîtin. Lewma, pirzimanî tenê ji zimanê yekem û yê duyem ê kesekê/î ne, ji hemû erkên mejiyê pêk tê. Bi gotineke din, kesek pirziman ji gelek rexan ve, ji kesek yekziman cuda ye û divê pirziman bi van hemû cudahiyên xwe ve werin mitalekirin. Ev cudahî, wexta şert û mercên hewce pêk werin, gelek servedariyên (derfetên) bîrî û mejiyî dabîn dikin ji bo van pirzimanan (Baker, 2006). Her wiha, nêrîneke bi vî rengî, pirzimanîyê wek rewşeke sabît ne, lê têkiliyeke dînamîk a zimanên navbûrî ku her tim têkildarê hev dibin û nav guherîneke de ye qebûl dike.¹⁸

Bi giştî li her derê Tirkiyeyê, taybetî li Kurdistanê mirov dikare bêje ku pirzimanî û pirşayanîtiyeke berbiçav heye (Egitim-Sen, 2011). Gelek zarokên kurd, girêdayî cihê ku ji dayik dibe, derdora xwe zimanên wek kurmancî, zazakî, erebî, sûryanî û tirkî seh dikin, li dibistanan jî dersên inglîzî digrin. Ev zarok, dibe ku nekarin van hemû zimanan hîn bibin û di jiyânê xwe yê rojane de bikarbînin, lê belê bi zanîna hebûna wan mezin dibin. Lewma, divê lêkolînên derheqê zimanan de tînin kirin divê yekzimanîyê wek pîver negirin, berevajî vê pirzimanîya dînamîk qebûl bikin ku pratîka jiyânê jî jixwe ev e.

2.50. Mamoste-gihandin ji Aliyê Curbicuriya Zimanî û Kulturî ve

Mamoste-gihandin qadeke wiha ye ku welat bo welat, herêm bo herêm û heta bi kultur bo kulturê cudahiyê nîşan dide, û têkoşînên curbicur ên desthilatê her û her bi eşkereyî lê tê hîskirin. Desthilatên ku dikarin qonaxên mamoste-gihandinê kontrol bikin, di heman demê de dikarin qadên din ên perwerdehiyê jî rehetir kontrol bikin. Ji lewma têkoşînên desthilatê di her merhaleya qonaxên mamoste-gihandinê de xwe bi mirov didin hesandin. Di encama van têkoşînan de ji aliyekî ve li hin deveran ew mamoste tînin gihandin ku li ser bingeha curbicuriya kulturî û zimanî perwerdehiyê dimeşînin, ji aliyekî din ve jî li hin deveran ew curbicurî bi tevahî tê piştguhkirin û ew mamoste tînin gihandin ku pergaleke perwerdehiyê ya xwendekaran yekreng

¹⁸ Ji bo nîqaşêke berfirehtir binêrin: Herdina, Philip û Jessner, Ulrike (2002). *A Dynamic Model of Multilingualism: Perspectives of Change in Psycholinguistics*, Multilingual Matters, Clevedon. Her wiha, Cook, Vivian, (1995) “Multi- competence and Learning of Many Languages”, *Language, Culture and Curriculum*, Hejmar 8, r. 93–98. Cook, Vivian (2003), “The Changing L1 in the L2 User’s Mind”, Nav *Effects of the Second Language on the First*, (ber.) Vivian Cook. Multilingual Matters, Clevedon, r. 1-18, çavkaniyên girîng in di vê mijarê de. Her wiha binêrin Garcia, Education, multilingualism. r.140-158.

dihesibîne, pêk bînin. Celebê perwerdehiya ku berendamên mamostetiyê werdigrin, rasterast bandorê li ser têkiliyên civakî û mekanîzmayên curbicur ên desthilatê dike.

Tirkiye, digel ku welatekî pirzimanî û pirkulturî ye saziyên mamoste-gihandinê, berendamên mamostetiyê bi awayekî wiha amade dike mîna ku wê li ser zemîneke yekzimanî û yekkulturî bixebitin. Wek serencama vê yekê jî berendamên mamostetiyê, gava ji zanîngehên xwe derdiçin û dest bi wezîfeya xwe dikin tûşî zor û zehmetiyên mezin dibin.

Ji aliyekî din ve, li welatên ku pirkulturî û pirzimanî bi awayekî fermî pejirandine û bernamêyên xwe yên perwerdehiyê li gorî wê saz kirine jî yek ji mijarên ku herî zêde nîqaş li ser tê kirin mamoste-gihandin e. Lewra gihandina mamosteyan bi feraseteke perwerdehiyê ya ji aliyê pirzimanî û pirkulturî ve piralîparêz e, pêdivî bi wê heye ku hemû pêkhênerên qonaxên perwerdehiyê bi berdewamî berçavî lê bê kirin, çavkanî û materyalên tîbî bikaranîn bi awayekî rexneyî li ser bê axaftin û rêbazên tîbî meşandin her tim bîbî pirsyarkirin. Tenê bi feraseteke bi vî rengî gava mamoste-gihandin hat pêkanîn, encam wê bikare fêdeyê li pêşveçûna têkiliyên civakî yên wekhevîparêz bike.

Wek encam em dikarin bibêjin ku ji aliyê polîtîkayên perwerdehiyê ve hem di pergalên li ser bingeha yekzimanîyê de hem jî di pergalên li ser bingeha pirzimanîyê de, li serê sereketirîn diyarkerên ku bernamêyên perwerdehiyê encamên çawa bi xwe re tîne, taybetmendî, qabiliyet, ezmûnên pişeyî û zanîna pedagojîk a mamosteyan tê. Mamoste ji bo ku bikarin bibin kesên çalak ên guherînê divê bikarin vê rewşa heyî bikin meseleyî û bikarin bi awayekî rexneyî nêzîkî vê rewşê bibin. Li deverên ku polîtîkayên yekreng û bizava sereke tîbî meşandin, mamoste wek teknîsyenên pasîf erka xwe tînin cih ku zanyariya nîvengên desthilatê bo xwendekaran diguhêzin. Di vê rewşê de mamoste, wek weznedarên di wê pergalê de ne ku Paulo Freireyê pedagojê rexneyî yê navdar ew wek modela perwerdehiya bankgêr pênase kiribû. Li gorî vê, rol û erka mamoste wek çavkaniyekê ye ku bi tenê zanyariyê dide. Xwendekar di rewşeke pasîf de ye, zanyariyên ku danê werdigre û wan ji ber dike. Ne mamoste ne jî xwendekar li zanyariyê nakole, wê şirove nake û rexne nake. Lênakole ku rûdanek an heqîqetek çima û çawa wisa dibe û xwe nade ber teyîdkirina wê. Berevajî vê, perwerdehiyeke mamostetiyê ya veguherîner, dihêle ku berendamên mamostetiyê bi awayekî rexneyî nêzîkî dinyayê û têkiliyên civakî, yanî retorîkên desthilatê û şewazên jinûve afirandina bi berdewamî ya newekhevî û bêdaletiya civakî û siyasî

û aborî ya saziyên perwerdehiyê, bibe. Pir dijwar e mirov bi carekê re bibêje ku perwerdehiyeke veguherîner a bi vî rengî, çawa li bernameyeke mamoste-gihandinê were sepandin, lê belê dîsa jî derbarê xalên hevpar ên bernameyên bi vî rengî de mirov dikare van bibêje:

- Rê bê dayîn ku berendamên mamostetiyê derbarê pêwendiyên kulturî û civakî yên di nav de ne, bi awayekî rexneyî bifikirin,
- Amadekirina zemînên guncav bo xwendekaran ku da bikarin dinyayê û pêwendiyên civakî “bi dengê xwe” watedar bikin,
- Pêkanîna bîreweriya afîrandina civakeke kesên wekhev di nava xwe de dihewîne ku li dora nirxên demokratîk bi awayekî beşdar cih tê de bigrin.

(Mu)daxilbûna

dê

û

Bavan

Di gelek ferasetên perwerdehiyê yên ku ne rexnegir in, dê û bavê xwendekaran wekî perçeyek girîng ên perwerdehiyê nayên qebûl kirin. Gelek caran rola wan ew e ku zarokên xwe têr bikin, pêdiviyên wan ên dibistanê peyde bikin û ji wir zêdetir ne. Bi gotinek din, wexta pergala perwerdehiyê û perçeyên wê werin duristkirin tu kes guh nade dê û bavan û cih nadin wan ku bibin perçeyên pêvajoyên perwerdehiyê. Berevajî, ji wan tê xwestin bîat bikin. Ev rewşa dervehiştinê zêdetir berçava ne wexta dê û bavên navbûrî ji civakên bindest bin. Her wekî di beşa yekê ya vê xebatê de behs hatibû kirin, piraniya dê û bavên zarokên kurd, ji ber şiklî duristkirina pergala perwerdehiya Tirkîyê nikarin arîkarî zarokên xwe bikin di ders û sparteyên wan de, û her wiha nikarin mamosteyên wan ra jî bi awayekî watedar têkilî deynin. Bêguman yek jî esastirîn sedema vê yekê ew e ku zimanê dibistanê tenê tirkî ye.

Lewma, divê polîtîka û sepanên (pratîk) perwerdehiya pirzimanî ji serî ve dê û bavan jî mudaxilê pêvajoyê bikin, qedr û qîmeta zanîn û tecrûbeyên wan bê zanîn, divê ew jî xwedan gotin bin di biryargirtinê de. Rêya vê yekê jî ew e ku mûfredat li gor çand û kultura malbata were amadekirin. Ji gotina mûfredata li gor çand û kulturê qest ew e ku hemû perçe û pêvajoyên dibistanê li gor serborî, pêdivî û mafên beşdarên perwerdehiyê werin amadekirin. Ev yek jî tenê mîmkun e heke mûfredat li gor ziman û kulturên cihê perwerdehiyê pêk were û her cure cudagerî werin beralîkirin di hemû qadên perwerdehiyê de.

Ji rexekê din ve, divê perwerdehiyeke wisa bê duristkirin ku serboriyên dê û bavên ku ji civakên tûşî cudagerî û newekheviyan hatine jî werin guhertin. Gavên ji bo başkirina rewşa dibistanê ya xwendekaran tenê wexta dê û bavên wan jî ji guherînên hevaheng derbas bin kêrhatî dibin. Wek nimûne, gelek zehmet e ku fikr û sehên malbatan ên derheqê zimanan de biguherin li cih û deverên ku zimanê wan malbatan bo wexteke direj hatine biçûkxistin û her wiha hekê yekzimanî bûbe pîvera sereke. Lewma, di pêvajoya berbelavkirina pergaleke nû ya ser bingehê pirzimanî û pirçandîtî, divê dê û bav jî bi şikleke wek “perwerdehiya mezinan” perwerdehiyê bigrin. Divê naverok û forma perwerdehiyeke bi vî şiklî dîsa li gel beşdarên bînduristkirin û semînerên mijarên wek cudahiyan zimanî û kulturî, cudagerî û newekhevî werin dayîn.

Riyeke din a girîng bo mudaxilbûna dê û bavên di pêvajoya perwerdehiyê de, amadekirina materyalên dersê bi destê wan e. Dema ku perwerdehî dest pê bike bi zimanên taybetî wekî kurdî li derveyî perwerdehiya fermî hatine hiştin bo wextekê direj, yek jî mezintirîn astengî ew e ku materyalên nivîskî, devkî û dîtbarî ên lêhatî werin peyda kirin. Yek ji sepanên bo zimanên di vî rewşê de ev e pisporên amadekirina materyalan hinek semîneran bidin dê û bavên, û paşî bi hevra materyalan amade bikin. Bi vî rengî hem dikarin alavên guncan ji bo çand û kulturî amade bikin hem jî materyal dê li gor zarava û devokên cuda bin li gel ku dê û bav jî bibin mudaxilê vî pêvajoyê. Her wiha, mirov dikare bêje dê xwendekar zêdetir motîve bibin wexta materyalên ku ji destê dê û bavên wan derketine bikarbin. Di vî mijarê de tiştê ku divê miheqek li ber çava bê girtin jî ev e ku hingî çêbe zêde keç û jin cih bigrin di pêvajoyên biryargirtinê de. Lewra dibe ku bi vî şiklî materyalên hesas ji bo zayenda civakî werin amade kirin. Bi feraseteke wisa, dibe ku dê û bavên derveyî dibistan û perwerdehiya zarokên xwe hatine hiştin ji nû ve pêwendîdar bibin û her wiha ne tenê xwendekar, dê û bav jî bîhêzkirin.

Stûnên bingehîn ên Perwerdehiya Pirzimanî

Hinek stûnên bingehîn ên feraseta perwerdehiyeke pirzimanî hene. Ji fikr û pêşniyarên pisporên wekî Jim Cummins, Tove Skutnabb-Kangas, Colin Baker û Carol Benson, ku gelek xebat û lêkolînên wan hene di vî mijarê de, mirov dikare van stûnan wiha rêz bike:¹⁹

¹⁹ Ji bo van çavkaniyan binêrin: Baker, Colin (2011). *İkidiilli Eğitim: Anne-babalar ve Öğretmenler için Rehber*, (wer. Sezi Güvener), Heyamola Yayınları, İstanbul.; Cummins, Jim (2000), *Language, Power, and Pedagogy. Bilingual Children in the Crossfire*, Multilingual Matter, Clevedon; Skutnabb-Kangas, Tove (2000), *Linguistic Genocide in Education-or Worldwide Diversity and Human rights?* Lawrence Erlbaum Associates, Mahwah, NJ;

1- her zarok baştir fêr dibe wexta bi zimanê(n) ku baştir dizane perwerdehî bigre. Taybetî yekem sefheyên hînbûna xwendin-nivîsandinê de têgihîştina pêwendiya deng-nîşan û mane-nîşan gelek girîng e. Xwendekar gelek zûtir fêr dibin wexta peyvên ku maneyên wan dizanin. Heke ne, destpêkirina xwendin-nivîsandinên jî û hînbûna zimanê perwerdehiyê jî direng dimîne.

2- hemû kes xweyî behre ne ku bi hev re an jî dû hev gelek zimanan rihetî hîn bibin. Hemû zarok ji zayînê ve, heke astengî û nexweşiyên zayînê tunebin, xweyî zanîna zimanzanîna gerdûnî ye ku ev bingeha hemû zimana ye. Lê her ku mezin dibin, pêkerên (faktor) derdorî dikin ku ev behre bertengtir bibe. Wexta zarok tenê zimanekî seh bikin ji derdora xwe, şiyânên xwe yên ji zayînê ve tên ji bo bikaranîna zimanên din winda dikin. Lewma, wekî Cook (1995) jî dibêje, ya rastî yekzimanî rewşeke ciddî ya bêparîtiya zimanî ye. Ferasata perwerdehiyeke pirzimanî, zimanzanîna gerdûnî ya zarokan ji serî ve li ber çavan digre û hewl dide şiyân û qebiliyetên zarokan bo bikaranîna gelek zimanan di zûtirîn demê de pêk were (Chomsky, 2009). Her wiha Chomsky (1965), ji von Humboldt neql dike û fikrên xwe yên derheqê vê mijarê de wiha dibêje: “Em nikarin bi maneya xwe ya rastî zimanekî hîr bikin; tenê em dikarin wan şert û mercan pêk bînin ku ziman di mejiyê de li gor qeîdeyên xwe geş bibe.” Ji vir, mirov dikare bibêje ku divê sepên navpolî yên feraseta perwerdehiya pirzimanî li gor vê werîn duristkirin.

3- Zanîn û şiyânên berî hatine fêrbûn dikarin rihetî werin derbaskirin navbeyna zimanan de. Lewma, bi çêkirina piran di navbeyna zimanan de, zanîn û şiyânên di zimanekî de hatine fêrbûn dikarin rihetî werin derbaskirin zimanekî din. Di modelên perwerdehiya pirzimanî de, derbaskirina şiyânên zimanî û mejiyî navbeyna zimanan de bi şiklekî pergali wek perçeyekê mûfredatê tê dîtin. Bi vî rengî, piştî ku di zimanekî de xwendin-nivîsandin bê fêrbûn û yekî din de şiyânên devkî heta dereceyekê pêş ve biçin, şiyânên xwendin-nivîsandina zimanê yekê dikarin di demeke gelek kurt de derbasî zimanê duyê be û di zimanê duyê de jî xwendin-nivîsandin dest pê bike.

4- Ziman ne dijmin, lê destgirê hev in. Wexta feraseta perwerdehiya pirzimanî were qebulkirin, li ber fikra xelet a ku zimanan wekî hevrik (reqîb) û dijminê hev an jî astengî li ber geşbûna ya din dibîne radibe û di şûnê de nêrîna ku dibêje ziman balpiştên hev in belav dike. Bi vî şiklî,

pirzimanî ne wekî ku tesîreke neyînî, bereqs wek taybetiyeke ku tiştê li wan zêde dike tê qebûlkin.

5- bi saya perwerdehiya pirzimanî zimanên nû bi rihetî tîn fêrbûn. Di sepanên perwerdehiyeke pirzimanî de, wexta zimanên nû ewil wek ders li gor hin qedemeyan û ji şiyânên devkî tîn fêrbûn, xwendekar dikarin van zimanan rihettir û bi şiklekî watedar bigrin. Saya vê, fêrbûna ziman ne wekî ku derseke mecbûrî lê wek keyfekê tê dîtin. Heke ne, perwerdehiya bi zimanekî ku xwendekar pê nizanin, tenê wek jiberkirina jinek hevok û qaliphevokan dibe ku xwendekaran gelek caran wan fahm nakin.

6- xwendekarên pirziman, li gor yên yekziman serkeftûtir in di dersên xwe de. Lîteratûra navneteweyî û lekolînen bi xwendekarên kurd re hatine kirin nîşan didin ku xwendekarên ku ji yekî zêdetir zimanan dizanin zedetir xweyî avantaj in ji hinek rexan ve hem di dersên zanistên civakî hem jî yên fen û teknîkî de. Li gor lêkolînan (Cummins, 2000; Baker, 2006) xwendekarên pirzimanî, dikarin perçeyên cuda ên mejiyên xwe bikarbînin, bi şiklên cudatir nêzikê bûyer û mijaran bibin û encamên afirîner derxin holê.

Modelên Perwerdehiyê yên Dînamîk ên Pirziman û Pirzarave li ser Bingehê Zimanê Dayikê bo Perwerdehiya Xwendekarên Kurd li Tirkiyeyê²⁰

Perwerdehiyeke ku bikare rewşên pir-cudagerî û pir-newekhevî yên di beşa yekem de hatî behskirin veguherîne û bi riyên ku di beşa duwem de hatî nîqaşkirin pirîtî û cudahiyan zimanî têxe navendê û bikare bibe bersiv ji pêdivî û taybetmendiyên cuda yên -bi taybetî zarokên kurdan- bi giştî hemû komên li Tirkiyeyê re, tenê bi feraseteke perwerdehiyê ya pirzimanî û pirzaraveyî li ser bingehê zimanê dayikê mumkin e. Ji loma di vê beşa xebatê de modelên perwerdehiyê yên dînamîk ên pirziman û pirzarave li ser bingehê zimanê dayikê ku bikarin bîn bikaranîn di perwerdehiya zarokên kurd de tîn pêşkêşkin. Di beşa pêşî ya vê xebatê de hatibû ravekirin bê çima her yek ji van terman hatiye hilbijartin û armanc jê çî ye.

Ji zanyariyan heta niha hatî behskirin ger em bidin rê, di perwerdehiya xwendekarên kurd ên xwedî pêdivî û taybetmendiyên cuda de çar modelên cuda dikarin bîn bikaranîn. Ev model bi

²⁰ Ev beş, bi halê xwe yê pêşnûmayî yê pêşî bi lidarxistina panêlekê li Diyarbekirê bo kes û saziyan pêwendîdar hatiye pêşkêşkin, piştî rexne, pêşniyar û şiroveyên cuda yên hatî, hinek kêmasiyên wê hatine jêbirin û nîqaşên têra xwe ne eşkere hatine berfirehkirin.

giştî li gorî rewşa civake-zimanî ya xwendekaran di zimanên kurdî û tirkî de hatine amadekirin. Bi gotineke din di senifandina van modelan de, besatî û bikaranîna zimên a xwendekaran di zimanên kurdî û tirkî de wek bingeş hatine girtin. Model 1 li ser xwendekarên ku tenê bi kurdî dizanin an jî bêhtir bi kurdî diaxivin, Model 2 li ser xwendekarên ku ji bûna (jidayîkbûna) xwe û pê de tûşî kurdî û tirkî bûbin û bi her du zimanan jî dizanin, Model 3 û 4 li ser xwendekarên kurd ku ji ber sedemên curbicur zimanê wan ê yekem an jî serdest bûye tirkî, hatine amadekirin. Her wiha, ev model bi liberçavgirtina deverên kurd lê dijîn li sê herêmên cuda yên wek herêma kurdan, herêmên koçberiyê û herêmên rewşa wan taybet dikarin bên bikaranîn. Mebest ji herêma kurdan ew erdnîgariya Kurdistanê ye ku ji aliyê dîrokî û kulturî ve kurd bi hezaran sal ser dijîn. Herêmên koçberiyê jî, wek ku di beşa duwem a xebatê de hatî ravekirin, ew bajarên li rojavayê Tirkiyeyê yên koçberan li xwe digrin ên wek Stenbol, Enqere, Mêrsîn, Edene, Entalya, Izmîr û Bûrsa ne. Herêmên rewşa wan taybet jî, dîsa wek ku di beşa duwem de hatî behskirin, hinek herêmên bajarên wek Konya û Enqere li xwe digre ku di demên beriya Komarê de kurd hatibûn sirgûnkirin bo wan deveran.

Modelên li jêrê tên ravekirin tenê dema pêşdibistanê û dibistana seretayî vedigre. Ev dem, teqabulî wextê perwerdehiyê mecbûrî dike ku bi temamî neh sal in. Lê belê derbarê dabeşkirin an jî vesazkirina van neh salan di nav xwe de, dibe rêbazên cuda bên hilbijartin. Yanî dibe bi awayê perwerdehiya bêdabiran a neh salane jî bîr lê bê kirin, dibe di nav xwe de li çend demên cuda jî bê dabeşkirin. Ya girîng ew e ku ev wextê neh salane tev mecbûrî be û bi awayekî bêpare û bi kalîte bo hemû xwendekaran bê pêşkêşkirin. Di vê raporê de, bîr li zêdekirina zimanên cuda li modelê û çalakiyên perwerdehî-hîndekeyî ku wê bi van zimanan bên kirin, hatiye kirin û bi vî awayî hatiye hilbijartin ku model di nava xwe de di çar qonaxên cuda de bên sazkirin. Qonaxa pêşî dema pêşdibistanê ye ku wê salekê berdewam bike. Di vê qonaxê de armanc ew e ku xwendekar di zimanên ku dizanin de hunerweriyên xwe yên zimanê devkî yê bingeşin bi pêş bixin û amadeyî perwerdehiyê bên kirin. Qonaxa duwem jî sê salên pêşî yên piştî pêşdibistanê ne. Di vê demê de tê hêvîkirin ku ji bilî hunerweriyên devkî hunerweriyên xwende-nivîsendefî yên xwendekaran bên pêşxistin û zimanên nû pile bi pile fêr bibin. Qonaxa piştî vê polên 4. û 5. vedigre û tê hêvîkirin ku xwendekar di kurmancî, zazakî û tirkî de baş pê de çûbin û di îngilîzî de hatibin merhaleyê diyar. Her wiha di vê demê de dersên wiha wê bên dayîn ku hunerweriyên wan ên fikirîna razber û bidestxistina zanyariya akademîk bi pêş bixin. Qonaxa çarem û dawî jî polên 6., 7. û 8. li xwe digre; di vê qonaxê de xwendekar wê dersên cihê bi zimanên cuda

wergirin û bi tevahî wê dest bi sepandina perwerdehiya pirzimanî hatibe kirin. Di vê qonaxê de xwendekar ligel dersên zanistên civakî û fenê û yên matematîkê yên mecbûrî wê gelek dersên wek zayenda civakî, perwerdehiyê welatîbûn û demokrasîyê, zanistên xwezayê, dîroka olan, pirzimanî û pirkulturî, xwende- nivîsendetiya medyayê (çapemenî û weşanê), kultur û huner, wêje (edebiyat) û perwerdehiya zimanekî din î biyanî, hinekên wan mecbûrî, hinekên wan jî bi awayê darsa hîlbijêrî wergirin û amadeyî perwerdehiya lîseyê bîn kirin. Pir girîng e ku ev qonax hemû di bergeha perwerdehiya mecbûrî de bin û xwendekar her qonaxekê bi awayekî serkeftî kuta bikin. Ger hinek ji xwendekaran, di qonaxekê ji van de hunerweriyên ji wan tê hêvîkirin bidestbixin têra xwe nekarîbûne bi pêş bixin, divê mekanîzmayên ku kêmasiyên van xwendekaran berteref bike bîn sazîkirin û piştgiriya wan bê kirin. Ji bo vê jî pir girîng e ku derbarê pêşveçûna xwendekaran de ew rêbazên alternatîf ên pîvan û nirxandinê yên navend-xwendekar bîn pêşxistin ku ji pêş-dibistanê û pê de qonaxên pêşveçûna wan dinirxînin. Lê belê, divê hay li wê yekê bê kirin ku ev rêbazên pîvan û nirxandinê ne ji wan testan pêk bîn ku îro pir tîr bikaranîn û tenê berê xwe didin pîvana encaman. Dîsa li ser vê mijarê, bo perwerdehiya lîseyê ya wê piştî dema dibistana seretayî ya mecbûrî dest pê bike, divê ew jêrsaziya pêwîst bê amadekirin ku xwendekar ne tenê bi riya ezmûnên di zimanekî diyar de hatî standardkirin, besît û tenê armanc-encam, lê li gor eleqe û armancên xwe hîlbijartinan bikin û li xwendinê berdewam bikin.

Wek berê jî hatî behskirin beşek ji xwendekarên kurd wek zimanê dayîkê bi zaraveyê kurmançî, beşek jê jî bi zaraveyê zazakî diaxivin. Ji loma di modelên di vir de hatî pêşniyarkirin de pêwendîdar bi herêmên ku lê tîr bikaranîn wê hinek guherîn çêbibin. Bo xwendekarên ku zimanê wan ê yekem kurmançî ye, divê armanc ew be ku gava perwerdehî wek bîngê di ser vî zimanî re tê meşandin, di rewşên wek *Zaraveyê Berawirdî* de zazakî bê fêrkirin. Ji aliyê din ve bo xwendekarên ku zimanê wan ê yekem zazakî ye zimanê wê di perwerdehiyê de bêhtir bê bikaranîn zazakî ye û wek *Zaraveyê Berawirdî* jî kurmançî tê fêrkirin.

Xaleke din a girîng jî derbarê zimanê biyanî de ye ku di modelên di vir de hatî pêşniyarkirin de tê bikaranîn. Ji ber eleqeya bo îngilîzî ya hema hema li hemû deverên cîhanê û qezencên civake-aborî û akademîk ên cuda ku bi zanîna bi vî zimanî tîr bidestxistin, wek pêşîne di van modelan de îngilîzî wek zimanê sêyem hatiye pêşniyarkirin. Lê belê li şûna îngilîzî divê bibe ku zimanên

wekî erebî, farsî, ermenkî, elmanî, spanî, frensî an jî zimanekî din jî bê pêşkêşkirin. Li ser vê mijarê tercîh divê ya zarok û malbatan be.

Dawiyê divê ev yek bê destnîşankirin: di van modelan de ligel armanc wek qonax pêşveçûna pirziman e hatiye pêşbînîkirin ku zimanên nû berê bi awayê zimanê devkî, paşê jî bi awayê zimanê nivîskî bîn fêrkin. Du sedemên tercîheke wisa hene. Yekem; gava ziman di dorhêla xwe ya xwezayî de tê fêrbûn pêşî hunerweriyên devkî bi pêş dikevin û bo gelek pêdiviyên rojane wek pêşîne serî li zimanê devkî tê dayîn. Duwem; li Tirkiyeyê bi taybetî li dibistanên dewletê gava mirov ezmûneyên fêrkirina zimanê biyanî li ber çava digre, çalakiyên fêrbûna zimanê nû ku bêhtir di ser zimanê nivîskî re dest pê dike û berdewam dike, bi giştî bi şeweyê fêrbûneke mekanîk pêk tê û kesên zimanê navborî fêr dibin her çend bikarin bi vî zimanî bixwînin û binivîsin jî nikarin bi zimanê rojane biaxivin. Ji ber van sedeman di modelên ku di vir de hatî pêşniyarkirin de, bîr li wê hatiye kirin ku ziman pêşî wek devkî, piştê jî wek nivîskî bê fêrkin. Mebest ji zimanê devkî jî ew e ku xwendekar ji materyalên nivîskî wêdetir bi bikaranîna navgînên wek wêne, alav, vîdyo û dosyeyên deng fêrî zimanê rojane bibin.

Modelên Perwerdehiya Dînamîk a Pirzimanî û Pirzaraveyî li ser Bingehê Zimanê Dayikê bo Zemîneyên Cuda

Modelên li jêr tên pêşniyarkirin li ser du aliyan hatine danan. Ya yekê, rewşa heterojen a zarokên kurd li ber çava hatiye girtin. Bi gotineke din, wekî berî jî hatibû behs lê kirin, zarokên kurd xwedî taybetî û pêdiviyên cuda ne, lewma jî şûna yek modelê, ji yekê zêdetir model divê werin pêşkêşkirin ji bo perwerdehiya van zarokan, û zarok bikaribin beşdarî yek ji van modelan bibin li gor rewşên xwe. Ya duduyan, mînakên welatên cuda jî hatine hesibandin. Wexta şert û mertên dîrokî û civakî-siyasî li ber çavan bibin, mirov dibîne ku hinek bernameyên perwerdehiya pirzimanî ya ser bingeha zimanê dayikê û ferasetên rexneyî yên perwerdehiyê li herêmên cuda ji cîhanê xwedî potansiyeleke mezin e ji bo perwerdehiya zarokên kurd jî. Bi vê nêzîkbûnê, modelên li jêr hatî pêşniyarkirin, ji aliyê dirûv ve, bi berhevkirina bernameyên perwerdehiyê yên li Welatê Baskê tên sepandin (Coşkun et. al. 2010) û *Bernameyên Perwerdehiyê yên Pirziman ên Piledar* ya Malone (2010) ku li gelek welatên cîhanê tên bikaranîn û pêşniyarên berbiçav ên Benson (2005) di encama xebatên li gelek welatan kirî de derxistî holê, hatine amadekirin. Wek naverok jî pirşayaniya ji aliyê têkiliya zimanan a bi hev re ku Cook (1995) pêşniyar kirî, ji aliyê

xwende-nivîsendetiyê modela xwende- nivîsendetiyê ya rexneyî ya ku Cummins (2001) û Alma Flor (1988) pêşniyar kirî, ji aliyê feraseta giştî ya perwerdehiyê jî ferasetên Perwerdehiya Rexneyane/Veguhêr ên Freire (2010) û Cummins (2000) pêşniyar kirî, hatine pejirandin.

Wek encam mirov dikare bibêje modelên li jêr tên pêşniyarkirin hatine amadekirin hem li gor taybetî û pêdiviyên cuda ên xwendekarên kurd hem jî hevaheng li gel modelên perwerdehiya pirzimanî ya ser bingeha zimanê dayikê û ferasetên rexneyî yên perwerdehiyê ku encamên gelek erênî dane li hin welatên cîhanê.

Model 1 – Perwerdehiya Pirzimanî û Pirzaraveyî ya Piledar li ser bingehê Kurdî

Di tabloya jêr de Model 1 tê nîşandan ku dikare bê bikaranîn di perwerdehiya wan xwendekaran

Modêl 1 – Perwerdehiya Pirzimanî û Pirzaraveyî ya Piledar li ser Bingeha Kurmancî								
Pêşdibistan	Pol 1	Pol 2	Pol 3	Pol 4	Pol 5	Pol 6	Pol 7	Pol 8
Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî
						Tirkî	Tirkî	Tirkî
						Tirkî	Tirkî	Tirkî
			Tirkî	Tirkî	Tirkî	Ingilîzî Ingilîzî	Ingilîzî Ingilîzî	Ingilîzî Ingilîzî
	Tirkî	Tirkî	Ingilîzî	Ingilîzî	Ingilîzî	Zazakî	Zazakî	Zazakî
Zazakî	Zazakî	Zazakî	Zazakî	Zazakî	Zazakî			

de ku tenê bi kurdî dizanin an jî bêhtir bi kurdî diaxivin.

Dema Pêşdibistanê: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna zimanê devkî di zimanê dayikê yê xwendekar de bê pêkanîn û ger zimanê wî/wê yê yekem kurmancî be zazakî, ger zazakî be kurmancî heftiyê du rojan her rojekê saetekê bi riya lîstina lîstikan nas bike. Di vê qonaxê de ji materyalên nivîskî wêdetir dîmenbarên curbicur bo zarok tên pêşkêşkirin û bi vî awayî tê

hêvîkirin ku bi peyvên watedar ragihandinê pêk bîne. Hem di dersên kurmancî de hem di yên zazakî de bi giştî bi bikaranîna teknîkên TPR (Total Physical Response) pêşveçûna zimên tê handan. Ev teknîk, pêşbîniya wê yekê dike ku xwendekar bêhtir bi tevgeran, bi lîstikan an jî bi fermanan fêrî zimên bibin. Di vê demê de hîn tirkî an jî îngilîzî dewra xwe nedîtiye.

Dema Pola 1.: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna kurdiya devkî berdewam bike û dest bi xwendin- nivîsandina kurdî bê kirin. Zimanê perwerdehiyê bi tevahî kurdî ye. Lê belê heftiyê sê saetan wê dersên tirkî bîn dayîn û dest bi fêrkirina tirkî wek devkî bê kirin. Dersên tirkî wê yekê ji xwe re dikin armanc ku bi awayekî bingeîn tirkîya rojane bê fêrkirin. Her wiha heftiyê du rojan her rojê saetekê li dersên zaraveyê berawirdî tê berdewamkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina îngilîzî nayê kirin.

Dema Pola 2.: Di vê demê de berdewamî li pêşvebirina hunerweriyên devkî û nivîskî tê kirin. Dîsa heftiyê sê saetan dersa tirkî tê dayîn, lê vê carê hunerweriyên xwende-nivîsendetiyê yên di zimanê kurdî de hatî bidestxistin, bi teknîkên raguhastinê bo tirkî tîn guhastin. Bi vî awayî bi zimanê duwem jî xwende-nivîsendetî dest pê dike. Dawiyê, heftiyê ji her du rojan saetekê dersa zaraveyê berawirdî berdewam dike, lê vê carê fabl an jî çîrokên keleşorî bo xwendekaran tîn gotin.

Dema Pola 3.: Di vê demê de li dersên ku di pola 2. de hatî destpêkirin tê berdewamkirin. Bi bikaranîna kurdî û tirkî di dersên zaraveyê berawirdî de gotina fabl an jî çîrokên keleşorî berdewam dike. Ferqa tenê ew e ku di pola 3. de cara pêşî heftiyê sê saetan wê dest bi dayîna dersa Îngilîzî bê kirin. Armanc ji vê ew e ku hin diyalog û qalibên besît ên zimên ên rojane bi îngilîzî bê fêrkirin.

Dema Pola 4.: Di vê demê de ku qonaxa sêyem dewra xwe dibîne, cudatir ji polên berê dersên nû yên wek Zanista Fenê û Zanyariyên Civakî li mufredatê (bernameya hîndekariyê) tîn zêdekirin û bername hê bêhtir tê dewlemendkirin. Lê belê derseke mufredatê ya bi ferazî hêsan ku bi kurdî tê vegotin di heman demê de bi tirkî jî dest bi fêrkirina wê tê kirin û di ber mijarên rêziman re ku di vê dersê de tîn bikaranîn, dersa rêzimanê tirkî jî tê dayîn. Dersên li derveyî wê dîsa tenê bi kurdî wê bîn dayîn. Îngilîzî ji vê qonaxê pê de wê wek zimanê nivîskî bê fêrkirin. Di dersên zaraveyê berawirdî de jî di vê qonaxê de li şûna fabl û çîrokên keleşorî wê çîrokên nûjen bîn xwendin bo xwendekaran.

Dema Pola 5.: Di vê demê de, bernameya sala berê bi rêjeyêke zêde wê berdewam bike. Tenê jimara dersên ku pêşî bi kurdî paşê bi tirkî tên dayîn wê li duyan bîn zêdekirin û di darsa tirkî de di ber naverokên van dersên mufredatê re wê dersên rêzimanê tirkî berdewam bikin. Ji bilî van di darsa îngilîzî û dersên zaraveyê berawirdî de wê xwendina çîrokan berdewam be.

Dema Pola 6.: Di vê demê de ku qonaxa çarem dest pê dibe cudatir ji wê bernameya dema berî vê dihat şopandin, dersên mufredatê yên bi ferazî sivik ku bi tirkî tên dayîn, êdî wê tenê bi tirkî bîn dayîn. Bi gotineke din, nayê hêvîkirin ku berî niha heman ders bi kurdî jî hatibe dayîn. Di darsa *Rêzimanê Tirkî* de di ber dersên mufredatê re ku bi tirkî tên xwendin, wê fêrkirina rêziman jî berdewam be. Saetên darsa îngilîzî wê ji sêyan bo çaran bê bilindkirin. Her wiha darsa zaraveyê berawirdî jî cara pêşî di vê qonaxê de bi bikaranîna metnên nivîskî wê dest bi fêrkirina wan bê kirin.

Dema Pola 7.: Di vê demê de, li dersên dema berî vê hema bibêje bi heman awayî bê berdewamkirin. Bi awayekî cuda tenê derseke mufredatê ya bi kurdî tê xwendin, di nava heman heftiyê de wê bi îngilîzî dest bi xwendina wê bê kirin. Di darsa îngilîzî de jî di ber van mijarên mufredatê re wê darsa rêziman û bêjeyan (peyv) bê dayîn. Her wiha wê darsa zaraveyê berawirdî yê akademîk li bernameyê bê zêdekirin. Di vê dersê de hewl tê dayîn ku hunerweriyên xwendin û nivîsandinê di zaraveyê ku bi awayê berawirdî tê fêrkirin, bîn pêşxistin û tê hêvîkirin ku xwendekar tekstên akademîk ên curbicur bi vî zaraveyî bixwînin û tîndarî bo ku tekstên akademîk binvîsin. Ji bilî wê, dersên hilbijêrî li gor tercîhên xwendekaran tîndarî guhertin.

Dema Pola 8.: Di vê demê de bi tevahî li bernameya ku dema berî vê dihat şopandin, tê berdewamkirin. Tenê dersên hilbijêrî, li gor tercîhên xwendekaran tîndarî guhertin.

Model 2 – Perwerdehiya Pirzimanî û Pirzaraveyî ya Piledar bi Hevkêşiya Kurdî-Tirkî

Li tabloya jêr Model 2 tê nîşandan ku dikare bê bikaranîn di perwerdehiya wan xwendekaran de

Modêl 2 – Perwerdehiya Pirzimanî û Pirzaraveyî ya Piledar bi Hevkêşiya Kurdî-Tirkî								
Pêşdibistan	Pol 1	Pol 2	Pol 3	Pol 4	Pol 5	Pol 6	Pol 7	Pol 8
Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî
						Tirkî	Tirkî	Tirkî
Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî			
						Ingilîzî	Ingilîzî	Ingilîzî
			Ingilîzî	Ingilîzî	Ingilîzî	Zazaki	Zazaki	Zazaki
Zazaki	Zazaki	Zazaki	Zazaki	Zazaki	Zazaki			

ku hem kurdî hem tirkî dizanin.

Dema Pêşdibistanê: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna zimanê devkî di zimanên kurdî û tirkî yên xwendekar de bê pêkanîn û Zaraveyê Berawirdî heftiyê du rojan her rojekê saetekê bi riya lîstina lîstikan nas bike. Di vê qonaxê de tê hêvîkirin ku zarok ji kelûpelên nivîskî wêdetir bi riya dîmenbarên curbicur tiştên ku dibîne bi peyvên besît vebêje. Di dersên kurdî û tirkî de bi giştî bi bikaranîna teknîkên TPR (Total Physical Response) pêşveçûna zimên tê handan. Di vê demê de hîn îngilîzî dewra xwe nedîtiye.

Dema Pola 1.: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna kurdî û tirkî ya devkî ya xwendekaran berdewam bike û dest bi xwendin-nivîsandina kurdî bê kirin. Zimanê perwerdehiyê bi kurdî û tirkî ye. Lê belê di vê demê de hîn dest bi xwendina tekstên nivîskî yên tirkî nayê kirin. Her wiha her yek saetekê li dersa lîstikê ya zaraveyê berawirdî tê berdewamkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina îngilîzî nayê kirin.

Dema Pola 2.: Di vê demê de ligel berdewamî li pêşvebirina hunerweriyên devkî û nivîskî tê kirin, hunerweriyên xwende-nivîsendetiyê yên di zimanê kurdî de hatî bidestxistin, bi rêbaza berawirdkirinê bo tirkî tên guhastin. Bi vî awayî bi zimanê tirkî jî xwende-nivîsendetî dest pê

dike. Dawiyê; heftiyê ji her du rojan saetekê dersa zaraveyê berawirdî berdewam dike, lê vê carê fabl an jî çîrokên keleşorî bo xwendekaran tên gotin.

Dema Pola 3.: Di vê demê de li dersên ku di pola 2. de hatî destpêkirin tê berdewamkirin. Bi bikaranîna kurdî û tirkî ya nivîskî û devkî di dersên zaraveyê berawirdî de gotina fabl an jî çîrokên keleşorî berdewam dike. Ferq tenê ew e ku di pola 3. de cara pêşî heftiyê sê saetan wê dest bi dayîna dersa îngilîzî bê kirin. Armanç ji vê ew e ku hin diyalog û qalibên besît ên zimên ên rojane bi îngilîzî bîn fêrkin.

Dema Pola 4.: Di vê demê de ku qonaxa sêyem dewra xwe dibîne, cudatir ji polên berê dersên nû yê wek Zanista Fenê û Zanyariyên Civakî li mufredatê tên zêdekirin û bername hê bêhtir tê dewlemendkirin. Di ber tekstên ku di dersên mufredatê de tên bikaranîn re dersa rêzimanê kurdî û tirkî jî tê dayîn. Li gor tercîhên xwendekaran dersek an du dersên hîlbijêrî jî li mufredatê tên zêdekirin. Îngilîzî ji vê qonaxê pê de wê wek zimanê nivîskî bê fêrkin. Di dersên zaraveyê berawirdî de jî di vê qonaxê de li şûna fabl û çîrokên keleşorî wê çîrokên modern bîn xwendin bo xwendekaran.

Dema Pola 5.: Di vê demê de, bernameya sala berê bi rêjeyê zêde wê berdewam bike. Tenê dibe ku li gor tercîhên xwendekaran cudabûn di navbera dersên hîlbijêrî de bîn xuyakirin.

Dema Pola 6.: Di vê demê de ku qonaxa çarem dest pê dike cudatir ji polên pêştir, bi lêzêdekirina dersên nû bername wê bêhtir bê dewlemendkirin. Di ber wan tekstan re ku di dersên mufredatê de tên bikaranîn, wê dersên rêzimanê kurdî û tirkî bîn dayîn. Her wiha derseke mufredatê ya duzimanî tê xwendin wê bi îngilîzî bê xwendin û di ber vê dersê re wê dersa rêzimanê îngilîzî bê dayîn. Ligel vê, dersa zaraveyê berawirdî jî cara pêşî di vê qonaxê de bi bikaranîna tekstên nivîskî wê dest bi fêrkirina wan bê kirin. Ji bilî van li gorî tercîha xwendekaran wê du dersên din ên hîlbijêrî li bernameyê bîn zêdekirin.

Dema Pola 7.: Di vê demê de, li dersên dema berî vê hema bibêje bi heman awayî bê berdewamkirin. Bi awayekî cuda wê dersa zaraveyê berawirdî yê akademîk bê dayîn. Tenê derseke mufredatê ya bi kurdî tê xwendin, di nava heman heftiyê de wê bi îngilîzî dest bi xwendina wê bê kirin. Di dersa îngilîzî de jî di ber van mijarên mufredatê re wê dersa rêziman û bêjeyan (kelîme-peyv) bê dayîn. Di vê dersê de hewl tê dayîn ku hunerweriyên xwendin û

nivîsandinê di zaraveyê berawirdî de bê fêrkin, tê hêvîkirin ku xwendekar tekstên akademîk ên curbicur bi vî zaraveyî bixwînin û tînan handan bo ku tekstên akademîk binivîsin. Bi tenê dersên hîlbijêrî li gor tercîhên xwendekaran tînan guhertin.

Dema Pola 8.: Di vê demê de bi tevahî li bernameya ku dema berî vê dihat şopandin, tê berdewamkirin. Tenê dersên hîlbijêrî, li gor tercîhên xwendekaran tînan guhertin.

Model 3 – Perwerdehiya Pîrzimanî û Pîrzaraveyî ya Piledar li ser bîngehê Tirkî

Li tabloya jêr Model 3 tê nîşandan ku dikare bê bikaranîn di perwerdehiya wan xwendekarên

Modêl 3 – Perwerdehiya Pîrzimanî û Pîrzaraveyî ya Piledar li ser Bîngeha Tirkî								
Pêşdibistan	Pol 1	Pol 2	Pol 3	Pol 4	Pol 5	Pol 6	Pol 7	Pol 8
Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî
						Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî
						Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî
				Kurmancî	Kurmancî	Ingilîzî	Ingilîzî	Ingilîzî
			Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Ingilîzî	Ingilîzî	Ingilîzî
	Kurmancî	Kurmancî	Ingilîzî	Ingilîzî	Ingilîzî	Zazaki	Zazaki	Zazaki
Zazaki	Zazaki	Zazaki	Zazaki	Zazaki	Zazaki			

kurd de ku tenê bi tirkî dizanin an jî bêhtir bi tirkî diaxivin.

Dema Pêşdibistanê: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna zimanê devkî di zimanên kurdî û tirkî yê xwendekar de bê pêkanîn. Di vê qonaxê de tê hewldan ku ji kelûpelên nivîskî wêdetir dîmenbarên curbicur bo zarokan bînan nîşandan û bi vî awayî hunerweriyên wan ên zimanê devkî bînan pêşxistin. Bi giştî bi bikaranîna teknîkên TPR (Total Physical Response) pêşveçûna zimên tê handan. Zimanê perwerdehiyê bi awayekî bîngehî bi zimanê tirkî yê ku xwendekar herî baş pê

dizane, tê kirin, lê belê her roj saetekê fêrkariya kurdiya devkî tê kirin. Di vê demê de hîn dersên îngilîzî û zaraveyê berawirdî dewra xwe nedîtiye.

Dema Pola 1.: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna kurdî û tirkî ya devkî ya xwendekaran berdewam bike û dest bi xwendin-nivîsandina kurdî bê kirin. Zimanê perwerdehiyê bi tirkî ye. Lê belê her roj saetekê dersa kurdî tê dayîn û berdewamiya pêşveçûna kurdiya devkî tê pêkanîn. Dersên kurdî, bi awayê bingehîn wê yekê ji xwe re dîkin armanc ku kurdiya rojane bê fêrkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina îngilîzî û zaraveyê berawirdî nayê kirin.

Dema Pola 2.: Di vê demê de pêşvebirina hunerweriyên devkî û nivîskî yên zimanê tirkî berdewam dibe. Dîsa her roj saetekê dersa kurdî tê dayîn, lê belê vê carê hunerweriyên xwende-nivîsendetiyê yên di zimanê tirkî de hatî bidestxistin, bi bikaranîna teknîkên berawirdkirinê bo kurdî tên guhastin. Bi vî awayî bi zimanê duwem jî xwende-nivîsendetî dest pê dike. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina îngilîzî û zaraveyê berawirdî nayê kirin.

Dema Pola 3.: Di vê demê de li dersên ku di pola 2. de hatî fêrkirin derseke mufredatê ya bi tirkî hatî xwendin di heman demê bi kurdî tê dayîn û di ber vê dersê re dersa rêzimanê kurdî tê dayîn. Her wiha di pola 3. de cara pêşî heftiyê sê saetan wê dest bi dayîna dersa îngilîzî ya devkî bê kirin. Armanc ji vê ew e ku hin diyalog û qalibên besît ên zimên ên rojane bi îngilîzî bîn fêrkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina zaraveyê berawirdî nayê kirin.

Dema Pola 4.: Di vê demê de ku qonaxa sêyem dewra xwe dibîne, cudatir ji polên berê dersên nû yên wek Zanista Fenê û Zanyariyên Civakî li mufredatê tên zêdekirin û bername hê bêhtir tê dewlemendkirin. Ders bi giştî bi tirkî tên xwendin lê belê du dersên din ên mufredatê yên bi tirkî hatî xwendin, wê bi kurdî jî bîn xwendin. Di dersa rêzimanê kurdî de jî di ber van dersên mufredatê re wê ziman û bêje bê pêşxistin. Îngilîzî ji vê qonaxê pê de wê wek zimanê nivîskî bê fêrkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina zaraveyê berawirdî nayê kirin. Her wiha di vê demê de cara pêşî wê hinek ders bi awayê hîlbijêrî bîn dayîn.

Dema Pola 5.: Di vê demê de, demên berê bi heman awayî tên şopandin. Tenê dibe ku li gor tercihên xwendekaran cudabûn di navbera dersên hîlbijêrî de bîn xuyakirin.

Dema Pola 6.: Di vê demê de ku qonaxa çarem dest pê dike, bi lêzêdekirina gelek dersên nû yên mecbûrî û hîlbijêrî bername wê bêhtir bê dewlemendkirin. Cudatir ji bernameya di dema berê de

dihat şopandin, dersên ku hem bi tirkî hem bi kurdî dihatin dayîn êdî wê bi tenê bi kurdî bên dayîn. Nayê hêvîkirin ku tirkîya heman dersê berî niha hatibe xwendin. Di ber wan dersên mufredatê re ku di dersa rêzimanê kurdî de bi kurdî tîn xwendin, wê fêkirina rêziman berdewam bike. Her wiha dersa zaraveyê berawirdî jî cara pêşî di vê demê de wê bê dayîn.

Dema Pola 7.: Di vê demê de, li dersên dema berî vê hema bibêje bi heman awayî wê bê berdewamkirin. Bi awayekî cuda tenê derseke mufredatê ya bi tirkî tîn xwendin, di nava heman heftiyê de wê bi îngilîzî dest bi xwendina wê bê kirin. Di dersa îngilîzî de jî di ber van mijarên mufredatê re wê dersa rêziman û bêjeyan bê dayîn. Her wiha li gorî tercîha xwendekaran du dersên hilbijêrî wê bi zimanekî ji zimanên tirkî, kurdî an jî îngilîzî bên dayîn. Dersa zaraveyê berawirdî jî wek sala berê wê her berdewam be.

Dema Pola 8.: Di vê demê de bi tevahî li bernameya ku dema berî vê dihat şopandin, tîn berdewamkirin. Tenê dersên hilbijêrî, li gorî tercîhên xwendekaran tîn guhertin.

Model 4 – bernameya vejiyandinê bo xwendekarên Kurd ku zimanê wan ê yekem bûye tirkî

Li tabloya jêr, Model 4 tîn nîşandan ku bikare bê bikaranîn di perwerdehiya wan xwendekarên

Modêl 4 – Bernameya Jinûve Vejandinê bo Xwendekarên Kurd ku Zimanê Wan ê Yekem Bûye Tirkî

Pêşdibistan	Pol 1	Pol 2	Pol 3	Pol 4	Pol 5	Pol 6	Pol 7	Pol 8
Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî	Kurmancî
						Tirkî	Tirkî	Tirkî
						Tirkî	Tirkî	Tirkî
				Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî	Tirkî
			Tirkî	Tirkî	Tirkî	İngilîzî	İngilîzî	İngilîzî
	Tirkî	Tirkî	Tirkî	İngilîzî	İngilîzî			
	Tirkî	Tirkî	İngilîzî			Zazakî	Zazakî	Zazakî

kurd ku êdî zimanê wan ê yekem bûye tirkî, lê tîn xwestin kurdî jî tîn de bibin pirzimanî.

Dema Pêşdibistanê: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna zimanê devkî di zimanê kurdî yê xwendekar de bê pêkanîn. Di vê qonaxê de tê handan ku ji kelûpelên nivîskî wêdetir dîmenbarên curbicur bo zarokan bî nîşandan û bi vî awayî zarok bikarin xwe bi peyvên watedar îfade bikin. Bi giştî bi bikaranîna teknîkên TPR (Total Physical Response) piştgirî li pêşveçûna zimên tê kirin. Di vê demê de hîn dersên tirkî, îngilîzî û zaraveyê berawirdî dewra xwe nedîtiye.

Dema Pola 1.: Di vê demê de armanc ew e ku pêşveçûna kurdî ya devkî ya xwendekaran berdewam bike û bê hiştin ku xwendekar hunerweriyên xwende-nivîsendetiyê bi dest bixin. Di vê qonaxê de wê hewl bê dayîn ku hunerweriyên xwende-nivîsendetiyê bi awayê bingehîn di ser kurdî re bî fêrkirin, lê belê divê mamoste tev wekî din bi tirkî jî bizanin, lewre di cihên ku xwendekar ketin tengasiyê de wê ji tirkî sûd bê wergirtin û perwerdehiya xwende-nivîsendetiya berawirdî bê dayîn. Zimanê perwerdehiyê bi kurdî ye. Dersên kurdî, bi awayê bingehîn wê yekê ji xwe re dikin armanc ku kurdiya rojane bê fêrkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina îngilîzî û zaraveyê berawirdî nayê kirin.

Dema Pola 2.: Di vê demê de pêşvebirina hunerweriyên devkî û nivîskî yê zimanê kurdî berdewam dibe. Heftiyê sê rojan saetekê dera tirkî tê dayîn û piştgirî li pêşveçûna zimanê devkî yê tirkî tê kirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina îngilîzî û zaraveyê berawirdî nayê kirin.

Dema Pola 3.: Di vê demê de li dersên pola 2. tê berdewamkirin. Di vê polê de cara pêşî wê dest bi dayîna dersên tirkî yê nivîskî û heftiyê sê saetan dersên îngilîzî bê kirin. Armanc ji vê ew e ku hin diyalog û qalibên besît ên zimên ên rojane bi îngilîzî bî fêrkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina zaraveyê berawirdî nayê kirin.

Dema Pola 4.: Di vê demê de ku qonaxa sêyem dewra xwe dibîne, dersên nû yê wek Zanista Fenê û Zanyariyên Civakî li mufredatê tî zêdekirin û bername hê bêhtir tê dewlemendkirin. Ders bi giştî bi kurdî tî xwendin lê belê derseke mufredatê wê bi tirkî bê xwendin. Îngilîzî ji vê qonaxê pê de wê wek zimanê nivîskî bê fêrkirin. Di vê qonaxê de hîn dest bi fêrkirina zaraveyê berawirdî nayê kirin. Her wiha di vê demê de cara pêşî wê hinek ders bi awayê hîlbijêrî bî dayîn.

Dema Pola 5.: Di vê demê de, demên berê bi heman awayî tên şopandin. Tenê wê jimara dersa mufredatê ya tirkî ji yekê bo duyan bê zêdekirin. Her wiha dibe ku li gor tercîhên xwendekaran cudabûn di navbera dersên hîlbijêrî de bîn xuyakirin.

Dema Pola 6.: Di vê demê de ku qonaxa çarem dest pê dike, bi lêzêdekirina gelek dersên nû yê mecbûrî û hîlbijêrî bername wê bêhtir bê dewlemendkirin. Bi vî awayî jimara dersên ku wê xwendekar bikarin bi tirkî an jî kurdî wergirin, wê zêde bibin. Saeta dersa îngilîzî ji sêyan bo çaran tê zêdekirin. Her wiha dersa zaraveyê berawirdî jî cara pêşî di vê demê de wê bê dayîn.

Dema Pola 7.: Di vê demê de, li dersên dema berî vê hema bibêje bi heman awayî wê bê berdewamkirin. Bi awayekî cuda tenê derseke mufredatê ya bi tirkî an jî kurdî tê xwendin, di nava heman heftiyê de wê bi îngilîzî dest bi xwendina wê bê kirin. Di dersa îngilîzî de jî di ber van mijarên mufredatê re wê dersa rêziman û bêjeyan bê dayîn. Her wiha li gorî tercîha xwendekaran du dersên hîlbijêrî wê bi zimanekî ji zimanên tirkî, kurdî an jî îngilîzî bîn dayîn. Dersa zaraveyê berawirdî jî wek sala berê wê her berdewam be.

Dema Pola 8.: Di vê demê de bi tevahî li bernameya ku dema berî vê dihat şopandin, tê berdewamkirin. Tenê dersên hîlbijêrî, li gor tercîhên xwendekaran tî guhertin.

Perwerdehiya Kurdî ya Dewra Derbasbûnê

Modelên li jor hatî rêzkirin, ji bo xwendekarên kurd ku wê yekem car dest bi perwerdehiyê bikin, hatine amadekirin. Lê belê vê gavê xwendekarên kurd tev naçar in ku li dibistanên tirkî yê yekzimanî berdewam bikin. Gava perwerdehiya pîrzimanî ya li ser bingehê zimanê dayikê wek prensîp hat pejirandin, ne mumkin e ev xwendekar berepaş vegerin û ji serî ve dest bi perwerdehiya xwe bikin. Ji lewma, divê ev xwendekar ji pileya ku lê ne pê ve perwerdehiya kurdî wergirin. Dîsa bi liberçavgirtina taybetiyên civake-zimanî ya xwendekaran û li gorî sê komên cuda yê xwendekaran, mirov dikare bi awayên li jêr hatî destkariyê li perwerdehiya berdewam dike, bike.

Xwendekarên kurdiya wan di asta baş de ye: Xwendekarên di nav vê komê de, ew kes in ku bêhtir li derveyî dibistanê bi awayekî aktîf dikarin bi kurdî biaxivin. Pêş-dibistan û pola 1. ne tê de, di kîjan pileya perwerdehiyê de bin bila bin, li gorî ku hunerên xwende-nivîsendetiya tirkî bi dest xistine, wê dersên *Raguhastina Xwende-Nivîsendetiye* bîn dayîn bo van xwendekaran û wê

rê li ber wan bê vekirin ku hunerên di zimanê tirkî de bidestxistî, raguhêzin kurdî. Herî zêde di nava salekê de ev raguhastin wê bigihîje asteke pêşdetir. Di merhaleyên piştî vê de jî dikarin hinek dersên bernameya hîndekariyê bi kurdî wergirin. Bi saya vê, di warê nivîskî de jî pirzimanîtiyeke bi hev kêşe wê bê pêşvexistin. Dersên raguhastinê dikarin wek ders li bernameya hîndekariyê bîn zêdekirin.

Xwendekarên kurdiya wan pir kêr e: Ji bo xwendekarên di vê rewşê de dîsa wê dersa Vejiyandina Kurdî li bernameya hîndekariyê bê zêdekirin û wê rê li ber xwendekaran bê vekirin ku kurdiya xwe bi pêş ve bixin û zanyariyên xwe yê kurdî ku bi awayekî pasîf bi wan re ye, bînin bîra xwe/vejînin. Di merhaleyên pêşdetir de hinek dersên bernameya hîndekariyê dikarin bi kurdî bîn dayîn.

Xwendekarên kurdiya wan qet nîn e: Ji bo xwendekarên di vê rewşê de jî ji merhaleya destpêkê heta bi kursa pêşdetir dersên zimanê kurdî wê bîn dayîn. Xwendekarên ku ne kurd in jî dikarin beşdarî van dersan bibin. Armanca ew e ku serê pêşî kurdiya rojane, di merhaleyên piştir de jî kurdiya ku di warê akademîk de bikare bê bikaranîn, bê fêrkin.

Li derveyê xwendekaran, ji bo dê û bavên jî li dibistanan dikare kursên kurdî bîn danîn. Ji bo vê jî dîsa li gorî taybetî û pêdiviyên civake-zimanî yê dê û bavên kursên xwende-nivîsendetiya kurdî û *Perwerdehiya Mezinan* dikare bîn dayîn. Ev kurs, nava heftiyê êvaran an jî dawiya heftiyê dikare li dibistanan bîn dayîn.

Di dersên kurdî de ku çî ji bo xwendekaran çî jî ji bo dê û bavên bîn dayîn, dîsa divê li gorî perwerdehiya rexneyî/vegûherînê û feraseta xwende-nivîsendetiya rexneyî ku me di modelên xwe yê perwerdehiyê yê pirzimanî de pêşniyarkirî, bername bê sazkin.

Encam

Feraseteke perwerdehiyê ya pirziman a li ser bingehe zimanê dayikê ne tenê ji bo kurdan, tirk jî tê de bo hemû komên li Tirkiyeyê pêwîst û girîng e. Ev hem dikare di pêkanîna aştiya civakî de, hem jî di sazkirina têkiliyên wekhevane yê di navbera gelan de rolekî girîng bilîze. Vê gotarê xwe spartiyê raporekê ku 2012'an de ji aliyê DISA'yê ve hatiye belavkirin wek encamekê projeyekê berfirehtir li ser bikaranîna zimanê dayikê di perwerdehiyê de. Armanca raporê ew bû ku bibe alîkar ji nîqaşên bikaranîna zimanê dayikê di perwerdehiyê de ku heta îro hatine

meşandin. Di raporê demodelên perwerdehiyê yê berbiçav hatine pêşniyarkirin da ku nîşan bide ka perwerdehiya pirziman a li ser bingehê zimanê dayikê çawa pêkan dibe. Her çiqas li ser belavkirina raporê gelek dem derbas bibe û şert û mercên siyasî gelekî guherîbin jî mijara di vê gotarê de hatiye pêşkêşkirin dikare nîqaşên îroyîn û lêkolînên nû dewlemen bike û bibe bingehê ji bo xurtkirina xebatên ji bo parastin û pêşvebirina mafên zimanî û perwerdehî ne tenê ji bo kurdî, ji bo piraniya zimanên xweyî şert û derfetên mîna kurdî.

Çavkanî

Ada, Alma Flor (1988), "Creative Reading: A Relevant Methodology for Language Minority Children", *NABE '87 Theory, Research and Application: Selected Papers*, (ber.) Lilliam Malave, State University of New York, Buffalo.

Baker, Colin (2006), *Foundations of Bilingual Education and Bilingualism*, (Çapa 4.), Multilingual Matters, Clevedon.

Baker, Colin (2011). *İkidilli Eğitim: Anne-babalar ve Öğretmenler için Rehber*, (wer. Sezi Güvener), Heyamola Yayınları, İstanbul.

Benson, Carol (2005) "The Importance of Mother tongue-based Schooling for Educational Quality". Raporu EFA Global Monitoring.

Benson, Carol (2009), 'Designing effective schooling in multilingual contexts: going beyond bilingual "models"'. 'Nav *Social Justice through Multilingual Education*, (ber.) Mohanty, Ajit, Minati Panda, Robert Phillipson û Tove Skutnabb-Kangas. Multilingual Matters.

Chomsky, Noam (1965), *Aspects of theory of Syntax*, MIT Press, Cambridge.

Chomsky, Noam (2009), *Bilgi Sorunları ve Dil: Managua Dersleri*, (wer. Veysel Kılıç), BGST Yayınları, İstanbul.

Cook, Vivian, (1995) "Multi-competence and Learning of Many Languages", *Language, Culture and Curriculum*, 8.

Cook, Vivian (2006), "Interlanguage, Multi-competence and the Problem of the 'Second' Language." *Rivista di Psicolinguistica Applicata*, 3.

Coşkun, Vahap; Derince, M. Şerif û Uçarlar, Nesrin (2010), *Kula Ziman: Kêşeya Bikarneanîna Zimanê Zikmakî di Perwerdeyê de û Serhatiyên Xwendekarên Kurd li Tirkîyeyê*. DÎSA, Diyarbakır.

Cummins, Jim (2000), *Language, Power, and Pedagogy. Bilingual Children in the Crossfire, Multilingual Matter*, Clevedon.

Cummins, Jim (2001), "Empowerment through Biliteracy", Nav *An Introductory Reader to the Writings of Jim Cummins*, (ber.) Colin Baker û Nancy Hornberger, *Multilingual Matters*, Clevedon.

Derince, Şerif (2012). *Perwerdehiya Dînamîk a Pirzimanî û Pirzaravayî li ser Bingehê Zimanê Dayikê: Modelên Perwerdehiyê bo Xwendekarên Kurd*. Weşanên DÎSA. Diyarbakır.

Eğitim Sen (2011), *Eğitimde Anadilinin Kullanımı ve Çiftdilli Eğitim; Halkın Tutum ve Görüşleri, Eğitim-Sen Türkiye Taraması*, Eğitim Sen Yayınları, Ankara.

Freire, Paulo (2010), *Ezilenlerin Pedagojisi*, (wer.) Erol Özbek/ Dilek Hattatoğlu, Ayrıntı Yayınları, İstanbul. Gallagher, Eithne (2008). *Equal Rights to the Curriculum: Many Languages, One Message*. *Multilingual Matters*, Clevedon.

Garcia, Ofelia (2009), 'Education, multilingualism and translanguaging in the 21st century. 'Nav *Social Justice through Multilingual Education*, (ber.) Mohanty, Ajit, Minati Panda, Robert Phillipson û Tove, Skutnabb-Kangas. Bristol: *Multilingual Matters*.

Herdina, Philip û Jessner, Ulrike (2002). *A Dynamic Model of Multilingualism: Perspectives of Change in Psycholinguistics*, *Multilingual Matters*, Clevedon.

Malone, Susan (2010), *MLE Program Planning Manual*, (çavkaniya çapnebûyî).

Skutnabb-Kangas, Tove (2000), *Linguistic Genocide in Education-or Worldwide Diversity and Human rights?* Lawrence Erlbaum Associates, Mahwah, NJ.

Kurdînivîsîn û Perwedehî bi zimanê Kurdî li Başûrê Kurdistanê

Dr. Hewa Salam Khalid

Destpêk

Kurdînivîsîn peyveke berfireh e û em dikarin li gelek aliyên wê binêrin. Çimkî her zarekî Kurdî dîrokeke xwe heye û dîroka wan jî li hev cuda ne. Kurdînivîsîn bi zarê Goran û Kurdiya Başûrî gelekî kevin e û nivîsa wan vedigere ji bo nêzî hezar sal berê. Piştî çend sed salan, nivîs bi Kurmancî dest pê kir, di dema avabûna mîretiya Baban, nivîs bi Kurdiya Navendî jî dest pê kir (Xeznedar, 2001) û di dawiya sed sala nozdehan nivîs bi Zazakî jî derket (Malmîsanij, 2021). Ji ber vê yekê, dema em behsa Kurdînivîsînê dikin, gerek em ronî bikin ku sînora me kîjan zarê Kurdî ye. Ev vekolîn zêdetir li ser Kurdiya Navendî disekine û di nav Kurdiya Navendî jî bala xwe dide Başûrê Kurdistanê. Piştî bibêrxistina Kurdînivîsînê, em behsa xwendin bi zimanê Kurdî

li Başûrî dikin, ku dibe destpêka xwendina Kurdî jî. Çimkî, di Kurdistanê de, ji bo cara yekem, xwendin bi zimanê Kurdî li Başûrî dest pê kiriye û heta niha jî berdewam e.

Hizir û ramana pêşxistina zimanê Kurdî ji bo cara yekem vedigere serdema mîretiya Baban. Li gorî belgeyan, mîretiya Baban zêdetir li mîretiyên dinên Kurdan li ser giringiya zimanê xwe sekinîne û di serdema wan de Kurdiya Navendî pêşketineke berçav bi xwe ve dîtiye. Têkçûna mîretiyên Kurdan û Baban jî di nav de, bandoreke xirab li ser zimanê Kurdî hêlaye û ew jî di helbestên helbestvanên Kurd de hatiye zimên (Xeznedar, 2001). Dure, di destpêka sedsala bîstan de, bi sebebe hilweşîna dewleta Osmanî, Kurdên Başûr li Kurdên Bakûr cuda bûn. Rewşa Bakûr di destî dewleta Tirkan de roj bi roj xirabtir bûye û ew rewiş heta îro jî didome. Lê, Başûr derfeteke din bi dest xist û Kurdên Başûr li dest Tirkan xilas bûn. Zêdebarî ewê ku ew ketin ber destê Înglîz û piştî Ereban, lê bi berxwedan û xebata xwe karîn hinek mafên xwe di çarçoveya dewleta Îraqê de bi dest bixin.

Li vê vekolînê de, em zaniyariyên dîrokî û çewaniya pêşketina perwerde bi zimanê Kurdî dixin ber bas û şiroveya wan dikin. Ji bo vê jî, em vekolîna xwe dabeşî ser du beşan dikin. Di beşa yekem de, behsa rewşa zimanê Kurdî di serdema Osmaniyan tê kirin. Di beşa duyem de, em behsa rewşa zimanê Kurdî li Îraqê dikin. Ku di bîstên sedsala borî dest pê dike heta hikumeta herêma Kurdistanê di niha de.

1. Rewşa zimanê Kurdî di serdema Osmaniyan li Başûrê Kurdistanê

Ji bo têgehiştin li destpêka perwerdekirin bi zimanê Kurdî, gelek giring e ku mirov rewşa Kurdistana Osmaniyan fehim bike. Wekî xuya ye, piştî şerê çaldîran di 1515an de Kurdistan ji bo cara yekem bû du parçe û ew jî bi giştî wekî Kurdistana Osmaniyan û Kurdistana Sefewiyan tê binavkirin. Kurdistana Başûr beşek bûye di dewleta Osmaniyan û sîstema xwendinê jî wekî sîstema xwendina Osmaniyan bûye (Xeznedar, 2001). Di Kurdistana Osmaniyan de, Kurd xwedî gelek mîretiyên bûn û mîretiya Baban û Soran jî di nav de. Lewma gelek caran zara Kurdiya Navendî wekî Babanî yan Soranî tê binavkirin. Di Rojhilata Kurdistanê jî gelek mîretî û deselatên Kurdî di bin siya Sefewiyan hebûne û mîretiya Erdelan ku paytexta wan Sine bûye mîretiya herî binav û deng bûye li wir. Lê mijara me zêdetir li ser Kurdistana Osmaniyan û bi taybet Başûrê Kurdistanê ye. Di nav mîretiyên Kurdan de xwendin bi Kurdî ne mijareka sereke bûye û bihêzkirina aliyên serbazî û cengî zêde bala wan kişandiye. Di nav mîretiyên ku bi zara Kurdiya Navendî jî peyvîne, mîretiya Baban zêdetir li ewên din xwe mijûlî xwendin û xwendevaniyê kiriye. Ew jî bûye sebeb ku edebiyata Kurdiya Navendî di nav helbestvanên

Baban de derbikeve. Di edebiyata Kurdiya Navendî de sê helbestvanên herî binav û deng ku di serdema Babanan derketine, Nalî, Salim û Kurdî ne ku bi sêkuçkeya edebiyata Kurdiya Navendî tînen naskirin. Dema ku Nalî helbestan bi Kurdî nivîsandine, gelek xwendevanên vê serdemê heneka xwe bi zimanê Nalî kirine û ew jî di bersiva wan de û di helbesteke xwe de dibêje

Kes be elfazim nellê xo Kurdî ye, xokirdî ye

Her kesê nadan nebê xoy talîbî me'na deka (Dîwanî Nalî, 1985).

Nalî bi neyarên xwe dibêje, kes bi helbestên min nebêje kêra wan tune ye û ew Kurdî ne û kes nikare wan bixwîne û tiştê xwekirdî û navxweyî ye. Ewên ku nizan nebin, li me'na û kuriya helbestên min dinêrin û biryara nerênî ya xwe li ser şikl û zimanê helbestan nadin. Dema em li vê helbestê û ramana nalî û xelkê dinêrin, ew xuya dibe ku gelê me hê dest ji vê ramana xeletî û xwe kêmdîtîne ber nedaye û hê zimanên xelkî biqîmettir dibîne bi berawird bi zimanê xwe yê şîrîn û biqîmet. Hê zarokên Kurdan Kurdiyeke baş nizanin û dê û bavê wan zimanên netewe yê dagîrker dixin pêş zimanê xwe. Ew jî tenê malxirabiyê ji zarokê wan û gelê wan jî tine.

Bi kurtasî em dikarin bêjin di serdema mîretiyên Kurdan de xwendin û perwedehî bi zimanê Kurdî tune bûye û tenanet helbest nivîsîn jî bi Kurdî kêmbûye û xwendevan zimanê xwe kêmdîtine. Di nîva sedsala nozdeyan de, Êdî Osmanî biriyara têkbirina Kurd û hemû netewyên din di bin deselata wan de û mîretiyên Kurdan derbeyên mezin xwarin. Her dû mîretiyên Başûrê Kurdistanê, Soran di 1937an û Baban di 1950yan de hatin têkbirin. Êdî ew Kurdêti ku berê hêdî hêdî pêşve diçû, sist bû yan ji hole rabû. Gelek ji Kurdînivîsên mîna helbestvaên behiskirî jî, welat hêlan û berê xwe dan xerîbîyê. Di edebiyata Kurdî de, du name ku bi helbest hatine nivîsandin pir tê bas kirin. Em dîsa vê nameyê di navbera Nalî û Salim dinvîsin çimkî rewşa Kurdistanê piştî têkbirina mîretiyên behs dîke û mirov dikare rastiyan di nav van helbestan bibîne. Nalî di nameya xwe ji bo salim dinvîse:

qurbanî tozî rêgatim, ey badî xoş mirûr

ei peykî şareza be hemû şarî Şarezûr

ey lutifeket xefî û hewa xwah û hemdeme

wey sirweket beşaretî ser goşeyî hûzûr

ey hem mîzacî eşkî terr û germî 'aşqan

tofanî dîde û şererî qelbî wek tenûr

gahê debî be rewî û dekey bawêşênî dll

gahê debî be dem, dedemênî, demî xurûr

meħwî qebûllî xatirî 'atir şemîmte
gerdî şîmal û gêjî cenûb û kizeyî debûr
sûta rewaqî xaneyî sebrim, dll û derûn
neymawe xeyrî goşeyî, zîkrêkî ya sebûr
hem hem 'enanî ahim û hem hem rîkabî eşk
rehîmê bem ah û eşke bike! Heste bê qusûr
wek ahekem rewan be! heta xakî Koyî yar
wek eşkekem rewan be! heta awî Şîwesûr
bew awe xot bişo, le qudûratî serzemîn
şad bin be wesllî yekdî; ke toyî tahîr, ew tehûr
emca meweste ta degeye 'eyinî Serçinar
awêke pîrr lenar û çinar û gull û çinûr
çeşmêke mîslî xor ke le sed cê, berroşnî
fewranî, nûrî safe Leser berdî wek bilûr
ya 'eksî asmane le awêneda kewa
estêrekanî rabikşên wek şehabî nûr
ya çeşmesarî xatirî pîrr feyzî 'arîfe
yenbû'î nûr e dabirrijênê le kêwî tûr
demwit dû çawî xom e, eger Bekrecoyî eşk
nebwaye tîj û bê semer û germ û swêr û sûr
daxill nebî be 'enberî sarayî Xakûxoll
heta nekey be xakî Suleymanî ya 'ubûr
ye'nî riyazî rewze, ke têyda beçen demê
muşkîn debî be kakollî xîlman û zullfî hûr
xakî mîzacî 'enber û, darî rewacî 'ûd
berdî xeracî gewher û, cobarî 'eyinî nûr
şamî hemû nehar û fusûlî hemû behar
tozî hemû 'ebîr û buxarî hemû buxûr
şarêke 'edl û germ e, le cêgeke xoş û nerm
bo defî çawezar e dellên: şarî Şarezûr
ehlêkî way heye ke, hemû ehlî danişin

hem nazîmî 'uqûdin û hem nazîrî umûr
seyrê bike le berd û le darî meħellekan
dewrê bide be pîrsş û teftîş û xwar û jûr
daxo derûnî şeq nebuwe? prdî Serşeqam
pîr û futadeten nebuwe? darî Pîrmesûr
êsteş beberg û bar e 'elem darî Şêx Hebas?
ya bê newa û berg e, gerrawe be şexsî 'ûr!?
aya becem' û dayre ye dewrî Kanî-ba?
yaxo buwe be tefrîqeyî şorrş û nuşûr!?
Seywan nezîrî gunbedî keywan e sebz û saf!?
yaxo buwe be dayreyî encumî qubûr!?
êsteş mekanî aske ye Kanî-askan?
yaxo buwe be mel'ebeyî gurg û lûrelûr?
êsteş suruşkî 'îşqî heye Şîwî Awdar?
yaxo buwe be sofî û şikî leħeq bedûr?
daxo derûnî saf e, gurrey mawe Tancerro?
yaxo esîrî xak e be lêllî deka 'ubur?
seyrêkî xoş le çîmenî naw Xaneqa bike
aya rebî'î ahuwe, ya çayrî stûr?
sebze le dewrî gull terr e, wek xettî ruwyî yar?
ya pûşî wişk û zûr e, wekû rîşî Kake Sûr?
qelbî munewwer e le ħebîbanî nazenîn?
ya wek seqer, pîrr e le reqîbanî lendehûr?
des bendiyan e dên û deçn, seru û narewen?
ya ħellqeyan e sofîyî mil xwar û mendebûr?
meylê bike le sebze dirextanî medrese
ewraqiyan muqedidîmeyî şîn e ya nesûr?
ħewzî pîrrî kenaybî dîdeyî min e lewê
lêllawî danehatuwe wek seylî Şiywesûr?
êsteş kenarî ħewşeke cêyi baz û kewşek e?
yarîyî tiyaye? ya buwete me'rezî nufûr?

çawê bixe le sebze û, sêrabî dayre
cê cîlwegahî çawekem e, nerm e, ya nezûr!
tu xwa fezayî deşitî feqêkan emêstekeş
meşer mîsale, ya buwete çollî selm û tûr?
wasîl bike'ebîrî selamim be hûcrekem
çî mawe, çî nemawe, le heywan û taq û jûr?
ew xarî ya reyst e, pîrr eÿyare, ya nexo
her xarî yar e, ya buwe teÿarî mar û mûr?
zarm weku hîlal û nehîfm weku xeyall
aya dekem zar û be dillda dekem xutûr!?
lem şerhî derdî xurbete, lem sozî hîcrete
dill renga bê be aw û be çawa bika xubûr
aya meqamî ruxset e, lem beyne bêmewe?
ya mesllehet teweqqufet e yewmî nefxî sûr?
hâlî bike be xufiye: ke ey yarî seng dill!
Nalî le şewqî toye denêrê selamî dûr (Dîwanî Nalî, 1985)

Nalî, ku li her derî Slêmanîyê dipirse heta bizane serdema piştî Babaniyan çawan e? Gelo ew dikare vegere welatê xwe yan na? Salim bi rêka vê helbestê her tiştî ji wî re şirove dike.

canim fîdayî sirweket ey badekeyi seher
ey peykî muste'id le hemû rahî pîrr xeter
ey mîrwehey cemallî meh-asayî dillberan
wey şanezen be kakollî turkanî sîmber
ca rûkeşî menazîlî canan le xellweta
ferraşî ferrîşî sebze, beharan, le deşit û der
mallîş dedey be dem, le demî xwabî subhîdem
hem zullfî qîrgûne û hem çîhreyî qemer
barî le sirweket be şineyi engebînî, gez
krdûye cunbuşit be hemaÿûşî neyşeker
wextî tewafî 'arîzî dillber, şinoyî to

leẓziş dexta be turre le ser ta be pêyî kemer
key dête xende ẓunçe demê bê wezîdent?
ger to nebî dextî çemen nagrê semer
eñyakunî cemî'î nebatatî 'alemî
re'na kişa le terbiyett qametî şecer
abî heyate ateşî efsurdeyî demt
tehrîkî toye girr le tenûra ke dête der
mîhnet ewende zor e, hênde dillm teng buwe
dûdî henaseyî seherm hewrî grte ber
hîmnet ke çabukane be îcrayî metllebim
lem ser birro wekû berîd û lewê bê wekû teter
bo mullkî şame nameyî min suwîyi Naliye
her herfî ew le wez'î wîlayet deda xeber
pîrsîwîye zahîren le refîqanî yek cîhet
eñwallî esllî şehir û muqîmanî serbeser
lew sawe hâkmî, be stem derbeder kira
neydîwe kes le çîhreyî kes cewherî huner
ta bû be cayî metle'î xurşîdî mullkî rom
sûta giyahî tîşne û xuşkîde bû şecer
naken hewayî hîç kebabê zelîlî şehir
buriyane bes le narî xema pareyî ciger
cuz gahî ah û grîye le eyiyamî romîya
nemdîwe wa bibê le ferehda lebî beşer
seywan pîrre le şexisî stemdîde xwar û jûr
her qebrî pîrre xemane le her la dekem nezer
cêy turkekanî rom e der û jûrî xaneqa
xâflî hemû le cayî murîdanî baxeber
ew hewze pîrre debû ke wekû çawekanî ew
teẓîre awî wek dillî merdanî pîrre qeder
ew deşte cay yariyî yaranî hûcre bû
yekser meqamî romî ye her wek tehî seqer

sûta dillm be h allet  cobar  Ser inar
l llawe  e mesar  wek   aw  b  beser
zistan  ewwell n b  dirra berg    x Hebas
rom  ewende   m e le  exis   dexta zerer
wek p r  xurdisalle xem  dar  P rmes r
me   ll  le z e hemeca pay ta beser
ew berdekan  naw  nira qsin   exisekey
dayan be  ax   darekeya Turk  b  huner
wek  aw  b   emane hem   iyw  Awdar
bes mu kile le  e mey  ew qetire b te der
ewsa mekan  aske b  Kan -askan
 ste le deng   reng  errom  pirre le ker
emrro fezay  baz geh cay  rehzene
lew de ite d  le  eybewe awaz  el ezer
ta duzdcoy  n me ebin Turk  b  n zam
duzdin hem  le xermen  mun' m wek   erer
 hr ke p r le zullm   mekan ke p r le  n
cay ke p r le  or   willat ke p r le  err
serban  p r le kejdum   d war  p r le mar
gewdal  p r le rehzen   se ray  p r xeter
dill nayell  bill m  i ye saman  h crekey
her torr  'enikeb te, h cab  b run   der
nay  seda le pencerekeyi cuz fi an  cu d
 eyrez  eqam  m r  n ye  iw n   p  guzer
t  xwa bill  be h ziret  Nal  dex l  bim
bem new'e qed neka be Suleyman ya guzer
em mullke nezim  nab  beb  zebit  war s 
b  ew be qesd  em teref  ba neka sefer
Salim s fet le b kesiya ba neb  h lak
min krdm, ew neka le  ema xw n  xoy heder (D wan  Salim, 2015).

Di helbesta xwe de, Salim di gelek cihan de hecuya Tirkan dike û ji bo hevalê xwe dibêje ku piştî Babanan Tirk bi tamamî Silêmanî kavil kirine û bi hevalê xwe dibêje, ku heta Tirk hakimê Slêmanî bin, qet venegere. Çimkî tu tiştêk di cihê xwe de nemaye. Ev du helbestên kilasîka Kurdî rewşa bajar û bajarokên Kurdistanê piştî têkbirina mîretiyên Kurdan gelek bi ronî şirove dikin. Bi sebeba têkçûna mîretiyên Kurdînivîsîn jî di paş de ma û ew rewş heta çend salan dewam kir. Şêx Reza Talebanî jî rewşa Slêmanîyê di helbestê xwe de şirove dike û dibêje

le bîrm dê Suleymanî ke darulmulkî Baban bû
ne mehkûmî 'ecem ne suxirekêşî alî 'usman bû
le ber qapî sera sefyan debest şêx û mela û zahîd
metafî ke'be bo erbabî ħacet girdî Seywan bû
le ber tabûrî 'esker rê nebû bo meclîsî paşa
seday moziqe û neqqare ta eywanî Keywan bû
dirêx bo ew zeman, ew deme, ew 'esire, ew roje
ke meydanî cirîdbazî le dewrî Kanî-askan bû
be zerbî ħemileyê beħday tesxîr krd û têyi hellda
Suleymanî zeman, rastit dewê, bawkî Suleyman bû
'ereb înikarî fezlî êwe nakem, eazel in emma
Selaħedidîn ke dinyay girt le zumirey Kurdî Baban bû
'umûmî şehriyaran û selatînî ferengistan
le ru'bî setwetî ew şêreda gişitî herasan bû
qubûrî pîrr le nûrî alî Baban pîrr le rehmet bê
ke baranî kefi îhsaniyan wek hewrî nîsan bû
ke 'ebidullah- paşa leşkrî walîyî Sineyi şîrr kird

Reza ew wexte 'umîrî pênc û şeş tîflî debstan bû (Dîwanî Şêx Rezay Talebanî, 2003).

Di helbesta Şêx Reza Talebanî du tiştên pîr giring tînin. Yekem Silêmanî piştî Babanan ne wekî Silêmanî serdema Babanan buye û bajar ketiye. Duyeam, di dawîya helbestê de, dema Şêx Reza behsa jiyê xwe dika, şera navbera mîretiya Baban û Erdelan tîne bîra me. Ew şer ku di navbera Kurdan de çê bûne, sebebeka sereke bûye û hê sebebeke serekeye ku Kurd nikarin xwe pêş bibin û her tim malxirab dibin bi sebeba yeknegirtinê.

Piştî têkçûna mîretiyên Kurdan û xwe nûjenkirina Osmaniyan, xwendingehên Osmaniyan li her derî hatin vekirin, ku bi rûşdiye dihatin binavkirin. Di dabeşkirina rûşdiyeyan dîsa gelek cudahî

di navbera bajarên Tirk û Kurdan de hebû. Lê her çewa be, hinek rûşdiye jî li Kurdistanê di dawiya sedsala 19yan hatin vekirin. Rûşdiyeya kuran li Hewlêrê 29 xwendekar, li Rewanduzê 29, li Slêmaniyê 138 û xwendekarên Behdînan jî diçûn Musilê yan Cizîreyê. Lewma vekirina xwendîgeh li Behdînan kete destpêka sedsala bîst û tê gotin ku yekem xwendîgeh li wir di sala 1905an de hatiye vekirin. Piştî, li Kirkuk û Slêmaniyê amadehî jî hatin vekirin. Lê zimanê xwendîgehên Osmanî bi Erebî wekî zimanê Quraanê û Tirkî wekî zimanê dewletê bûye. Hinek çaran Farsî jî hatiye xwendin lê Kurdî ne têda (Kakesur, 2003). Di wê serdemê jî, hinek mamosteyên Kurd qîmeta zimanê xwe zaniye û bi zimanê Kurdî darsa xwe pêşkeş kiriye. Di vê warê de çîrokek derbarê Kake Ehmedî Şêx tê gotin ku yek ji rewşenbîr û mamosteyên Slêmaniyê bûye. Tê gotin ku Kake Ehmed dersê xwe bi Kurdî daye xwendekarên xwe û kesek jî çûye Stenbolê gazinde li Kake Ehmed kiriye ku dersê bi Kurdî dide. Dema Hacî Qadirî Koyî bûyerê dibihîze, derbarê kesê ku xeber daye dibêje:

Her ke way wit wiha mukkeder bûm

Wam zanî kewa le dîn derçûm

Witim êstaş le ser kerî mawî?

Çak bû mistim neda le naw çawî (Subhan, 2018).

Êdî bi giştî em dikarin bêjin xwendîgehên Kurdî heta sedsala 20an tune bûne. Li hinek medrese û hucreyan xwendîna Kurdî hebûye, li hinek xwendîgehên Osmaniyan jî mamoste hebûne ku dersên xwe bi Kurdî dane. Lê bi şikleke fermî, ji bo cara yekem xwendîgeheke Kurdî ji aliyê Xelîl Xeyalî li Stenbolê hat vekirin di sala 1908an de û ew jî bi zûyî hat girtin (Hesen, 2008).

Piştî têkçûna dewleta Osmanî, Kurdistanê Osmanî bû sê parçe, Bakur, Başûr û Rojava. Ji xwe Kemalî çî mafek nedan Kurdên Bakur û syaseta qirkirina Kurdan meşandin. Zimanê Kurdî li Bakur hat qedexekirin û Kurd di mala xwe de bêmaf man. Kurdên Rojava jî bi sebebên cor bi cor bêmaf û tenanet bênasname man. Emê li vê vekolînê tîşk dixin ser Kurdên Başûr.

2. Rewşa zimanê Kurdî di Îraqê de

Piştî hilweşîna dewleta Osmaniyan, Înglîz Başûrê Kurdistanê û Îraqê xistin bin destê xwe û wan dewleteke nû bi navê Îraqê ava kir. Kurd her zû li hemberî avakirina Îraqê seknîn û ew jî dixwastin dewleteke xwe hebe, lê li gorî peymannameyên Saykês Pîkot û piştî Lausanê mafê Kurdan nehat dan. Lê belê Înglîz soza parastina mafên çandî û zimaniya Kurdan da û di sala

1918an de yekem xwendingeha Kurdî li Slêmaniyê vekir (Kirmanj, 2014). Ew xwendingeh jî ku bi navê nimûney Se'adet bû dibe yekem xwendingeha Kurdî di Kurdistanê de. Herwiha, wan çapxane îna Kurdistanê û rojnameya Pêşkewtin li Slêmaniyê çap kir, ku ew jî bandoreke mezin li ser zimanê Kurdî hêla. Di rojnameyê de bangewaz li gelê Kurd hat kirin ku zarokên xwe ji bo xwendingehên Kurdî bişînin. Major E.B. Soane û Captain W.J. Farrel di vê ware de bi hemahengî li gel rewşenbîrên Kurd û bi taybet Muhemmed Emîn Zekî û Mîrza Muhammad roleke mezin lîstin (Kirmanj, 2014). Tenanet Major Soane xelat ji bo nivîsandin bi Kurdiyeke paqij pêşkeş dikir. Piştî ku navbera Înglîzan û Kurdan xirab bû û Şêx Mehmûdê Hefîd Komara Kurdistana Cinûbî ava kir, bilez dewleta Şêx Mehmûd giringiyeke zêdetir da xwendin bi Kurdî û xwendingehên nû hatin ava kirin. Her wiha, Şêx Mehmûd yekem kes bû ku navê Başûrê Kurdistanê îna nav edebiyata Kurdan û navê komarê jî kir Kurdistana Cinûbî yan Komara Kurdistana Başûr. Li van xwendingehan ku deselata Şêx Mehmûd li Slêmaniyê bi zimanê Kurdî vekir, amadehiya Mehmûdî, Qadirî û Letîfî bûn (Kakesur, 2003). Dema Înglîz Komara Kurdistan a Cinûbî jî têk bir û Kurd bi naçarî bûn beşek li Bexdayê, xwendingehên Kurdî man û xwendina Kurdî hêdî hêdî gav avêt. Li hemû kombûnên Kurdan di gel deselata Bexdayê, xwendina Kurdî û zimanê Kurdî merceke sereke bû. Di destpêkê de pîrsgirêka nebûna çavkaniyên Kurdî hebû, ders bi Kurdî bûn lê gelek ji çavkanî bi zimanê Erebî bûn. Lê bi piştgîriya nivîskar û wergêrên Kurd di çend salan de ew pîrsgirêk jî hat çareserkirin (Hesen, 2008). Dema dewlete Tirkan bihêz bû û dest bi komkujiya Kurdan kir, dewleta Îraqê jî di 1930yan de hêza xwe bi dest xist û li sozên xwe hêdî hêdî poşman dibû. Êdî dewlet dest bi girtina xwendingehên Kurdî kir û karên wan sînorkirî kir. Rewşa vegeyriyana dewleta melekî heta 1958 berdewam kir û bi pîlan derbe li zimanê Kurdî dida. Li Koyê li 1936an da dema ku dewleta Îraqê xwest xwendingehên Kurdî biguhere ji bo Erebî, xwendekarên Kurd ji bo cara yekem di Kurdistanê de narazîbûna xwe nîşan didin û naçin xwendinê (Hewêzî, 2007). Ew hişmendî di nav Kurdên Başûr astengeke mezin li ber syaseta tunekirina Kurdan li Îraqê çêkir. Komara Kurdistanê li Mehabadê jî bandoreke erênî li ser Başûr kir çimkî zimanê Komarê jî Kurdiya Navendî bû û gelek belavok jî li wê serdemê bi Kurdî hatin bilavkirin.

Di sala 1958an de guhertineke mezin di Iraqê de çê bû. Şorişa Iraqîyan sîstema paşayetiye têk bir û sîstema dewleta Iraqê ji bo komariyê hat guhertin. Kurd di vê şorşê de roleke mezin lîstin û di encamê de gelek maf ji bo Kurdan hat rewa ditin. Di destûra nû de zimanê Kurdî wek yek ji zimanên serekeye Iraqê hat nasandin. Nasandina zimanê Kurdî wek zimanê dewletê û zimanê

yekem di Kurdistanê de bûye derfeteke mezin ji bo xwendina bi Kurdî hete gavên mezin biavêje. Di sala 1959yan de di kombûna Şeqlawe ya mamosteyên Kurd gelek biriyarên giring hatin sitandin û di nav de dariştina programên nû ji bo xwendinê. Berê ku dîroka welatên Erebi bi Kurdî dihat xwendin, di vê kombûnê mamosteyên Kurd biryara xwendina dîroka Kurdistan de di darsa dîrokê. Gavên mezin hatin avêtin ji bo vekirina peymangehên zimanê Kurdî û xwendina ziman û edebiyata Kurdî di zanîngehan de. Herweha dariştina ferhengeke hevgerî ji bo zimanê Kurdî hat gengeşekirin û gelek xwendina seretayî bi temamî hat guherandin ji bo zimanê Kurdî. Di eynî salê de berêweberêtiya zaniyarî ya Kurdî ku piştî guhert ji bo berêweberêtiya xwendina Kurdî hat damezrandin. Ew roleke mezin lîstin û berpirsên yekem bûn ji bo pêşxistina xwendina Kurdî (Hesen, 2008). Lê meha hingivînê di navbera Kurdistan û dewleta komarî ya Îraqê zêde nedomand û rewş berev bi xirabiyê çû. Êdî, şorişa Eylûlê dest pê kir û di nav bera Kurdistan û dewletê dîsa şer dest pê kir. Ev şer jî bandoreke gelek neynî li ser xwendina Kurdî û tev bwarên din li Kurdistanê kir û heta sala 1970yan dewam kir. Serbarî vê jî, di sala 1968an de yekem zanîngeh li Kurdistanê bi navê zanîngeha Slêmanîyê hat vekirin (Baban, 2012). Di 11 ya adarê de peymannameke nû di nav Kurdistan û dewleta Îraqê hat îmzakirin ku di çarçoveya vê peymannameyê de ji bo cara yekem statyo ya herêma Kurdistanê wekî navçeyeke xweser hat qebûlkirin, Kirkuk ne têda. Xweseriya Başûrî di 1970 heta 1974 yekem xweseriya beşek di Kurdistanê de bû ku bi fermî hatibe nasandin û Kurd têda hukim bikin (Khalid, 2015). Bi hezaran pirtûkên Kurdî di vê serdemê de hatin çapkirin û xwendin heta pola 12yan bû Kurdî. Di sala 1971 de, Korî Zaniyarî Kurd ku niha bûye Ekdêmiya Kurdî hat damezrandin û ew di gelek bwarên mîna rêzman, ferheng, serrastkirina pirtukan, çapkirina pirtûkên menhecî û nû, çareserkirina pirsgerêkên zimanê Kurdî roleke hêja lîstin (Hesen, 2008). Zara Kurdiya Navendî wekî zimaneke standrd li Başûrî bi rola xwe rabû û li tevahiya Kurdistanê bû zimane xwendinê. Lê dewleta Îraqê li soza xwe derbarê Kirkuk û gelek navçeyan din poşman bû û xwest deselata Kurdî sînordar bike. Deselata Kurdî bi temamî berev bi şikestinê çû û dewlet deselata xwe vegehand ji bo Kurdistanê. Êdî, piştî 1976an serdemeka tarî ji bo Kurdên Îraqê dest pê kir. Di 1976an de şorşa Kurdistan dîsa dest pê kir, lê di partiyên cuda de. Kurd bûn çend alî û gelek partiyên nû derketin. Rewşa xirab heta sala 1991 domand ku rijêma Îraqê gav bi gav mafê Kurdistan bin pê dikir. Di salên 1979 heta 1991 şer di navbera Îran û Îraqê jî qewmî û Kurd jî di vê şerê de bûn alî. Gelek bajar, bajarok û gûndên Kurdistan bi temamî hatin kavilkirin û qirkirina

Kurdan dest pê kir. Di van salan de bi sedan hezar Kurd hatin qetilkirin ku bi pirosêsa Enfal tê bi nav kirin, xenqandina Helebce jî têda (Khalid, 2015).

Sala 1991, Kurd serhildan û Kurdistan di bin destê Îraqê de îna der. Di vê serdemê de pirsgirêken mezin ên dewletê hebûn bi sebeba şera Îraq – Îranê û dagîrkirina Kuweyt ji aliyê Îraqê ve. Lê, dewlet karî gelek navçeyan ji xwe re vegeirîne û bi nêzikî Kurd di navçeyên xweseriya 1970yan de man û Hukumeta Herêma Kurdistan û Perlemana Kurdistanê ava kir. Di herêmê de jiyan bi temamî bû Kurdî û xwendîngêh, peymange û zanîngêh bi temamî vegeirîyan ser eslê xwe. Di salên nodan de çend car şerê birakujî di navbera partiyên Kurdan de derket û pêşketina herêmê sist kir, lê deselatdariya Kurdî û xwendin bi Kurdî dewam kir. Di sala 1997an de, xwendin di deverên Behdînan guhert ji bo Behdînî bi tîpa Erebi û ew jî dû nerînên cuda ligel xwe anî (Khalid, 2015). Hinek ev guhertin wekî maf dibînî û hinek jî ew wekî dabeşkirina Kurdan dibînî. Her çewa be, tiştê xirab ew e ku xwendina Kurdî li Behdînan bi Behdînî ye ne bi Kurmancî. Ez vê pêngavê wekî dabeşkirina Kurmancî di nav xwe de dibînim û hêvî dikim ku Behdînan jî vegere ji bo Kurmanciya standard ku li Rojava û li zanîngêhên Bakurê Kurdistanê tê xwendin. Bi vî rengî, Behdînan dibe pacek ji bo lêk nîzik kirina Kurmancî û Kurdiya Navendî jî. Di van rojan de, di sala 2021 de, wezîra rewşenbîriya herêma Kurdistanê xwestiye ku Hewramî ji di deverên Hewraman bibe zimanê xwendîne (Wezaretê Rewşenbîrî, 2021). Teqez, ev xwest ji aliyê Kurdiya Başûrî jî di salên bê tê kirin. Ji bo vê yekê jî gerek pilana zimanî ya xurt hebe, eger na ziamnê Kurdî dabeşî ser çend zimanên nû dibe. Pirsgirêka standardkirinê di 2009 de gelek hat gengeşekirin. Dema hinek li rewşenbîrên Slêmaniyê xwestin ku Kurdiya Navendî wekî zimanê standard ê Kurdî bê naskirin û ewên din bi riya li dijî vê xwestê sekinîn. Bi giştî dagîrkirina Îraqê ji aliyê Amrîka ve rewşa Kurdên Başûr bi temamî guhert. Xweseriya Başûr rengeke ferî wergirt û bû fêdralîzm. Rewşa xwendina Kurdî ber bi başî çû. Gelek xwendîngêhên Kurdî li navçeyên arîşe li ser ên mîna Kirkûk, Şingal û Xaneqîn hate vekirin. Ejmara xwendîngêh, peymange û zanîngêhan gelek zêde bû. Em dikarin bêjin ku êdî jiyan û xwendin bi temamî li Başûrî bû Kurdî. Serbarî vê yekê jî, pirsgirêkên xwendîngêh û zanîngêhên navneteweyî hêdî hêdî derdikeve û gelek kes zarokên xwe dişînin van xwendîngêhan ku xwendin têda bi zimanên biyanî ye, bi taybet Înglîzî.

Encam

Di vê lêkolînê de em gihaştin çend encamekê, ku li jêr ve bi Kurtî wan dinvîsin:

- Deselata Kurdî roleke mezin ji bo handana Kurdînivîsînê dîtiye û sebaba serekeya derketina nivîsîn bi zimanê Kurdî, zarê Kurdiya Navendî, mîretiya Baban bûye.
- Bi jinavçûna mîretiyên Kurdan di sedsala nozdeyan de, derbeke mezin bi zimanê Kurdî jî ket û pêşxistina vê zimanê heta endazeyekî zêde sekinand. Di hinek medreseyan de giringî bi zimanê Kurdî hatiye dan, lê ew ne bes bûye. Di xwendin û systema perwerdeya Osmaniyan jî cihê zimanê Kurdî tune bûye.
- Piştî têkçûna dewleta Osmaniyan, rewşa Kurdiya Navendî ni berawird bi rewşa zarên din çêtir bûye. Ew jî vedigere ji bo palpiştyiya Înglîzan ji bi mafên çandî û zimanî di Îraqê de, vegeriyana rewşenbîrên Kurd ji bo Slêmaniyê û serheldan û avabûna Komarê Kurdistanê ji aliyê Şêx Mehmûdî Hefîd ve.
- Zimanê Kurdî di Başûrî de bi gelek astengiyan re derbas bûye, lê gav bi gav pêşketiye. Komara Kurdistanê li Slêmaniyê, Komara Kurdistanê li Mehabadê, şoriş û bizavên Kurdî, serhildana Başûrî di sala 1991an de û dagîrkirina Îraqê ji aliyê Amrîka ve di sala 2003yan bandoreke mezin û erênî li ser zimanê Kurdî kiriye.
- Di niha de zimanê Kurdî rûbirû ye li gel du astengên sereke ku dibe çareseriyêke dirûst ji wan re bê dîtin. Yekem: pirsgirêka navbera zarên Kurdî dibe bi rengê û pilaneke zimaniya wisa bê çareserkirin ku her kes bi mafê xwe şad be. Lê ew naye bi vî manayê ku zimanê Kurdî bê parçe parçe kirin û her bajar bi devoka xwe bixwîne. Li vê warê de, gerek pirsgirêka navbera Behdînan û Kurmancî bê çareserkirin. Di çareserkirina vê pirsgirêkê de, mumkîne çareserkirina elîfbêya Kurdî jî hebe. Duyem: xwendîngeh û zanîngehên biyanî roj bi roj zêdetir dibin û di van xwendîngehan de zimanê Kurdî ne zimanê sereke ye û zimanê Înglîzî cihê zimanê Kurdî girtiye. Di vê warê de, gerek wezaretê perwerde û xwendina bilind çareseriyekê bibînin ku di dawiyê de zimanê Kurdî ziyanmend nebe.

Çavkanî

Baban, J. (2012). *Slêmanî şare geşawekem, bergî duwem*. Hewlêr: Dezgeha çap û weşana Aras.

Dîwanî Salim. (2015). *Dîwanî Salim*. (S. Salih, Ed.) Slêmanî: Binkey Jîn.

Dîwanî Şêx Rezay Talebanî. (2003). *Dîwanî Şêx Rezay Talebanî*. (Ş. Xal, & O. Aşna, Eds.)
Hewlêr: Dezgeha çap û weşana Aras.

Hesen, K. (2008). *Xwêndewarî*. Hewlêr: Dezgeha çap û weşana Aras.

Hewêzî, T. (2007). *Mêjûy Koye*. Hewlêr.

Kakesur, M. A. (2003). *Geşekirinî xwêndinî fermî le lîwakanî Kurdistanî Îraq da*. Hewlêr:
Zanîngeha Selahaddîn.

Khalid, H. S. (2015). *The language and politics of Iraqi Kurdistan: from the 1991 Uprising to the Consolidation of a Kurdish Regional Government Today*. Saarbrücken: Lambert Academic Publishing.

Kirmanj, S. (2014). Kurdish History Textbooks: Building a Nation-State within a Nation-State. *Middle East Journal*, 68(3), 367-384.

Malmîsanij, M. (2021). The Kırmanjki (Zazaki) Dialect of Kurdish Language and the Issues It Faces. In C. G. H. Bozarslan, *The Cambridge History of the Kurds* (pp. 663-684).
Cambridge: Cambridge: Cambridge University Press.

Nalî, D. (1985). *Dîwana Nalî*. (M. E. Muderîs, Ed.) Ormiye: Întîşaratî Selahaddinî Eyubî.

Subhan, K. (2018). *Le xeyallewe bo xoll*. Slêmanî.

Wezaretê Rewşenbîrî. (2021, 8 3). *Dawakarî bo wezîrî perwerde*. Retrieved from 46

Xeznedar, M. (2001). *Mêjûy edebî Kurdî*. Hewlêr: Dezgeha çap û weşana Aras.

TECRÛBEYA ENSTÎTÛYÊN ZIMANÊN ZINDÎ LI TIRKIYEYÊ: MÎNAKA ESNTÎTÛYA ZANÎNGEHA MARDÎN ARTÛKLÛYÊ²¹

Şehmus KURT*

Destpêk

Li her dewletê, bi taybetî jî li netewe-dewletan ji bo zimanên kêmayetiyên pênc sekin û meylên sereke hene. Juan Cobarrubias (1983 vgz. Hassanpour, 2005) wan seknan li gor taksonomiyekê, ji ya herî xirêb ber bi ya herî baş ve vî şiklî rêz dike:

- 1- Hewldan ji bo kuştina zimanî
- 2- Misade ji bo mirina zimanî
- 3- Hevreyîna zimana ya bê piştgirî
- 4- Piştgiriya qismî bo zimanan
- 5- Qebulkirina zimanî wek zimanekî fermî

Netewe-dewlet di çarçoveya veguherîna civakê da, digel gelek amûrên dî, qadên perwerde û hînkirina zimanî ji bo belavkirin û serdestkirina zimanê dewletê yê fermî bi kar tînin (Gök 2011, 97). Her bi heman şiklî komên axêverên zimanekî dîtir ji zimanê fermî yê dewletê jî dixwazin zimanê xwe di qadên perwerde û qadên dî yê jiyana civakê da bi kar bînin. Li vê derê berjewendiyên dewletê û berjewendiyên komeke hemwelatîyên wê jêk nagirin. Li gorî herduyan

²¹ Ev xebat qismen pala xwe dide teza doktorayê ya nivîskarî ku sala 2020an li Zanîngeha Dicleyê, Enstîtûya Zanistên Civakî, Beşa Ziman û Çanda Kurdî bi sernavê “Tecrûbeya Hînkirina Kurdî li Tirkîyeyê 1968-2018” hatiye parastin.

* Dr. Lêkolîner, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtûya Zimanên Zindî li Tirkîyeyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî.

jî ziman gelek girîng e û parastina wî û derbaskirina wî bo nifşekî dîtir gelek lazim e, lewre bi vî şiklî hebûna koma axêver a wî zimanî tête berdewamkirin.

Nabe ku li hemberî siyaseten dewletî û hewldanên avakirina hegemonyayê civak mekanîzmayên xweparastin û serhildana zimanî û çandî pêk neyine. Rewşenbîrên kêmine û mêtîngerîyan bi hin rêbazan ve hewl didin ku li hemberî siyaseta pêpeskirin û asîmilasyonê ya netewe-dewletan, ziman û çanda xwe biparêzin. Kemal İnal amaje bi vê yeke dike û dibêje ‘[ji nava her neteweyekî bindest an jî kêmayetî] komeke bijare heye ku bi zimanê [xwe] diaxive, wî derbasî [nifşên nû] dike û wî ji bo gele xwe standardize dike da ku ew ziman bibe semboleke siyasî’ (İnal 2012). Dewlemendkirin û berbelavkirina zimanê neteweyî erk û armanca sereke ye ji bo rewşenbîrên kêmayetîyan. Di wê çarçoveyê da jî standartkirina alfabeya zimanî, nivîsîna bi zimanê xwe, sazkirina derfetan ji bo hînkirina zimanê xwe û berbelavkirina zimanê xwe rêbazên sereke ne ku ji aliyên rewşenbîrên gelên bindest an jî kêmayetî têne bikaranîn ji bo parastin û berdewamiya zimanê xwe. Ev hemû jî bi planasaziyeke zimanî ve mimkûn dibin ku li dûv standardizasyona zimanî digere. Di standardîzasyona zimanekî da yek ji erkên sereke erka perwerdeyê ye. ‘Ji bo perwerdeya bi zimanekî (jî) kitabên dersê, kitabên alîkar bo hînbûnê (ferheng, kitabên gramerê, çavkaniyên sereke), perwerdeya mamosteyan pêwîst in’ (Hassanpour 2005, 481).

KATEGORIYEÊN PLANSAZIYA ZIMANÎ.....

Di vê gotar xwe da dê ewil li ser plansaziya zimanî ya KTê’yê bê rawestan. Piştî hingê dê li plansaziya dewletê ya li hemberî Kurdî û plansaziya navxweyî ya Kurdan bo Kurdî bête pêşkêşkirin da xuya bibe ka herdu aliyên li Tirkîyeyê çî xebat kirinê li hember Kurdî an jî bo Kurdî. Herî dawî bi mînaka Zanîngeha Mardîn Artûkluyê (ZMA) dê li ser Enstîtûyên Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê (EZZT) bi hûrgilî bête sekinandin ku pêngaveke girîng e ji bo plansiya zimanî bo Kurdî li Tirkîyeyê. Li ser mînaka ZMA’yê tecrûbeyê EZZT’an dê li ber çavan bête raxistin û lê bê nêrin ka li wan enstîtûyan, nemaze li entîtûya ZMA’yê xebatên çawa hatine kirin li ser Kurdî.

1. Plansaziya Zimanî li Tirkîyeyê

Komara Tirkiye'yê (K.T.) wek netewe-dewletekê li ser bermayîyên Dewleta Osmanî hatiye avakirin. Digel ku li KT'yê kêmayetiyên ziman û dînî hene, wê ji avakirina xwe pê ve berê xwe daye netewesaziyekê li dor Tirkbûnê. Tirkiye'yê ji bo neteweya nû zimanê Tirkî hîlbijartiyê û politikaya perwerdeya wisa avakiriyê ku ziman û çandên neteweyên dîtir bêne paşguhkirin, înkarkirin, qedexekirin û asîmîlekirin. Ji ber ku netewe-dewlet zimanî ji bo xwe dikin qada desthilatîyê û cihê jiyanê nahêle bo zimanên cudatir ji zimanê fermî yê dewletê (Doğan 2012, 134). Bi gotineke zelaltir, li hemberî zimanê kurdî sekina KT'yê dikeve nav çarçoveya herdu xalên ewil ên Cobarrubias (1983) destnîşankirî. Ji bo hem zimanê tirkî li welatî belav bike û nasnameyê neteweyî ya li dor tirkbûnê avabûyî bide hemwelatîyên xwe, hem jî rê li ber çand û zimanên dîtir bigire û wan ber bi asîmîlekirinê ve bikêşe, Tirkiye'yê sûd ji saziyên perwerdekirinê wergirtiye. Digel saziyên wek mektebên rojane, Tirkiye'yê mektebên leylî, mektebên gelî, Ocaxên Tirkî, Malên Gelî bi kar anîne ku bigehe armancên xwe yê berbelavkirina zimanê tirkî û asimilasyona zimanên dîtir. Ji ber ku mekteb, wek ku di van gotinên jêrîn ên İkrâm Doğan (Doğan 2012, 120) da aşkere xuya dibe, mekanîzmaya herî kêrhatî û berhemdar e ji bo netewe-dewletan ji bo avakirina nasnameyê û berbelavkirina zimanê standart digel gelek ideolojiyên dîtir.

‘Wek gewdeyekî mekteb dibe mekanek ku lê simbolên nasnameya neteweyê têne avakirin, axa niştimanî tête pîrozkirin û canfedayiya ji bo wê axê tête qedirbilindkirin. Dîsa li mektebê çîrokên lehengiyê têne çêkirin an jî yên nûkeşkirî têne berbelavkirin, zimanê fermî tête yektîpkirin û berbelavkirin.’

2. Plansaziya Zimanî li Tirkîyeyê bo Kurdî

Wek encama vê paradîgmayê li seranserê dîroka KT'yê zimanê kurdî, ku ji aliyê hejmara axêveran ve piştî tirkî di rêza duyê da ye, wek fermî ti car nehatiye nasîn, her dem tûşî qedexeyan bûye (Arslan 2015; Cemiloğlu, 2009; Skutnabb-Kangas, 2000; Yeğen, 1996; Zeydanlıoğlu, 2012; Öpengin, 2010) lewma wek zimanê devkî û nivîskî paş da maye, heta berdewamiya wê ketiyê xetereyê ji ber ku niha temamê axêverên zimanê kurdî bûyîne kesên duziman. Ew duzimanîyê asimetrik e û asîmetrî li alehê kurdî da ye (Çiçek 2013).

Gelek akademisyen û vekolerên ku li ser kurdan û zimanê kurdî xebatan rêvedibin, wisa amaje pê kiriye ku ji nava dewletên di yên ku kurd lê dijîn, KT'yê di warê siyasetên li hemberî

kêmayetiyân, bi taybetî jî di warê ziman û perwerdeyê da li cihekî cuda ye û xwedan rêbazên taybetî xwe ye (Zeydanlıoğlu 2012, Öpengin 2010, Hassanpour 2000, Hassanpour 2005, Arslan 2015, Derince 2013). Skutnabb-Kangas û Fernandas di gotara xwe da ku mafên perwerdeyî yên zimanî yên li Tirkiye û Iraqê dayîne ber hev, li gorî standardên navneteweyî û mafên zimanî Tirkiye yek ji xirabtirîn tetbîqkeran e, belkî jî tetbîqkera herî xirab (Skutnabb-Kangas ve Fernandes, Kurds in Turkey and in (Iraqi) Kurdistan: A Comparison of Kurdish Educational Language Policy in Two Situations of Occupation 2008, 49). Jixwe heta destpêka salên 1990î hema bêje axaftina bi zimanê ji bilî tîrkî qedexe bû, nexasma perwerde û wergirtina xizmetguzariya sivîl. Lewma vê rewşê herî zêde tesir li kurdîyê kiriye.

Di mînaka kurdan da jî, rewşenbîrên kurd hem di serdema dawî ya Dewleta Osmanî da hem jî li Komara Tirkiyeyê hewleke wisa ya cuda nîşan dayîne li hemberî pergela perwerdeya van dewletan. Emîr Hesênî (Hassanpour 2005, 157-159), veguherîna perwerdeya deya Osmanî û rolê wê di gihandina nîfşekî yê xwenda da wisa rave dike:

‘Rêveberiya Osmanî di dawîya sedsala 19an da li hemû eyaletên Kurdan bi cih bû. Wek encama sereke ya vê bicîhbûnê vebûna mektebên modern e. Li wan mekteban cudatir ji koma xwendewar ya dînî û aristokrat, komeke nû ya rewşenbîran geştiş. ... [D]erdora xwende ya di sedsalên berê da yeke biçûk bû û di eslê da ji derdorên dînî bû. Lê di dawîya sedsala 19an da xwendewarî pêşda çû û çîneke rewşenbîr a laîk sekûler peyda bû.’

Li gor Cuma Çiçek, li seranserî tarîxa Komara Tirkiye’yê, kurdan bi pêşengiya xwenda û rewşenbîrên xwe ji bo parastin û pêşvebirina zimanê xwe şeş faktorên sereke hilberîne û tetbîq kirine: (1) Xebatên ziman û weşanê ku wek Ekola Hawarê an jî Ekola Şamê tene zanîn û bi pêşengiya Celadet Âlî Bedirxan û birayê wî Kamûran Âlî Bedirxan ve li Şamê hatine rêvebirin; (2) Medreseyên Kurdî; (3) dengbêjî û mûzîka kurdî; (4) weşanên bi kurdî yên radyoyên Êrîvan û Bexdayê; (5) weşangeriya bi kurdî li Tirkiyeyê di navbera salên 1960 û 1980yan da; (6) Ekola Diyasporaya kurdî li Awrûpayê (Çiçek 2013, 15).

Em dikarin xebatên li ser zimanê kurdî û hinkirina zimanê kurdî jî wek faktorekê zêde dikim li ser yên Cuma Çiçekî pêşniyazkirî. Wek tete zanîn ji bilî xebatên li derveyî sînorên Tirkiyeyê, ji salên 1960î pê ve kurdên li Tirkiyeyê jî berê xwe dane xebatên li ser zimanê xwe. Wek encama wan xebatan sala 1965an Kemal Badıllı pirtûkeke rêzimana kurdî bi navê *Türkçe*

Îzahli Kürtçe Grameri (Kurmanci Lehçesi) (Badıllı 1965) amade kir. Piştî vê xebatê M.E. Bozarslan sala 1968an pirtûkek hînkirina alfabeya kurdî bi navê *Alfabe* derxist. Sala 1969an jî Musa Anter ferhengeke bi kurdî-tirkî çap kir. Herçend ew hersê xebatên ewil ên bi kurdî û li ser kurdî di cih da tûşî qedexeyan hatin û li ser nivîskar û amadekarên wan lêpîrsîn hatine vekirin û ew xebat ji piyaseyê hatin berhevkerin jî bi awayekî veşartî her di nava kurda da, bi taybetî di nava xwendekar û rewşenbîrên kurdan da berbelav bûn. Bi wê berbelavbûnê ve jî ew xebatên pêşeng bûne materyalên ewil ji bo hînkirina kurdîya nivîskî li derdorên nepenî. Li gor dîtina min, hem di pêşveçûna weşangeriya bi kurdî li Tirkîyeyê û hem jî perwerde û hînkirina kurdî ya nispeten nû da rol û cihê van berhemên ewil bêhempa ye.

Sala 1991ê qedexeya li ser bikaranîna kurdî li çapemeniyê rabû. Piştî hingê heftenameya *Welat* (1992) û mehnameya *Nûbihar* (1993) bûn weşanên ewil ên perîyodîk. Paşî sala 1993yan Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê (EKS) ji aliyen komeke rewşenbîrên kurd hate avakirin. Li EKSê ligel xebatên dî yên li ser ziman, edebiyat û folklorê, kurs hatine vekirin ji bo dersên kurdî. Bi avabûna EKS û wan dersên kurdî yên li bin banê wê serdemeke nû dest pê kir di xebatên li ser kurdî li Tirkîyeyê. Bi xebatên EKSê ve li seranserî salên 1990î nîşekî nû yê kurdan peyda bû ku bi kurdî dixwend û dinivîsî.

Li dûv pêşveçûn û geşedanên bi kurdî û li ser kurdî li qada sivil, li qada dewletî jî hinek pêngavan rûyê kurdî û perwerdeya kurdî guherand. Li Tirkîye'yê, berevajiyê serdemên avakirinê û serdemên midaxeleyên leşkerî ku siyasetên înkâr û asîmilasyonê zêdetir bûn, hînkirina zimanên ji bilî tirkî û perwerdeya bi wan zimanan piştî sala 2002yan regekî nû girt. Bi saya veguherînên huqûqî, sala 2003yan bi destura Wezaretê Perwerdeya Neteweyî (WPN) ya Tirkîyeyê ve li kursên taybet rê li ber hînkirina zimanên ji bilî Tirkî vebû. Piştî wê guherînê li 14 bajar û navçeyên Kurdan kursên taybet vebûn ji bo hînkirina kurdî. Piştî wergirtin û perwerdeya zêdetir ji 2000 xwendekar û mezûnkirina zêdetir ji 1500 xwendekaran van kursan ji ber sedemên aborî, rêvebirî û siyasî bi biryareke giştî xwe fesih kirin (Çavkanî).

3. Kurdî Li Saziyên Akademîk: Enstîtûyên Zimanên Zindî

Li dîroka Komara Tirkiyeyê (K.T.) Kurdî cara ewil di sala 2009an de bi vekirina Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê (EZZT) ve kete saziyên fermî²² yên akademîk (Adak, 2019). Enstîtûya ewil li jêr banê Zanîngeha Mardîn Artûklu (ZMA) vebû. Li bin banê vê enstîtûyê sê şaxên makezanistan hatine vekirin: Şaxemakezanista Ziman û Çanda Kurdî, Şaxemakezanista Ziman û Çanda Erebi û Şaxemakezanista Ziman û Çanda Sûryankî. Dûv ra sala 2012an li Zanîngeha Bîngolê (ZB), sala 2013an li Zanîngeha Wan Yüzüncü Yilê (ZYY) jî bi heman navî enstîtû hatine vekirin. Herçend li enstîtûya ZMA û ya Yüzüncü Yilê çu ferq di navbera zaravayên Kurdî de nehatibe dîyarkirin jî li enstîtûya Zanîngeha Bîngolê, Şaxemakezanista Ziman û Edebiyata Kurdî û Şaxemakezanista Ziman û Edebiyata Zazakî du bernameyên jêk cudatir hatine vekirin (bingol.edu.tr). Li van enstîtûyan bernameyên lîsansa bilind a bitez yên Kurdî, bi awayê bitez û bêtez tene rêvebirin û hersê entîtû jî di bernameyên xwe da çalak in. Ji bilî van enstîtûyên serbixwe yên xebatên li ser ziman, çand û edebiyata Kurdî, li sala 2013an Zanîngeha Mûş Alparlanê û sala 2014 Zanîngeha Dîcleyê (ZD) li bin banê Enstîtûya Zanistên Cîvakî, şaxemakezanistên Ziman û Çanda Kurdî hatine vekirin. Herwiha li jêr banê Zanîngeha Sêrtê enstîtûyeke ku bi awayê sazûmaniyê ve li ber mînaka Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê (EZZT) ya Zanîngeha Artûklûyê hatiye vekirin. Lê belê li vê enstîtûyê heta niha çu bernameyên lîsansa bilind venebûne.

Tablo 1. Enstîtûyên Zimanên Zindî û Bernameyên Xwendina Bilind a bi Kurdî li Tirkiyeyê

Zanîngeh	Enstîtû / Fakulte.	Şaxa Makezanistê	Bername	Rewşa niha
Zanîngeha Mardin Artuklu	Enstîtûya Zimanên Zindî	Ziman û Çanda Kurdî	Bernameya Lîsansa Bilind a Bitez û Bêtez a Kurdî	2010an vebû. Hêj jî aktîf e.

²² Berê wê Kurdî (Kurmançî) li hinek zanîngehên taybet wek derseke bijarte hatiye vekirin. Ji bo zêdetir agahiyan bnr. Kurt, Ş. (2020) ...

Zanîngeha Bîngolê	Enstîtûya Zimanên Zindî	Ziman û Edebiyata Kurdî Ziman û Edebiyata Zazakî	Bernameya Lîsansa Bilind a Bitez û Bêtez a Kurdî Bernameya Lîsansa Bilind a Bitez û Bêtez a Zazakî Bernameya Doktorayê (digel Zanîngeha Mûşê)	2012an vebû. Hêj jî aktîf e.
Zanîngeha Van YY	Enstîtûya Zimanên Zindî	Zaşman û Çanda Kurdî	Bernameya Lîsansa Bilind a Bitez û Bêtez a Kurdî	2013yan vebû. Hêj jî aktîf e.
Zanîngeha Mûş Alparslan	Enstîtûya Zanistên Civakî (SBE)	Ziman û Edebiyata Kurdî	Bernameya Lîsansa Bilind a Bitez û Bêtez a Kurdî	2012an vebû. Hêj jî aktîf e.
Zanîngeha Dicle	Enstîtûya Zanistên Civakî (SBE)	Ziman û Çanda Kurdî	Bernameya Lîsansa Bilind a Bitez û Bêtez a Kurdî Bernameya Doktorayê	2014an vebû. Hêj jî aktîf e.
Zanîngeha Siirt	Enstîtûya Zimanên Zindî	Ziman û Çanda Kurdî	Bername vebûye	2014an vebû. Heya niha qet xwendekar negirtine.


Ji bilî Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê (EZZT), li Zanîngeha Mardîn Artûklûyê, sala 2012an li jêr banê Fakûlteya Edebiyatê Şaxemakezanista Zimanên Rojhilatê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî jî hate vekirin. Wê beşê ji sala 2012an wêdetir xwendekar wergirtine û derçûyên xwe yên ewil sala 2015an dane, beşa navborî hêj jî çalak e (artuklu.edu.tr). Herwiha li

Zanîngeha Mûşê jî Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî û li Zanîngeha Bîngolê jî Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî û Beşa Ziman û Edebiyata Zazakî du beşên cuda û li Zanîngeha Mûnzûrê jî Beşa Ziman û Edebiyata Zazakî vebûye. Zanîngeha Mardîn Artûklûyê wek ku di vebûna EZZT û Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ya lîsansê roleke pêşeng lîstiyê, herwisa di warê dersên Kurdî yê hîlbijartî yê li zanîngehan jî bûye pêşeng. Ji sala 2011an û pê ve li gelek beşan hefteyê du saetan darsa hîlbijartî ya Kurdî tete dayîn. Gelek xwendekarên ji beşên cuda cuda vê dersê hildibijêrin. Heman dersên hîlbijartî dîv ra li Zanîngeha Dîcleyê, Zanîngeha Bîngolê, Zanîngeha Mûş Alparslanê ji bo xwendekarên beşên cuda hatine vekirin. Ji bilî dersên hîlbijartî ku ji bo xwendekarên zanîngehê dihatine vekirin, bi rêya kursên zimanê Kurdî yê ku li bin banê van zanîngehên navborî û zanîngehên dî yê herêmê, wek Zanîngeha Batmanê, Zanîngeha Hekkariyê û Zanîngeha Şirnexê, girseyeke mezin ya esnaf, karmend û hemwelatîyên sîvîl darsa zimanê Kurdî di astên jêk cuda da wergirtine.

Bi vebûna beşên lîsan û bernamên lîsansa bilînd û herwiha bi dersên hîlbijartî li beşên cuda yê zanîngehan û qursên Kurdî yê bo hemwelatîyan ve Kurdî li saziyên akademî yê bajarên Kurdnişîn binecih bû. Bi saya serê wan beşê û bernamayan Kurdî li Tirkîyeyê gehîşt asta herî bilînd di ware *plansaziya statûyê* (status planning) da. Herwiha xêra wan xebatan di warên *plansaziya naverokî* (corpus planning) û *plansaziya zimanwergirtinê* (acquisition planning) da jî çêbû, lewre hem kêr zêde formeke zimanê nivîsînê pêk hat an jî xurt bû û hewiha wî formî ji bo belavbûnê ji xwe ra rê û derfetên nû peyda kirin. Di vê babetê da Necat Keskîn dibêje ku êdî mirov dikare behsa ‘akademîyeye Kurdî’ bike li Tirkîyeyê:

‘beşên ziman û edebiyata kurdî yê enstîtuyên zimanên zindî rê dide ku mirov li Tirkîyeyê behsa **akademîyeye kurdî** bike. Ji akademiya kurd mebest ew e **ku vekolîn û lêgerinên derbarê ziman, edebiyat û çanda kurdî de bi zimanê kurdî, bi navê kurdî, bi rêbazên zanistî bîn kirin**. Ev yek jî îro li Tirkîyeyê bêhtir di bin banê Enstîtuyên Zimanên Zindî û beşên Ziman û Edebiyata Kurdî/ Ziman û Çanda Kurdî de tên kirin ku tenê li Zanîngehên herêmên kurdnişîn in” (Keskin, 2018:472, kirpandin yê min in)

Şikil 1- Tezên beşên Kurdî li gorî rêjeya qadan (Aykaç û yê din, 2019; 1014).



Bi rastî gava mirov li xebat û çalakîyên akademîk yê li enstîtû û beşê Kurdî dinêre, piştî serdemeke dirêj ya polîtîkayên aşkere û nepenî yê asîmîlasyon û ‘Dij-kurdolojiyê’ (Mehmet Bayrak ???; Malmîsanîj ???) ji bo cara ewil xebatên li ser Kurdan û Kurdî bi zimanê Kurdî pêk hatine. Bo mînak bi Kurdî xebat, lêkolîn û weşanên di qewareya tez û gotar derketinê meydanê û her diçe hejmara wan zêdetir dibe. Aykaç ên dî (2019) di xebata xwe ya bîbliyografîk da li beşên Ziman û Çanda Kurdî an jî Ziman û Edebiyata Kurdî yê li jêr banê zanîngehê dewletî, di navbera salên 2011-2018an da 241 tezên lîsansa bilind hatine amadekirin. Hejmara projeyên lîsansa bilind a bêtez hêj ji vê hejmarê gelek zêdetir e. Herwiha di xebateke dîtir ya bîbliyografîk da têde dîyarkirin ku li Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî û Beşa Ziman û Edebiyata Zazakî û li gel bernameyên EZZT’ya Zanîngeha Bîngolê di navbera salên 2013-2018an da 46 tezên lîsansa bilind a bitez, 103 projeyên xilaskirinê yê lîsansa bilind a bêtez û 100 tezên xilaskirina lîsansê hatine amadekirin. Digel wan tezên lîsans û lîsansa bilind, Zanîngeha Bîngolê û Zanîngeha Mûş Alparslanê sala 2016an bernameya doktoraya Ziman û Edebiyat Kurdî ya hevpar vekirinê. Li Tirkiyeyê cara ewil di vê bernameyê da sala 2019an, tezeke doktorayê bi Kurdî hate parastin. Li kêleka xebatên lîsansa bild û doktorayê, kovara akademîk ya EZZT’ya Mardîn Artukluyê bi nave *The Journal of Mesopotamian Studies (JMS) Dergisi* (<http://jms.artuklu.edu.tr/tr/>), kovara akademîk ya EZZT’ya Zanîngeha Bîngolê bi navê *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* (<https://dergipark.org.tr/tr/pub/buydd>) û kovara akademîk ya EZZT’ya Zanîngeha Van

Yüzüncü Yilê bi nave *Kurdiyat* (<https://dergipark.org.tr/tr/pub/kurdiyat>) cih didin xebat û lêkolînên bi Kurdî.

Tablo 2. Derçûyên Enstîtûyên Zimanên Zindî li Tirkîyeyê- Heta 2020an²³

Enstîtû	Derçû	Sercem
Zanîngeha Mardin Artukluyê	155 (Bitez-Kurmanî û Zazakî) 955 (Bêtez-Kurmanî û Zazakî)	1060
Zanîngeha Bingolê	Kurmancî - 3 (Doktora – Bernameya hevpar li gel Zanîngeha Mûş Alparslanê) Kurmancî - 34 (Bitez) Kurmancî - 47 (Bêtez) Zazakî - 33 - (Bitez) Zazakî – 69 (Bêtez)	186
Zanîngeha Yüzüncü Yilê	62 (Bitez- Heta 2018an)	62
Zanîngeha Mûş Alparslan	18 (Bitez-Heta 2018an)	18
Zanîngeh Dîcleyê	10 (Doktora) 12 (Bitez) 86 (Bêtez)	108
SERCEM		1434

4. Enstîtûyên Zimanên Zindî – Mînaka Zanîngeha Mardîn Artukluyê

²³ Agahî hejmarên vê tabloyê bi pêwendiya li gel rêvebir an jî karmendên enstîtûyan hatine wergirtin. Agahiyên heta 01.11.2020 têde hene. Ji ber ku ji Zanîngeha Van Yüzüncü Yil û Zanîngeha Mûş Alparslanê tu kesê bersiva pirsên me yên derheqê mijarê nedan, agahşiyên wan ji xebata Aykaç û yên din (2019) hate wergirtin.

Ber bi dawiya salên 2000î ji ber aramî û serbestîya Pêvajoya Aştiyê (Çözüm Süreci) (Çiçek, 2018) daxwazên hînkirina Kurdî, perwerdeya Kurdî li mektebên dewletî û vekirina beş û bernameyên li sazî û dezgehên akademîk berbelavtir û aşkeratir bûn.²⁴ Li ser hindê bi peyamên erênî ji Saziya Xwendina Bilind (SXB- Yükseköğretim Kurumu-YÖK) û serlêdanan 10î Berfanbara 2009an li Zanîngeha Mardîn Artûklûyê (ZMA) bi navê Enstîtûya Zimamanê Zindî li Tirkîyeyê (EZZT) enstîtûyek hate vekirin (<https://www.artuklu.edu.tr/yasayan-diller-enstitusu/tarihce>). Herçend rêveberiya wê demê ya zanîngehê li hêviya vekirina enstîtûyeke bi navê ‘Enstîya Xebatên Kurdnasiyê (Kürdoloji Enstitüsü) be jî (Bianet, 2009) piştî vebûna enstîtûyê ewil Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî hatiye çalakkirin û bi wergirtina akademîsyenan yan jî peywirdarkirina ji beşên dîtir bo enstîtûyê demildest karên akademîk û wergirtina xwendekaran dest pê kiriye. Li enstîtûyê xebata ewil ya karên akademîk û perwerdeya Kurdî, ‘Qursa Perwerdekariya Kurdî (Kürtçe Okutmanlık Kursu)’ e ku sala 2010an piştî ezmûnekê bi 50 xwendekaran hatiye vekirin (CNN Türk, 2010). Ev qursa naborî ji gelek aliyan ve nîşaneyê kar û kiryarên erênî bû li warên hînkirina Kurdî û perwerdeya bi Kurdî²⁵ yê paşerojê li Tirkîyeyê. Lewra perwerdekirin û gihandina mamosteyan hem nîyeta vekirina enstîtûyên mînak li zanîngehên dîtir aşkere dikir hem jî nîşaneyê hînkirin an jî perwerdeya bi Kurdî bû li mektebên dewletî, ku jixwe ev herdu pêngav jî bi dorê hatine avêtin (bnr. Kurt, 2020).

4.1. Bernameyên Lîsansa Bilind

Piştî ‘Qursa Perwerdekariya Kurdî, ji sala 2010an li bin banê Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî du bernameyên lîsans bilind hatine vekirin: 1) Lîsansa Bilind a Bitez²⁶ ku piştî saleke dersan, saleke amadekirina tezekê dixwaze; 2) Lîsansa Bilind a Bêtez²⁷ ku piştî serdemeke dersan saleke amadekirina projeyeke qedandinê dixwaze ji sala 2011an pê ve dest bi wergirtina

²⁴ **Derheqê van daxwazan û pratikên dewletê bnr. Kurt, Şehmus. Teza doktorayê.**

²⁵ Ev herdu têgehên ji hev cuda ne. Ji bo zêdetir agahiyên bnr. Derince; Önen li pirtûka edîtoriyal.

²⁶ Armanca vê bernameyê gihandina lêkolîner û akademîsyenan e ku li qada Xebatên Kurdnasiyê li ser ziman, edebiyat, folklor, dîrok, erdnîgarî hwd. ya Kurdan xebatanên akademîk pêk bînin.

²⁷ Ev bername wek Bernemaye Sertifikaya Mamostetiya Kurdî (Kürtçe Öğretmenlik Sertifika Programı) jî tete zanîn û derçûyên wan, heke xwedî formasyona mamostetiye bin, wek mamosteyên Kurdî bêne tayînkirin. Jixwe nîfê ewil yê mamosteyên Kurdî ku li dibistanên navîn ji bo dersên Kurdî yê hilbijartî hatibûne tayînkirin, ji wan derçûyên ve bernamaya sertifikayê bûn. Lê piştî derçûyên bernameyên lîsansê çêbûn, êdî mafê pêşaniyê gehiştê wan û derçûyên Lîsansa Bilind a Bêtez ji bo tayînkirinê ketine rêza dûyê.

xwendekaran kirin. Bernameye û naveroka dersên van herdu bernameyan her yek e û ji aliyê heman mamosteyan ve tête dayîn. Tekane ferq di navbera wan da hejmara saetên dersan û kûrahiya mijaran e.

Herdu bername jî di xebatên xwe da çalak û her sal bi ezmûneke nivîskî û mullaqatê xwendekaran werdigirin.²⁸ Wek li jor jî hate diyarkirin heta niha ji herdu bernameyan 1060 xwendekar mezûn bûne. Gava mirov li listeya mijarên tezên lîsansa bilind a EZZT ya Mardîn Artûkluyê (Aykaç û yê din, 2019) dinêre tête dîtîna ku ji qadên cuda yê zimannasiyê bigire heta perwerde, çapemenî û dîrokê li ser qadên cuda yê zanistên civakî û zimanî tez hatine amadekirin lê belê herî zêde li ser mijarên edebiyat klasîk a Kurdî, folklor û edebiyata gelêrî, edebiyata nû tez hatine amadekirin. Sedemê van tercîhan jî di hindê da ye ku pisporîya akademîsyenên Şaxamakezanista Ziman û Edebiyat Kurdî bêtir li ser wan qadan e û bivênevê berê xwendekar zêdetir çûye xebatên li ser wan qadan.

4.2. Xebatên Akademîk (Komxebat-Sempozyum-Semîner)

Enstîtûyên xebatên akademîk û zanistî ji bilî gihandina xwendekar û lêkolîneran bi kar û barên akademîk yê wek komxebat (workshop), sempozyum, kongre, semîner û panelan jî ve mijûl dibin û ev karên hanê wek xebat û armancên sereke yê sazîyên akademîk tene hesabandin. Her bi heman şiklî, li Zanîngeha Mardîn Artûkluyê, Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî ya Enstîtûya Zimanên Zindî yê Tirkiye'yê digel karên wergirtina xwendekarên lîsansa bilind û perwerdeya wan li bernameyên bitez û bêtez, hinek kar û civînên akademîk jî pêk anîne ku di warê xebatên Kurdî yê li Tirkiyeyê da hem yê ewil hem jî pêşeng in.

Ji van xebatan ya ewil komexebateke hevpar bû li ser bikaranîna Kurdî di felsefeyê da. Ev komxebat ji aliyê Beşa Felsefeyê û Şaxamakezanista Ziman û Çanda Kurdî, 25-25 Çirîya Pêşîn 2013an da bi sernavê 'Di Zanistên Mirovî û Civakî de Bikaranîna Kurdî: Felsefe bi Kurdî [1]' hate lidarxistin. Di komxebatê da îmkân û sînoren bikaranîna Kurdî di felsefeyê da bi beşdariye akademîsyenên Kurd û Kurdologên biyanî ve ji gelek aliyên hate nîqaşkirin, wekî 'ziman û felsefe', 'kirin û karîna di felsefeyê de', 'têgehên felsefî', 'felsefe û polîtîka', 'Kurd û felsefe'. Herçend komxebat wek xelesa ewil ya komxebatên li ser bikaranîna Kurdî di zanistên civakî de

²⁸ Piştî ezmûna nivîskî mullaqat tenê ji bo bernameya bitez dihate kirin. Lê ev sê sal in, ji bo vê bernameyê jî tenê ezmûna nivîskî tête kirin.

hatibû plansazkirin jî, piştî komxebata ‘Felsefe bi Kurdî [1]’ tu xebatên dîtir ên bi vî rengî pêk nehatin.

Xebateke din a akademîk jî bi sernavê *Sempozyuma Edebiyata Berawirdî: Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî* (2014) ve bi hevpariya EZZT Şaxemakezanista Ziman û Çanda Kurdî û Şaxemakezanista Ziman û Edebiyata Tirkî ya Zanîngeha Boğaziçi’ye hate lidarxistin.²⁹ Di vê sempozyumê da bi beşdariya akademîsyenên ji herdu zanîngehan gotarên li ser edebiyatê klasîk, modern û gelêrî yên Kurdî û yên Tirkî hatine pêşkêşkirin. Di van gotaran da edebiyatên herdu zimanan ji biwarên nasnameyî, îmajî, serdestî û kolonyalî ve hatine nîqaşkirin.

Ev sempozyuma navborî ji du aliyan ve gelek girîng bû: Yek, ji ber ku sempozyum bi hevpariya Zanîngeha Boğaziçi’yê -ku zanîngeha herî qedirbilind e li akademîya Tirkiyeyê- pêk hatibû, ev çalakiya akademî bû nîşaneyê qebûla EZZT û xebatên wê ji aliyê civata akademîk ve. Du, ew sempozyum bû yek ji nîşaneyên ewil bo pejirandina zimanê Kurdî wekî zimanekî akademîyê li Tirkiyeyê. Lewre piştî serdemeke dirêj ya înkâr û piçûkxistinê, êdî zimanê Kurdî bi saya EZZT ketibû akademîyê û bi ya me ji aliyê statû û prestîja zimanê ve li gehîştibû asta herî bilind (bnr. Kurt, 2020), lê belê dîsa jî li ser Kurdî nîqaşên kêrhatiya wî wekî zimanê zanist û nexasma perwerdeyê hêj jî berdewam bûn.

Sala 2017an civîneke dîtir ya akademîk li ser edebiyata Kurdî, li jêr banê EZZT’ya Mardîn Artûkluyê hate lidarxistin. Ew civîn bi sernavê ‘Komxebata Navneteweyî li ser Klasîkên Suryanî, Erebi û Kurdan’ bi beşdariya akademîyen û pisporên qadê ji zanîngehên cuda yên Tirkî û Rojhilata Navîn pêk hat.³⁰ Li şûna berawirdkirin û nîqaşên hevkarîgeriya berhem û edebiyatên klasîk ên Suryanî, Erebi û Kurdî, sempozyum wek danasîna berhemên klasîk û şexsiyetên edebî yên girîng ên van hersê gelan pêk hat û pêşkêşiyên hatine kirin jî bi piranî li ser wê xetê bûn.

Digel xebatên akademîk yên wek sempozyûm û komxetabat, ji sala 2017an heta sala 2019an xebteke dî ya nîv akademîk jî li jêr bane EZZT ya Mardîn Artukluyê pêk hat. Ew xebateke rêzesemîneran bû bi nave *Rêzesemînerên Kurdî- Sohbetên Dîwankî* û ewil sala 15 rojan carekê,

²⁹ Ji bo pirtûka metnên pêşkêşiyên vê sempozyûmê bnr: Esen, N.; Çeçen, R. (Amd.) (2015). *Sempozyuma Edebiyata Berawirdî: Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, Mardîn: Mardîn Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınlar.

³⁰ Ji bo pirtûka metnên pêşkêşiyên vê komxebatê bnr: Doru, M.S.; Kırcan, A.; Aykaç, Y. (Edt.). *Süryani, Arap ve Kürt Klasikleri: Uluslararası Klasikler Çalıştayı Bildirileri*, Mardîn: Mardîn Artuklu Üniversitesi Yayınları.

sala duyem jî mehê carekê li ser mijarên xebatên Kurdî û zanistên civakî bi beşdariya pisporekî qadê li avahiyê enstîtûyê dihat lidarxistin. Hem xwendekarên enstîtûyê bi xwe yên lîsansa bilind, hem jî xwendekarên Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî û xwendekarên beşên dîtir yên lîsansê wek guhdar dihatine semînanan. Herwisa akademîsyenên enstîtûyê û yên beşên dî jî li piraniya semîneran wek guhdar amade dibûn. Girîngiya vê xebatê da di hindê da bû ku ew rêzesemîner bûbûn cih û derfeta ji bo pêşkeşî û nîqaşên li ser mijarên cûr bi cûr yên qada xebatên Kurdî û herwisa qadên dîtir yên zanistên civakî.

4.3. Weşanxaneya Enstîtûyê- Pirtûkên Hatine Amadekirin û Çapkirin

Ji bilî karên akademîk, li bin banê xebatên weşangeriyê jî hatine pêk anîn. Ji bo birêvebirina van karan bi navê Weşanxaneya Enstîtûya Zimanên Zindî yên Tirkîyeyê [Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları] weşanxaneyek jî hatiye avakirin. Heta sala 2016an jî li bin banê weşanxaneya enstîtûyê pirtûk hatine çapkirinê, lê dûvra xebatên weşanxaneyên sekînine û piştî wê salê xebatên weşangeriyê tenê li banê Weşanên Zanîngeha Mardîn Artukluyê [Mardin Üniversitesi Yayınları] hatine birêvebirin. Li vê weşanxaneyê jî çend weşanên bi Kurdî û li ser Kurdan hatine weşandin (bnr. li jêr). Li weşanxanaya EZZT’ê hem pirtûkên dersên şaxamakezanistê, hem xebatên lêkolînî û berhevkarîyê jî hatine çapkirin. Lîsteya weşanên enstîtûyê wiha ye:

1. Yıldırım, K. (2012). *Temel Alıştırma Ve Metinlerle Kürtçe Dilbilgisi (Kurmanci Lehçesi)*. Mardin: Mardin Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
2. Kasımoğlu, A. (2013). *Ferhenga Navên Nebatan a Kurdî – Kürtçe Bitki Adları Sözlüğü*. Yıldırım, Kadri (Ed.). Mardin: Mardin Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
3. Güntaş Aldatmaz, N. (2013). *Sanîkanê Mamekîya Ra*, Mardin: Mardin Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
4. Yıldırım, K. (Haz.) (2013). *Melayê Arvasî'nin Tıp Kitabı*. Mardin: Mardin Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
5. Yıldırım, K.; Lezgîn, R.; Bingöl, İ. (2013). *Edebiyatê Kirmanckî Ra Nimûneyî*. Mardin: Mardin Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.
6. Yıldırım, K.; Aslan, M.; Pertev, R. (2014). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. Mardin: Mardin Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

7. Esen, N.; Çeçen, R. (Amd.) (2015). *Sempozyuma Edebiyata Berawirdî: Ji Duh Heta Îro di Edebiyatên Tirkî û Kurdî de Texeyulên Nasnameyî*, Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

Li EZZT’ya Mardîn Artukluyê ji bilî amadekirin û çapkirina pirtûkên lêkolîn û akademîk, herwisa pirtûkên hînkirina Kurdî (Kurmancî/Zazakî) jî hatine amadekirin. Ji van xebata ya ewil projeya amadekirina pirtûkên Kurdî bû ji bo dersên hişbijartî yê li dibistanên navîn.³¹ Ji bo amadekirina wan pirtûkan ji mamoste û akademîsyenên enstîtûyê komîsyonek hate avakirin.³² Wê komîsyonê da ber xwe ku rêzêpirtûkên dersa amade bikin bi sernavên wekî *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 5*, *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 6*, *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 7* û *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 8*.³³ Wê komîsyonê, li gor plana amadekirinê *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 5* amade kir û pirtûk sala 2012n ji aliyê Wezaretê Perwerdeya Millî ve hate çapkirin. Dûvra pirtûkên *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 6* û *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 7* bi hevra piştî navbereke bi çar salan, sala 2016an dîsa ji aliyê wezaretê ve hatine çapkirin. Herçiqas *Kurdî (Kurmancî/Zazakî) 8* jî ji aliyê komîsyonê ve hatibe amadekirinê jî wezaretê ew çap nekiriye. Ev pirtûkên hanê ewiltirîn pirtûkên hînkirina Kurdî ne ku ji aliye Wezaretê Perwerdeya Millî ve hatîne çapkirin û li dibistanên dewletî hatine belavkirin. Bi vê yekê ve Kurdî, wek zimanek ji zimanên pergela perwerdeya li Tirkiyeyê cihê xwe girt. Herwisa ew pirtûk bi rêya xwendekarên ku dersên Kurdî hîlbijartine, ketine bi dehhezaran malan û bi wî awayî rê vekirine ku Kurdîya nivîskî li nav Kurdên li Tirkiyeyê berbelav bibe (Kurt, 2020).

Li EZZT ya Mardin Artukluyê, digel amadekirina pirtûkên hînkirina Kurdî li dibistanên navîn, ji bo xwendekar û hîner (learner) ast û temen mezin jî projeyek hatiye birêvebirin. Di çawoweya projeyê da dîsa ji akademîsyenên EZZT’yê komîsyonek³⁴ hate amadekirin plan ew bû ku seteke hînkirina Kurdî ya sê pirtûkî bête amadekirin. Di encamê da sala 2016an cîlda ewil ya vê setê bi sernavê *Mamoste-1 Fêrkera Kurmancî* hate amadekirin û çapkirin. Ew pirtûk hem li

³¹ Derheqê dersên hîlbijartî yê Kurdî li Tirkiyeyê bnr. Kurt, 2020.

³² Komîsyon ji van akademîsyenan pêk dihat: Kadri Yıldırım, Abdurrahman Adak, Hayrullah Acar, Tahirhan Aydın, Mehmet Tayfun (Malmîsanij), Ramazan Çeçen, Ramazan Pertev, İbrahim Bingöl, Zülküf Ergün, Mikail Bülbül.

³³ Derheqê van pirtûkan da bnr. Kurt, Şehmus. ; Bewran, Ronya. *Beşên dîtir yê vê pirtûka edîtoriyal*.

³⁴ Komîsyona ji van akademîsyenan pêk dihat: Abdurrahman Adak, Tahirhan Aydın, Zülküf Ergün, Mikail Bülbül

dersên bijartî yên beşên Zanîngeha Mardin Artûklêyê, hem jî li qursên hinkirinê Kurdî yên li zanîngehê bi xwe û gelek sazî û dezgehên dîtir da wek materyala hînkirinê hate amadekirin.³⁵

4.4. Kovarên Esntîtûyê: Mulemma û JMS

Digel xebatên di qewareya pirtûkan da li EZZT'ya Zanîngeha Mardîn Artukluyê weşanên periyodîk jî hatine amadekirin. Ji van weşanan ya ewil kovareke edebî û popular ya pirzimanî bû. Kovar bi nave Mulemma derdiket û tenê jimarên hate weşandin; jimara ewil sala 2013an, ya duyem sala 2014an û ya sêyem ji sala 2016an hate weşandin. Ew kovar niha betal e û li weşanên xwe berdewam nîne.

Wek sazîyeke akademîk li EZZT nedibû ku kovareke akademîk a bi hakem neyê weşandin. Herçend ji salên ewil ên avakirina enstîtûyê pê ve wek projeyek hebe jî kovara akademîk incax sala 2016an meha Tebaxê bi nave The Journal of Mesopotamian Studies (JMS) wek kovareke navneteweyî ya pirzimanî (Îngîlîzî, Tirkî, Erebi, Kurdî) dest bi weşanê kir. Kovar salê du jimarên tête weşandin. Herçend kovareke pirzimanî be jî, wek prensîb hatiye qebûlkirin ku di her jimarê da herî kême sedî pêncî ji nivîsan bi Kurdî (hemû zarava) bin da ku Kurdî wek zimanekî xebat û metnên akademîk û zanistî bêtir xuyabar bibe. Li jêr li gorî salan jimara gotaran bi giştî û rêjeya gotatên bi Kurdî an jî yen qada xebatên Kurdî hatine pêşkêşkirin.

Tablo 3. Jimara Gotarên JMSê û Rêjeya Gotarên bi Kurdî

Sal	Jimara Gotaran	Gotarên bi Kurdî / li ser Kurdî
2016	7	7
2017	18	15
2018	16	11
2019	16	11
2020	13	12
SERCEM	70	56 (%80)

³⁵ Derheqê dersên hîlbijartî yên li Zanîngeha Mardîn Artukluyê û seta hînkirina Kurdî, Mamoste-1'ê bnr. Kurt, 2020.

Kurte

Di çarçovaya talîmatnameya de ku di sala 2012an da hatiye weşandin, Kurdî di bin navê “Ziman û Zaravayên Zindî” da wekî derseke hilbijartî kete mifredeta Wezaretê Perwerdehiya Tirkiyeyê. Bi vî awayî, di sala xwendinê ya 2012/2013 da dersên Kurdî di nav perwerdeya giştî da di pola 5, 6, 7 û 8an da, dest pê kirin. Di çarçoveya vê gotarê de, bi encama lêkolîna meydanî, pirsgirêkên dersên hilbijartî têne vekolîn. Ji ber vê, di serî da, polîtîkayên zimên yên Tirkiyê li hemberê zimanê Kurdî dê bêne pêşkêşkirin. Pişt re, dersên hilbijartî bi rêya xwendekar, malbat û mamosteyan ve- ku sê aktorên temamker ên perwerdeyîyê ne – bidine ber çavan bê gelo dersên hilbijartî çawa xuya dikin. Di dawî da jî, li Tirkiyeyê statûya zimanê Kurdî û pêşaroja zimên bên nîqaşkirin.

1. Li Tirkiyeyê Rewşa Perwerdeya Zimanê Dayikê : astengiyên qanûnî

Di pêvajoya plansazkirina zimanê da helwestên dewleta Tirk yên li ser zimanê Kurdî ku mezintirîn zimanê hindikahiyên Tirkiyê ye, wekî ku Fishman dibêje li ser stratejiyan maskekîrî yên merciyên parêzkar ên plansaziya zimên dimeşin û pêk tînin ji bo serfiraziya vê plansaziya zimên, ji hin berjewendiyên etnîk, siyasî an jî olî sîd werdigirin (Fishman, 1994 : 92). Bi armanca yekbûna neteweyî, dewleteke serwer îdeolojiya xwe li dora siyaseteke yekzimanî navendî dîke û hemî zimanên din ên ku di civatê de tînin xebirdan, jî ji holê radike. Chaudenson (2000) dide zanîn ku pîrzimanîbûn rastîya hemû civatê ye lê ev rastî li çend welatan carinan bi stratejiya siyasetan hatiye înkarkirin. Ji damezirandina dewleta Tirkiyê ya sala 1923an pê ve, ev înkarkirin bi siyaseteke zimên ku ji bo avakirina netewe-dewletek (nation state) ya xwedana yek çand û yek ziman meşiyaye. Ew siyaseta zimanîbi riya homojenîzekirina dîmenê etnîkî û zimanî ya civatê hewl daye bi ser bikeve (Hassanpour, Kangas û Chyet, 1996). Zimanê Tirkî jî bûye yekem amûrê belavkirina îdeolojiya yekzimanîyê bi rêka pîvanên qanûnî. Di xala 88emîn a

³⁶ Ev gotar ji teza Mastera nivîskar hatiye wergirtin ku di beşa zimannasî ya Zanîngeha Rouenê li Fransayê hatiye di sala 2014ê de hatiye parastin (Enseignement du kurde comme langue optionnelle en Turquie : étude de cas dans la province de Batman)

Destûra Bingehîn ya Yekem ya Tirkiyê ku 1924an de danasîna “Tirk” li ser hemî xwedan neteweya Tirk hatîye fêrz kirin bêyî ku cûdahî di nav mirovên ji etnîsîte û olên cihêreng da were kirin.. Di xala perwerdeyê da, pirzimanî bi benda 42a re hatîye qedexekirin.³⁷ Her wiha, Hassanpour dide zanîn ku siyaseta zimên ya Tirkiyê li ser “zimankujî” an jî “jenosîda zimanî” ava bûye (Skutnabb- Kangas& Bucak, 1995). Tasfiyekirina zimanê Kurdî û her weha zimanên din ên otokton armanca sereke ya projeya avakirina neteweya Tirk bû (Zeydanlioglu, 2012). Haig dide zanîn ku qada herî girîng ji bo domandina demdirêj a her zimanekî hindikahî perwerdeya dewletê ye (Haig, 2003). Li Tirkiyê ji bernebûna plansazîya perwerdeya resmî bo Kurdî ku ji hêla dewletê ve tê piştgirîkirin, Kurdî ji alîya înisiyatîvên şexsî û rêxistinên çandî ve hatine hînkirin. Di salên 90ê, bo nimûne, *Navenda Çanda Mezopotamya* (NCM) navendeke çandî ya Kurdî ku di 1991 de li Stenbolê hat damezrandin û li ser parastina çand, huner, dîrok û zimên sekîn. Dûvra wê li bajarên din, wekî Diyarbekir, Wan, Riha, Mersîn, Adana, Îzmîr, navendên çandî saz kirin û gelek dersên Kurdî li dar xistin (Yücel, 2009). Dîsa, *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, ku di 1992 de ji bo danasîna ziman, çand û wêjeya Kurdî û dersên Kurdî hatîye damezrandin. Bi wan zaziyan hewl hatîye dayîn ku Zimanê Kurdî, yêku di dibistanên de nayê bikaranîn, bi vî rengî ve were parastin. Di serê salên 2000an da li Tirkiyê, polîtîkayeke nû li ser reformên zimanî dest pê kir. Meseleya perwerdeya bi zimanê dayikî formeke sosyal hilda. Di çerçoveya *Kampanyaya Perwerde û Hînkariya Kurdî* da, (Kürtçe Eğitim ve Öğretim Kampanyası) di Çiriya Paşîn 2001an da, xwendekarên Zanîngeha Stenbolê bi daxwaznameyeke ji bo vekirina dersên bi zimanê Kurdî li zanîngehan serî li Rektoriyê dan. Di vê kampanyayê da bi qasî 20,000 daxwaznameyên ku li dora pêncî zanîngehan belav bûn, xwendekaran ji rektoran damezrandina dersên Kurdî û vekirina beşên Kurdolojîyê telep kirin (Kenis & Aydın, 2010). Jialîyê din ve, di çerçoveya daxwaza endamîya Tirkiyeyê da Yekîtiya Ewropayê şert kir ku di hin warên wekî demokrasî, mafên mirovan, azadîya xweifadekirinê da Tirkiyê qanûnên xwe li gorî standardên Ewropî ava bike. Yek ji van reforman li ser perwerdeya zimanên xeynîTirkî bû di navend û enstîtuyan da. Parlemontaya Tirkiyê bi Qanûna Hejmar 2932an re ku di 3ê Tebaxa 2002an derxistderî li perwerdeya bi zimanên xeynî Tirkî vekir:

Ji bo fêrbûna ziman û zaravayên cihêreng ku welatîyên Tirk bi kevneşopî di jiyana xwe ya rojane de bikar tînin, dersên taybetî bi şertên qanûna Jimare 625

³⁷ “Türkçe'den başka hiçbir dil, eğitim ve öğretim kurumlarında Türk vatandaşlarına ana dilleri olarak okutulamaz ve öğretilmez.”

ya Saziyên Perwerdehiya Taybet dikarin werin saz kirin. Di van qursan û qûrsên zimanên din de dersên ziman dikarin bi heman armancê werin vekirin. Prensîb û rêgezên derbarê vebûn û çavdêriya van qurs û dersên de bi rêzîknameyeke tê rêve birin ku ji hêla Wezaretê Perwerdehiya Neteweyî ve tê derxistin.,³⁸

Di qanûnê da têgeha zimanê “kurdî” nehatîye bikaranîn, bi vî awayî ew bi naverokê ve sînordar e û dibe stratejîyeje pêximker ji bo perwerdeya zimanê kurdî (Akin, 2003) ji ber ku qanûna bingehîn xala 42yê ya ku dibêje “di saziyên perwerde û hîndekariyê de ji xeynî tirkî çu zimanek wekî zimanê dayikê nikara bê fêrkirin û perwerdekirin” , neguherîye. Ev nîşan dide ku polîtîkaya zimên ya dewleta Tirkî ji bilî gotinên erînî, planên fermî, an nîqaşên giştî hê jî bi “nebûna formûlasyona eşkere ya ramyarî, bi referanseke nerasterast an maskekîrî, an kêmbûna sistematîkî ya referansa di derheqê Kurdî de” (Haig, 2003)³⁹ disekine. Qanûna 2932yê tenê ji bo xwendekaran mezin rê dide dersên kurdî û ji bo dema van dersan jî tenê deh hefte dîyar dike û şert dike ku mamosteyên dersê tirkîaxêv bin û cihê qursan li gor şertên dewletê bin (Yildiz and Muller 2008). Bi vî awayî, li çend bajarên Tirkiyê wekî Stenbol, Diyarbekir, Batman û hwd., di demeke kurt de perwerdeya taybetî ya Kurdî dest pê kir. Li aliyê din, di serî da, li Batmanê, dersên Kurdî ji ber sedemên teknîkî û absûrd yên ku ji hêla rayedaran ve hatine ragihandin nehatin saz kirin. Mesela dêriyê cihê qursê 5cm piçûktir ji standartên rayedaran bûn (Bozarslan, 2005). Piştî mezûnbûna zêdetir ji 1500 kesan, ew ders ji ber sedeman teknîkî û bürokratîk bi biryareke kolektîf hatin girtin (Kurt & Baltekin, 2020). Helbet, pewîstîya *Tevgera Ziman û Perwerdehiya Kurdî* (TZP-Kurdî) ku tevgerê sivîl a çalakî ye û ji bo daxwaza perwerdeya Kurdî wekî zimanê dayikê di 2006 de ava bûye (Opengin, 2010; Sidal 2019). Ev tevger bi taybetî li ser bikaranîna Kurdî di warên giştî û fermî da wekî tevgerê hişyarîya çandî ya bingehîn dest pê kir. Bi taybetî bi boykotkirina dibistanan pewîstîya perwerdeya kurdî wekî zimanê dayikê daxuyand (Erdem, 2011). Di sala 2009 da, hukûmeta tirkî destûr da ku di hin zaninghên da kurdî wekî derseke hîlbijartî were hînkirin. Wekî din beşên ziman û edebîyata Kurdî jî hatin

³⁸ “Türk vatandaşlarının günlük yaşamlarında geleneksel olarak kullandıkları farklı dil ve lehçelerin öğrenilmesi için, 625 sayılı Özel Öğretim Kurumları Kanunu hükümlerine tabi olmak üzere özel kurslar açılabilir; bu kurslarda ve diğer dil kurslarında aynı maksatla dil dersleri oluşturulabilir. Bu kursların ve derslerin açılmasına ve denetimine ilişkin esas ve usuller, Milli Eğitim Bakanlığınca çıkarılacak yönetmelikle düzenlenir.”

³⁹ “[...] lack of overt policy formulation, by indirect or masked reference, or systematic lack of reference to Kurdish, rather than positive assertions, officially formulated agendas, or public debate” (Haig, 2003 : 2).

damezrandin (Kurt & Baltekin, 2020). Di pêvajoya “vebûna demokratîk” (Çiçek, 2018) da di sala 2013 de di bin navê qanûna “fêrbûna ziman û zaravayên zindî” da hêla hikûmetê ve destûra hînkirina zimanên nûjen yên ji bilî tirkî ji hate dayîn. . Bi vî awayî perwerdeya zaravayên kurmancî û zazakî, wek dersa hîlbijartî hefteyê du saetan dest pê kir. Pêdivî ye ku berî ku ev ders ji hêla zarok, malbat û mamosteyan ve were şîrove kirin, em bidin zanîn ku herçiqas di siyaseta zimên ya Tirkîyê da gavekî mezin be jî pîrsgirekên sereke yên ku em ê li jêr li ser bisekinin nîşan didin ku di pratîkê da bi danîna statûyeke netêr ra ev gaveke sembolîk û bêdom bû. Wekî ku Cooper dibêje ew cureyeke polîtîkaya zimên bû; “di derbarê bikaranîna zimanan da komek biryarên ku ji hêla rayedarên eleqedar ve , li gor dilê xwe têne wergirtin.”⁴⁰

2. Hînkirina kurdî wekî derseke hîlbijartî: Ji çavên xwendekar, malbat û mamosteyan

Armanca sereke ya vê lêkolînê ev e ku derbixe hole ka perwerdeya zimanê kurdî wekî derseke hîlbijartî ji hêla sê aktorên sereke yên perwerdeyê anku xwendekar, malbat û mamosteyan ve çava te fehmkirin. Di sala 2012 da destûrdayîna perwerdeya zimanên nûjen ji bilî tirkî di medyayê de dengeke mezin veda. Xwendekarên ku ji bo hîlbijartina dersên kurdî eleqeyeke girîng nîşan didin, piranî li deverên ku nifûsa Kurdan lê pir , kom dibin. Li gorî amaran sala 2014an yên Wezaretê Perwerdeyîya Millî ya Tirkîyê ji nav 81 bajarên , li 28 bajarên 18,847 xwendekaran Kurdî wekî derseke hîlbijartî hîlbijartibûn. Li gor eynî amaran devera yekem ku xwendekaran pirtir kurdî hîlbijartine bajarê Diyarbekir e. Paşê, bi dorê, Mêrdîn, Batman, Şirnex, Colemêrg, Wan, Agirî, Riha, Îdir û Entab in.⁴¹ Dûvra jî du bajarên mezin ên Tirkîyeyê, Stenbol û Izmîr tî. Em di lêkolîna xwe ya 2014an pêşî li van deveran hûr bûn. Ji bo xebata me ku li ser yekem şayesandîna dersên hîlbijartî ya kurdî disekî, hîlbijartina du peywendêncuda (bajar û gund) girîng bûn. Li hin dibistanan , kurdî wekî dersa hîlbijartî ketîbû nav mifredatê lê, ji ber hin sedaman perwerdeyîya kurdî wekî dersa hîlbijartî hê dest pê nekirîbû : yan midûrê dibistanê ji xwendekaran derseke xeynî kurdî wekî dersa hîlbijartî şert dikir yan nebûna mamosteyan kurdî bûbû sebebeke sereke ku dersên hîlbijartî dest pê nekin. Her wiha, di hin dibistanan daxwaza me ya lêkolînê hatin redkirin. Di dawiyê de, li gor şertên sosyolojîk yên

⁴⁰ “[...] is the body of decisions made by interested authorities concerning the desirable form and use of languages by a speech group” (Cooper, 1980 : 160).

⁴¹ Van amaran ji sala 2014 yên Wezaretê Perwerdeyîya Tirkîyê ne : [İşte “Seçmeli Kürtçe”nin Türkiye haritası - Son Dakika Haber \(hurriyet.com.tr\)](http://iste.secmeli.kurtce.nin.turkiye.haritasi-sondakika.haber(hurriyet.com.tr))

2014ê, me Batman wekî peywenda bajêr, gundekî saetek dûrî Batmanê jî wekî peywenda gund hibbijartin. Pirsnameya me bi zarokan re di Adara 2014 de pêk hat û li yek ji mezintirîn dibistanên navîn ên li Batmanê hate kirin.⁴² Li dibistana gund jî eynî pirsname hat çêkirin.

Bi têkîliya sê aktorên perwerdeyê re, anku xwendekar, malbat û mamoste me du cureyên anketan pek anîn: pirsnameyeke nivîskî bi zarokên ku dersên kurdî hibbijartine; hevpeyvînên nivvekirî bi malbat û mamosteyan re.⁴³ Pirsnameya me ya nivîskî li ser 105 xwendekarên pola 5em û 6em ên ku Kurdî wekî derseke hibbijartî hibbijartine, hat meşandin. Me pirsnameya xwe ya nivîskî bi 75 xwendekarên ji dibistanê gund ve bi rê ve bir. Bi temamî pirsnameya me ya nivîskî di herdu peywendan da bi 180 xwendekarên navbera 11 û 12 salî ve hat çêkirin. Ev pirsnameya ku me bi xwendekaran re meşand, bi Tirkî bû, bi temamî ji bîst û sê pirsan û van çar beşan pêk dihat: a) profîla civaknasî; b) zanîna zimên; c) ziman û axaftin; d) hînkirina Kurdî wekî dersa hibbijartî û xwendekar

Ji malbatên ku zarokên wan kurdî hibbijartine, me bîst malbat li bajêr, bîst malbat jî li gund tespît kirin. Bi temamî, bi çil malbatan re me pirsnameyan nivvekirî bi kurdî meşand. Me bi alîkariya xwendekarên herdu dibistanan re malbat peyda kirin. Hevpeyvîna me ya nivvekirî ji bîst û du pirsan û van li sê beşan pêk dihat: a) profîla civaknasî; b) zanîna zimên; c) hînkirina Kurdî wekî dersa hibbijartî û malbat.

Dîda bi tevahî li gel pênc mamosteyên Kurd hevpeyivîneke nivvekirî hat çêkirin: ji wan sê mamoste ji dibistana navîn ya Batmanê; du jî ji dibistana navîn ya gund in . Hevpeyvînên me yê nivvekirî ji hejdeh pirsan û van du beşan pêk dihatin: a) perwerdekirina mamosteyan; b) pêvajoya perwerdeya zimanê Kurdî wekî dersa hibbijartî û mamoste. Di tabloya jêrîn de bi kurtayî rêbaza anketan hatine nîşandan :

⁴² Em tercîh dikin ku navê gund û her dû dibistanan ku me lêkolînê xwe pêk anîye anonîm bêhêlin.

⁴³ Pirsnameya nivîskî li gorî temen û asta xwendinê ya xwendekaran hate bingehtirin. Tê de hem pirsên vekirî hem jî pirsên girtî henin. Hevpeyvîna nivvekirî wekî metoda anketeke hibbijart ji ber ku ew kesên ku me pê re anket çêkirine di çarçoveya mijara pirsê, dikarin bi azadî bersiv bidin.

Tablo 1. Rêbaza lêkolîna meydani

Kes	Xwendekar		Malbat		Mamoste	
	Bajar	Gund	Bajar	Gund	Bajar	Gund
Peywend						
Hejmara kesan	105	75	20	20	3	2
Cureya hevpeyvînê	Pirsnameya nivîskî		Pirsnameya nivvekirî		Pirsnameya nivvekirî	

Li jêr, di serî da em ê anketên li gel xwendekaran analîzbikin. Pişt re, em ê li ser encama anketên li gel malbatan bisekinin. Di dawîye de, em ê encama bersivên mamosteyan pêşkêş bikin.

2.1. Profila civaknasî ya xwendekaran û zanîna zimên


Xwendekarên ji dibistana gund ji malbatên mezintir in û xwedî statûyeke sosyo-ekonomîk ya kêmtir in ji xwendekarên dibistana bajarî . Li dibistana navîn ya bajarî, me anketa xwe ya nivîskî bi 105 xwenderan re pêk anî (50 keç û 55 kur); li dibistana navîn ya gundî jî bi 72 xwendekar an re (35 keç û 39 kur). Tabloya li jêr (Tablo 2) zayend, temen û hejmara xwişk û bira yê xwendekaran nîşan dide:

Tablo 2. Zayend, temen, hejmara xwişk û bira yê xwendekaran


Xwendekar	Zayend		Temen	Hejmara xwişk û bira
	Keç	Kur		
Bajar	50	55	11,5	3,71
Gund	35	39	11,78	4,85

Ji bo ku pêwendîya zarokan bi zimanê resmî yê perwerdeyî, anku Tirkî û zimanê Kurdî ku belkî di jiyana rojane da ji derdora xwe dibihîsin û cara yekem li dibistanê wekî derseke hîlbijartî hîn dibin me xebata anketê pêk anî. Me xwest bizanin ka, ew kîjan bi zimanan xeber didin û herî baş bi kîjan zimên diaxivin û ew bi kîjan zimanan bi kesan cuda re (dê, bav, xwişk, bira, dapîr,

bapîr, heval, mamoste) diaxivin. Grafika 1 ya jêrîn, encamên “zimanên ku ji aliyê xwendekaran ve tên xebordan” nîşan dide:




Encama bersiva xwendekaran nîşan dide ku %68.3 ji xwendekarên bajarê û %82 ji xwendekarên gund bawer dikin ku ew hem bi Tirkî hem jî bi Kurdî diaxivin. Yê ku tenê bi Tirkî diaxivin di dibistana bajarî de % 27,7 in, lêbelê ev rêje di dibistana gund de tenê % 8,7 e. Bi heman awayî % 9,3 ji şagirtên dibistana gundî tenê Kurdî wekî zimanê axaftinê ragihandine, lê ev rêje di dibistana bajarî de dikeve % 4'ê. Gava ku em bersivên jêrin (Grafik 2) yê pîrsa “zimanên ku ji aliyê xwendekaran re herî hêsantên xebordan” dinêrin, herçiqas rêjeya Tirkî bilind be jî em dibînin ku bikaranîna Kurdî li gund zedetir e û tekîlîya zarokan bi zimanên Tirkî û Kurdî re ji hev cuda ye:



Herçiqas zimanê Tirkî ew ziman e ku xwendekaran ji du peywendan (bajar % 82,7 û gund, % 51,4) wekî du zimanên herî hêsan xeber didin, nîşan dane jî, yê ku bi Kurdî herî hêsan diaxivin li gund (% 36,1) ji bajarî (% 8,7) pirtir in. Xwendekarên ku texmîn dikin ew bi du zimanan, Tirkî û Kurdî, çêtir diaxifin li bajara %8,7 û li gund % 12,5 in. Bersivên zarokan xuya dike ku bikaranîna Kurdî hem li bajêr hem li gund heye. Gava ku em li Grafika 3 ya bersiva pirsê “Zimanên ku ji aliyê zarokan ve bi muxatabên cuda re tên axaftin” mêze dikin, em dibînin ku bikaranîna Tirkî û Kurdî li gor kesan ku xwendekaran pê re diaxivin, diguhere:

Tirkî & Kurdî	47,1	41,7	44,7	41,7	16,5	40,3	28,2	12,5	31,6	15,3	7,6	53,1	5,7	19,4
Tirkî	32,7	8,3	34	12,5	68,9	27,8	15,5	2,8	18,8	2,8	90,4	33	92,3	68,1
Kurdî	20,2	50	20,3	45,8	9,7	26,4	50,5	76,4	35	63,8	1	11,1	1	9,7
Bêbersiv	0	0	1	0	4,9	5,5	5,8	8,3	14,6	18,1	1	2,8	1	2,8


Grafik 3. : Zimanên ku ji aliyê zarokan ve bi muxatabên cuda re tên axaftin



Li gorî encamên ankêtên ku bi xwendekaran re hatine kirin, di peywenda bajêr de, Tirkî û Kurdî ew ziman in ku xwendekar herî zêde bi dê û bavê xwe re diaxifin, rêjaya wan bi rêzê % 47,1 û % 41,7 e; ji aliyê din, bi eynî muxataban re, xwendekarên dibistana gund herî zêde bi Kurdî diaxivin rêjeya wan %50 û % 45.8 e. Wekî din, xwendekarên bajarî xîtabî xwişk û bira û hevalên xwe bêtir bi Tirkî dike, rêjeya wan % 68.9 û % 90.4 elê xwendekaran ji dibistana gund bi wan re bi du zimanan, Tirkî û Kurdî bi van rêjeyan % 40.3 û % 53.1 diaxivin. Ev nîşan dide ku bikaranîna Tirkî, zimanê Kurdî ji holê ranake, ew ziman li gundan di nav mezinan de cihek girîng digire. Girîng e ku mirov teqez bike ku bikaranîna Kurdî di têkiliya xwişk, bira û hevalên xwe de li gorî herdu kontekstan diguhere: rêjeya bikaranîna Kurdî nîşan dide ku Kurdî di nav xwendekarên bajêr ji yên ji gund kêmtir tê bikaranîn (xwişk û bira li gund % 26,04 ; li bajar % 9,7). Bi gelemperî, şagirtên dibistana gundî ji bo ku bi dê û bavên xwe re têkilî daynin Kurdî bi kar tînin, dema ku yên dibistana bajêr bi wan re xeber didin bi Tirkî diaxifin. Bikaranîna Tirkî ji bo têkiliya di navbera xwişk û bira, heval û mamosteyên herdu peywardan serdest e. Kurdî bi piranî li gund bi mirovên ixtiyar re tê axaftin. Jixwe, karanîna Kurdî her ku emir zede dibe pirtir te bikaranîn. Wekî din, her ku meriv ji çarçoweya malbatê dûr dikeve, ewqasî Kurdî qadên karanîna xwe winda dike û berê xwe dide Tirkî. Em rêgezêk paralel a ku di lêkolîna Opendin (2009: 106) hate dîtin dibînin : her ku endam di warê xizmi de nêz, pîr û nexwendî be ew qas jî bikaranîna kurdî zêde dibe.

2.1.1. Nêrina xwendekaran li ser dersên hîlbijartî ya kurdî


Hema hema hemî xwendekaran ji du peywardan (bi rêze ve %73,3 û % 77,8), ragihand ku wan ji hêla dibistana xwe ve destpêkirina dersên Kurdî bihîstiye. Formên darsa hîlbijartî ya ku ji hêla dibistanê ve dihatin belavkirin pêdivî bû ku ji hêla xwendekaran ve bêne dagirtin û ji hêla dêûbavan wan ve bêne îmzekirin. Ji bo ku em motîvasyonên xwendekaran ji bo hîlbijartina zimanê Kurdî wekî derseke hîlbijartî bizanin, me ev pirsê vekirî ji zarokan pirsî: “Tu çima Kurdî wekî derseke hîlbijartî hildidî?”. Grafîk 4 encamê bersiva zarokan bo vê pirsê nîşan dide :



Bersiva zarokan pirtir wîsa ne: ‘ew zimanê me ye’; ‘zimanê derdora me ye’ ‘dixwazim baştir hîn bibin’. Ji nav wan bersivan piraniya xwendekarên ji herdu dibistanan ev bersiv dan : da ku em zimanê xwe ya dayikê baştir hîn bibin" (bi rêzê ve % 71.6 û % 72.0). Dûv re, di herdu peywnedan da, % 20 xwendekar dibêjin: “Ew zimanê malbata min û yên derdora min e, ji ber vê yekê ez dixwazim xwe têda baştir bikim.” Di dawiyê da, ji % 10 ji şagirtan dibên “ji ber ku ez ji Kurdî pir hez dikim.” Helbet bersiva zarokan nîşan dide ku, têkîliya zarokan bi Kurdî re xurt e û xwendekarên ji dibistana gund û bajarê dixwazin ev di zimanê xwe da pêşda biçin.

2.1.2. Di dersên kurdî de çalakîyên herî hezkirî


Herçiqas ev yekem tecrûbeya hînkirina Kurdî be bi statûyeke simbolîk û bi hin pirsgirekên materyal û pedagojîk yê girîng dest pê kiribe jî me xwest em bizanin ka çalakîyên herî hezkirî yê zarokan kîjan in. Piraniya xwendekarên li dibistanên gund "xwendina bi Kurdî" wekî çalakiya herî hêzkirî (% 33) ragihand. % 27.9 ji xwendekarên dibistana bajarî “sohbata Kurdî” wekî çalakîyê herî hezkirî nîşan dan. Wekî din çalakîyên din yê herî hezkirî di grafika 5an de hatine nîşandan.



Encamên jorîn hem daxwaz hem jî belkî zehmetîyên zarokan ên xwendin an nivîsandina bi Kurdî derdixin holê. An jî ev encam îşareta xelatîya plansazîya perwerdeya dewletê ye. Statûya derseke hîlbajrtî ya Kurdî hem ji bo fêrbûna Kurdî hem jî bo nasnameya zarokan girîng e. Bê guman, zimanê fermî û mecbûrî yê perwerdeyî Tirkî ye û xwendekarên dibê ku tenê di çerçova malbatê de bi rêya bihistinê bi Kurdî re tekîlî danîne û cara yekem e ku bi forma nivîskî Kurdî dibînin. Helbet bi lêkolînên ku li ser esasa çavdêrî disekine em dikarin zehmetîyên xwendekaran derxin meydandê. Mesela di lêkolîna Coşkun, Derince û Uçarlar (2010) hatîye tespîtkirin ku zarokên ku zimanê wan Kurdî ye û destpêkirina dibistanê de tenê bi Tirkî xwendin û nivîsandinê hîn dibin pîrsgirêkên, perwerdeyî, civakî û zimanî û psîkolojîk nîşan didin. Dema ku em ji 2014'an heya îro polîtîkaya zimên ya dewleta Tirk mêze dikin, em ji destpêkê de nebûna siyaseteke esas li ser perwerdeya Kurdî wekî zimanê dayikê dibînin. Îro di pratîkê de bi tunebûna dersên Kurdî wekî dersên hîlbajrtî di pêşarjê çî pîrsgirêkên nasnameyê yê xwendekaran çêbibin helbet lêkolînên din dê nîşan bidin. Lê, bersivên xwendekaran xuya dikin ku cihgirtina Kurdî di dibistanê de ji aliyê zarokan êrînî hatîye dîtin.

2.2. Profîla civaknasî û zanîna zimên ya malbatan kurd

Di vê beşê de, em ê li ser encamên hevpeyvîna xwe ya nîvvekirî bisekînin. ku bi 40 malbatên ku zarokên wan Kurdî hîlbijêrtine hatiye kirin Profîla wan a civaknasî, zanîna zimên û rola wan di pêvajoya hîlbijartina dersa Kurdî dê bîn nîqaşkirin. Li gund 18 malbat (% 90) ne xwedayî karekî ne. Li bajêr ev rêje 7 malbat (35 %) e. Temenê hemû malbatan yê herdu peywendan hema hema 37 sal in. Van malbatan, Kurdî wekî zimanê xweyê dayikê nîşan daye. Di herdu çarçoveyan de, ji nîvî zêdetir dêûbav (% 50 li gundan û %55 bajar) wateya zimanê dayikî wiha şîrove kirin: “Em Kurd in, ev zimanê me, rehên me ye”, “Ev zimanê diya min û ya bav min e”, “Ev zimanê vê herêmê ye”, “Em jê hez dikin û em xwe di vê yekê de îfade dikin”. Ji % 40dêûbavên ji gund û %45dêûbavên ji bajar dibêjin “Ew ya me ye hebûn û nasnameya me”, “Ew rastiya kurdbûnê ye”. Ji bo van malbatan zimanê dayikê nirxek nasnameyê temsîl dike. % 10 dêûbavên gund rola azadiyê bi zimên ve girê didin, û diyar dikin ku “Ew e azadiya me, û sedema têkoşîna me ya dirêj e”.



Li gor bersivên 40 malbatan, sê me'nyên zimanê Kurdî derdikevin. Yek, Kurdî wekî zimanê dayikî ; du Kurdî wekî hebûn û nasname ; se jî azadî. Helbet ev xal nîşan didin ku girîngîya zimên bi nasnameyê re giredayîye, lê gelo ji bo hînkirin û feydaya perweya bi zimanê dayikê malbat çî difikirin? Ji bo bersiva vê pirsê em ê li jêr xalên ku ji aliyê malbatan ve hatine gotin nîşan bidin.

2.2.1..Nêrina malbatan li ser dersên hîlbijartî

Hemû malbatên herdu peywendan perwerdeya bi Kurdî erînî dibînin. Wan malbatan bi piranî ji bo destpêkirina perwerdeya Kurdî wiha gotin : “Tiştêk pir baş e”, “Em hêvî dikin ku bidome”, “Tiştêk pir baş e êdî Kurdî qedexe nine.” Dîsa hemû malbat dixwazin ku zarokên wan dersa kurdî bişopînin. Me pirtir dixwest bizanin ka ji çavê malbatan feydaya hînbûna Kurdî çî ye ? Gelo hayê malbatan Kurd di dibistanê de ji girîngîya perwerdeya bi zimanê xwe heye ji bo pêşdaçûna zarokên xwe? Encamên bersivan dîyar kir ku hema hema hemû malbat li ser girîngiya zimên wekî nasname sekînin: Piraniya dêûbavan (li bajar %50, li gund jî %50) girîngîya perwerdeya zimên wîsa difikirin: “Ji fêrbûna zimanê dayikê û çandî çî girîngtir e”, “Zimanê dayikê sedema sereke ya hebûna me ye”, “Ji bo ku zarokên me koka xwe ji bîr nekin girîng e”, “Ji bîr nakin ka em kî ne, ji kû hatine û bi kîjan zimanê em pê re radigîhînin”. Hin malbat (% 25 li gund ; % 45 li bajêr) li ser bingeha pêşketina jêhatîbûna devkî ya bi Kurdî sekînin : “Zarokên me bi kurdî baş nizanin, perwerdeyî ji bo çareserkirina wê dê bibe alîkar”, “Ew ê bi zimanê ku pê diaxivin hîn bibin”, “Ji bo xeberdana wan bi derdora wan re çêtir e.” Di çarçoveya me ya gundeweriyê de 4 malbat (% 20),li ser van xalan disekin: “Perwerdekirina zimanê Kurdî ji bo Kurdan girîng e bi qasî ku zimanê Tirkî ji bo Tirkan girîng e”, “Mafê zarokên me jî heye ku zimanê xwe hîn bibin.” Tenê yek ji malbatên gund (% 5) di wê baweriyê de ye ku “zarok dikare bi zimanê ku diaxive jî bifikire, ev dikare ji bo fêhmkirina dersan hêsantir bike.” Yek ji malbatên bajêr (%5) di wê baweriyê de ye: “Eger derfet hebe ku zimanê xwe yê rojane li derdorî li dibistanê bi kar bîne, ew dikare bi her du zimanan bifikire.”

Tablo 3. Li gor malbatan girîngiya perwerdeya bi Kurdî		
Bersiv	Bajar	Gund
Hînbûna zimanê dayikê	%50	%50
Hînbûna xebardana zimanê derdorî	% 25	%45
Perwerdehiya wekhev a bi Kurdî û Tirkî	% 20	–
Bi herdu zimanî fikirin	% 5	% 5

Helbet em dikarin bêjin ku malbatên Kurd perwerdeya Kurdî girîng dibînin. Lê gelo em dikarin bêjin ku malbat xwedî plansazîyeke zimanî ya malbatî ne ku ev jî li malê esasa bikaranîna Kurdî ye. Helbet lêkolîn nîşan didin ku heger malbat di pratîkên xwe yên zimanî de li ser îdeolojîyeke esas ya bikaranîna zimanê xwe bisekînin ev arîkarîya hînbûn û pêşdaçûna zarokan di dibistanê de dikin (King, Fogle, Terry 2008). Di derheqa Kurdî de, bi taybetî di konteksta Tirkiyê de pirtirin

van salên dawîn, xebardan nîvisandin û perwerdekirina bi Kurdî gîhîştîye qada qedexekirinê. Belkî hewcedarîyeke mezin ev be ku hişyarkirinek li gel malbatan were kirin da ku ev bikaribin polîtîkayeke zimên ya malbatî bidomînin.

2.3.Profila civaknasî û zanîna zimên yên mamosteyan kurd

Di vê beşê de, em ê tecrûbeya perwerdeya Kurdî wekî derseke hîlbijartî ji çavên mamosteyên Kurdî binirxînin. Hemû mamoste diyar dikin ku ew xeynî dibistanê, di jiyana rojane da bi Kurdî diaxivin. Sê mamosteyên ji dibistana bajêr mamosteyên zanistên civakî ne. Du mamosteyên ji dibistana gund mamosteya zimanê Tirkî ne. Her 5 mamosteyên Kurdî wekî zimanê xwe yê dayikê nîşan didin. Hemû mamoste di dibistanên xwe da mamosteyên dersên xeynî Kurdî ne, lê netayînkirina kesên ku ji beşan Kurdî yên li zanîngehên wekî Mêrdîn, Muş, Bingöl, xelas kirine, kir ku dersên Kurdî ji aliyê mamosteyan ku li dibistanan îniyisatîf distinin bêne dayin.

2.3.1.. Ji çavê mamosteyan dersên Kurdî wekî derseke hîlbijartî

Me xwest em bizanin ka mamosteyên dersên Kurdî bi kîjan awayî xwestin ku wan dersên bidin. Sê mamosteyên ji bajêr derheqê daxwaza xwe ya dayina dersên Kurdî wisa gotin: “Min dixwest zimanê xwe bi fêrkirina Kurdî re hîn bibim” ; “Awayê çêtir fêrbûna zimanekî fêrkirina wî ye” ; “Ez li cihekî din dersên Kurdî fêrî dibim. Fêrkirina Kurdî jî alîkariya min dike ku zimanê dayika min baştir bibe.” Ji aliyê din, du mamosteyên ji dibistana gund wiha dibêjin : “Ev zimanê min ê, min xwest belabûna wî de alîkarîyekê bidim” ; “Ev zimanê min e û ev alîkarî zarokan dike ku bi herdu zimanan bifikirin”. Bersiva mamosteyan helbet nîşanê kêmbûna plansazîya perwerdeya Kurdî dike. Heger plansazîya perwerdeya Kurdî bi gavên berbiçav bihata kirin, hingê hewce dikir ku mamosteyan ku beşên Kurdî xelas kirine, dersên Kurdî bidana û hem astên xwendekaran hem yên mamosteyan, berîya ku dersên Kurdî dest pê bikin, bi xebatên pilot bihatana tespîtkirin. Tevî eleqeya mezin a gel ji bo van dersan ji hêla van mamosteyan ve, çend celeb pîrsgirêkên mezin hatine eşkerekirin, bi taybetî di ware materyal, dîdaktîk û pedagojîk da. Statûya Kurdî wekî derseke hîlbijartî dike ku Kurdî tenê heftayê du saetan were hînkirin. Wekî din, saetên dersên Kurdî ye - ku piştî darsa dawî ya rojê tê danîn, dibe sedema rêjeyek bilind a nebaşdariya xwendekaran di dersê da. Di nav hemû zehmetiyan da, nebûna materyalên perwerdeyî, nebûna mamosteyên perwerdekirî pîrsgirêkên bingehîn in li gorî mamosteyan. Tablo 3 li gorî mamosteyan astengên dersên Kurdî kurte vedibire:

Tablo 4. Astengên dersên Kurdî

Bajar
Perwerdeya Kurdî wekî dersa hilbijartî & saetên dersan
Cudahî di nav astên xwendekaran da
Nêbuna mamosteyan
Gund
Perwerdeya Kurdî wekî dersa hilbijartî & serdestiya zimanê Tirkî
Pirsgirêka xebardana xwendekaran

Derheqê motîvasyona xwendekaran ji bo dersên Kurdî 5 mamoste li ser xalên girîng sekinin. Li gor sê mamosteyên dibistana bajêr: Xwendekar “hema hema hemî pir bi motîve ne, hinek cesaretê wan kêma in ku bi Kurdî biaxifin”; “Ew bi hewes in pêşkeftin û pêşwazî ne”; “Motîvasyona wan heye, lê taybetmendiya dersê, derseke hilbijartî dawîya rojê dike ku xwendekar neyin dersê.” Du mamosteyên gund jî bi muqayesekirina dersên Kurdî û Tirkî ve ev bersiv dan: “Motîvasyona wan bo dersên Kurdî ji ya Tirkî xurttirin” û “Ew bi taybetî ji hêla dersên Kurdî pir motîve dibin.” Ji destpêkirina dersên Kurdî heta îro bêguman ev pirsgirêkên sereke nehatin çareserkirin ji ber ku ev statûya sembolîk ku Kurdî derseke hilbijartî hat dayîn, di pratîkê de nameşe.”

Hin encam

Ev lêkolîn destnîşan dike ku herçend destpêkirina dersên Kurdî ji bo xwendekar, mamoste û malbatan şahiyek mezin be jî heya ku plankirina perwerdeya Kurdî bi avayekî sistematîk, bi guhartina qanûnî destpê neke û Kurdî wekî zimanê dayîkê neyê fêrkirin, pirsgirêkên civakî, siyasî, perwerdeyî û derûnî dê berdewam bikin. Rewşa zimanê Kurdî û axêverên wî yê îroyîn, wekî Akin diyar dike, ji ber nebûna siyaseta zimanî ya sazûmanî ya ji bo bikaranîna wê di warên cûrbecûr, ji ber nebûna perwerdeya bi zimanê Kurdî dike ku nifşên nû ber bi ziman û çanda serdest anku Tirkî biçin û zimanê Kurdî di nav nifşan de li Tirkiyê qels bibe (Akin, 2016). Jixwe, wek Çaglayan (2014) dide zanîn nifşên nû yê ciwanên Kurd bi tevahî an qismî bi zimanê xwe nizanin.

Çavkanî

Araz, S., 2015, “Le kurde langue optionnelle dans le système éducatif turc : problèmes et perspectives”, Hall, 1-12.

Akin, S., 2003, “ La langue kurde dans les lois linguistiques turques”, *Cahiers de Confluences « Les Cahiers de La Méditerranée*, 233-237.

Akin, S., 2016. “ Langues et discours en situation de guerre : une approche sociolinguistique et pragmatique,” *Lengas*, <http://journals.openedition.org/lengas/1177>

Aydin, D., & Keniş, Ş., 2010, “Üniversitelerde Kürtçe Eğitim”, *Bükak, Bü’ de Kadın Gündemi* , [Üniversitelerde Kürtçe Eğitimi \(boun.edu.tr\)](http://www.boun.edu.tr)

Bozarslan, Hamit., 2005. “The Kurdish issue in Turkey following the 2003 Iraqi war”, *The Kurdish question and the 2003 Iraqi war*, 123–135. Costa Mesa: Mazda Publishers.

Chaudenson, R., 2000, “Planification linguistique, droit à la langue et développement”. *Estudios de Sociolingüística*, 1 (1), 191-201.

Cooper, R. L. (1989). *Language planning and social change*. New York: Cambridge University Press.

Coşkun, V., Derince, M-Ş., & Uçarlar, N., 2010, *Dil Yarası, Türkiye’de Anadilinin Eğitimde Kullanılmaması Sorunu ve Kürt Öğrencilerin Deneyimleri*, Disa, Diyarbakır.

Çaglayan, H., 2014, *Aynı Evde Ayı Diller: Kuşaklararası Dil Değişimi / Eğilimler, Sınırlar, Olanaklar Diyarbakır Örneği*, Diyarbakır, DİSA, Lîs.

Erdem, H., 2011, ‘Kürt Meselesinin Çözümünde Anadilin Eğitimde Kullanılmasını Konuşmak’, *Liberal Düşünce*, 16 : 63, 141 – 15.

Fishman, J. A., 1994, “Critiques of Language Planning: A Minority Languages Perspective,” *Journal of Multilingual and Multicultural Development* 15 (2 and 3), 91–9.

Haig, G., 2003, “The invisibilisation of Kurdish: the other side of language planning in Turkey”, *Die Kurden: Studien zu ihrer Sprache, Geschichte und Kultur*, 121-150.

Hasanpour, A., Skutnabb- Kangas, T., & Chyet, M., 1996, “The NonEducation of Kurds: A Kurdish Perspective”, *International Review of Education* n°4:42, 367-379.

Hasanpour, A., 1992, *Nationalism and Language in Kurdistan 1918-1985*, Mellen Research University Press, San Fransisco, 520.

Scalbert-Yücel, C., 2009, “The Invention of a Tradition: Diyarbakır’s Dengbêj Project”, *European Journal of Turkish Studies*, [The Invention of a Tradition: Diyarbakır’s Dengbêj Project \(openedition.org\)](#)

Skutnabb- Kangas, T., & Bucak S., 1995, “Killing a mother tongue – how the Kurds are deprived of linguistic human rights”, *Linguistic Human Rights: Overcoming Linguistic Discrimination*, Mouton, Berlin, 347-370.

King, K., Fogle, Lyn., Logen-Terry, A., “Family Language Policy”, 2008, *Language and Linguistics Compass* 2, [Kendall A. King, 2008, Family language policy.pdf](#)

Kurt, Ş., & Baltekin, N., 2020, “Türkiye’de kürtçe Öğretmeni: Yetiş(tir)me ve Kürtçe Öğretim Deneyimine İlişkin Bir Çözümleme,” *Şarkıyat*, 12:3, 819-839.

Yildiz, K., & Muller, M., 2008, *The European Union and Turkish accession: human rights and the Kurds*. London: Pluto Press.

Zeydanlioglu, W., 2012, “ Turkey’s Language Policy , The Kurdish Linguistic Landscape: Vitality, Linguicide and Resistance,”*The International Journal of the Sociology of Language*, 99-125.

ANALÎZA PIRTÛKÊN DERSAN ÊN KIRMANCKÎ (ZAZAKÎ) ⁴⁴

Ronya BEWRAN

DESTPÊK

Zimanê dayikê, ji aliyê dayik, bav û derûdorê malê ve tê hînkirin. Di binhişa mirovan de çêdibe û bi civakê re têkiliyên xurt çêdike (Aksan, 2009: 285). Zimanê ewil ê ku mirov tê de û pê re mezin dibe wek zimanê dayikê tê pênasekirin. Mirov bi zimanê xwe yê dayikê dikare xwe bi awayekî hêsan îfade bike û bi mirovan re têkiliyan daîne. Lewma mirov zimanê xwe yê dayikê çiqas têr û tije hîn bibe dikare bi wî qasî jiyane watedar bike. Ziman fikr û ramanên me şênber dike. Mirov çiqas zêde peyv û bêjeyan bizane, bi awayekî pergali zimanê xwe hîn bibe û bi kar bîne, fikirin jî ewqas fireh û xurt dibe (Ünal, 2005: 8-12).

Perwerdeya bi zimanê dayikê, ji bo her nifş hîn zimanê xwe bibe û çanda netewê bê domandin xwedî çiyekî giring e. Her netew li ser perwerdeya bi zimanê dayikê bi taybetî dixebite û bernameya perwerdeya bi zimanê dayikê amade dike. Ji ber ku netewa kurdan di nav sînorên Tirkiyeyê de wek netew nehatine naskirin û makezagona Tirkîyeyê madeya 42. rê li ber perwerdeya bi zimanê dayikê bi awayekî teqez girtiye, di pergala perwerdeya Tirkiyeyê de cî ji zimanê kurdî re nehatiye dayîn. Heta çend sal berê jî zimanê kurdî bi awayekî defacto qedexe bû û kurdan bi rehetî nedikarî bi zimanê xwe bipeyiviyina. Di sala 2012an de di polên pêncan de dayîna dersên kurdî dest pê kir û di nav dersên hîlbijartî de dersên zimanê kurdî hatin dayîn. Lê belê divê ji pêşdibistanê heta perwerdeya bingeîn yanê di navbera temenê 4-15an de bi awayekî domdar perwerde bi zimanê dayikê bê dayîn.

⁴⁴ Me ev gotar ji teza xwe ya masterê amade kir.

Li Tirkiyeyê plankirina perwerdeyê ji armanc û naveroka bernameya perwerdeyê û pirtûkên dersan heta materyalên alîkar û pedagojîk, her alav di bin kontrola Wezaretê Perwerdeyê de tê amadekirin. Wek her dersê ji bo dersa hilbijartî a kirmanckî jî materyalê herî giring pirtûkên dersan in. Ji bo dersa hilbijartî ya kirmanckî ya pola pêncan heta niha du pirtûk hatine amadekirin. Yek ji van pirtûkan di sala 2012an de a din jî di sala 2017an de hatiye amadekirin. Em di vê xebatê de li ser van her du pirtûkan xebitîn û ji aliyê pedagojî, ziman û zayenda civakî ve ev her du pirtûk analîz kirin û me tespît û pêşniyazên xwe nivîsîn.

Pirtûkên dersan ên bitesîr, bi kêrî xwendekar û perwerdeyê tînin. Ev feyde bi vî awayî hatine rêzkirin; karê hînkirinê bi piranî bi rêya pêşkêşkirinê tê kirin, materyalên dîtbarî karê hînkirinê xurttir dike, fersend çêdike ku mamoste û xwendekar bikarin di pêvajoya dersê de vegehin mijar û zanyariyan û xwendekar xwe azmûn bikin. Bi rêya çalakiyan fersend çêdikin ku xwendekar bi kêfxweşî hînî mijaran bibin û xwendekar dikarin xwe bi xwe jî bixebitin. Fersend didin xwendekar ku fikirîna rexneyî bi wan re çêbibe. Xwendekaran teşwîqî xebitîne dikin (Kalıpcı, 2008: 31).

1. BEŞA YEKÊ

JI ALIYÊ PEDAGOJİYÊ VE ANALÎZA PIRTÛKÊN DERSAN ÊN KIRMANCKÎ YÊN POLA PÊNCAN

Li gor lijneya Zimanê Tirkî (TDK) pedagojî wek zanista perwerdeyê hatiye pênasekirin. Pedagojî têgeheke yûnanî ye û ji bêjeya paisago tê û “pais” zarok û ciwanan temsîl dike. “Ago” jî tê wateya birêvebirinê, îdarekirinê. Perwerdeya kesan, civakîbûn, çand stendin, bihişmendîbûn û zanîna kesan di hundirîne. Pedagojî disîplînek e ku li ser perwerdeya zarokan ava bûye (Yıldırım, 2011: 59).

Di van salên dawiyê de ji bo ku perwerdeyê bikalîte bo zarokan bê dayîn di hemû civakan de hişmendiyek çêbûye. Welatek çiqas bi bês bikeve li ser zanista perwerdeyê jî ewqas zêde dixebite. Lewma pedagojî di pêşketina welatan de xwedî cîyekî giring e.

Di prosesa perwerdekirinê de sê hêmanên bingehîn hene ku li ser hevdu bandorker in; mamoste, xwendekar û bername. Heke di navbera van hêmanan de qutbûnek hebe bandoreke neyînî li karê perwerdeyê çêdibe û encamên ku tînin payîn dê neyên bidestxistin (Çiltaş û Akıllı, 2011: 65).

Di bernameya hînkirina zimanê dayikê de pirtûkên dersan materyalên giring in. Pirtûkên dersan li ser armanc û esasên perwerdeyê tînin amadekirin û di hînbûna de alîkariya xwendekaran dikin. Ji bo di dersên hilbijartî yê kirmanckî de bînan bikaranîn, ji aliyê Wezaretê Perwerdeyê ve di pirtûkên dersan hatine weşandin. Xwendekarên pola pêncan ên ku van pirtûkan bi kar tînin 9-10 salî ne. Zarokên ku di van emran de ne li gor teoriya S. Freudî ya bi navê “teoriya geşedana psîkoseksuel” di heyama latentî (6-12) de ne. Di vê heyamê de zayend veşartî ye. Meraqa zarokên di vê heyamê de ne li ser zayendê ye, dixwazin bi zarokên hemzayendên xwe re hevaltîyê bikin. Keçik taybetmendiyên femînen, lawik taybetmendiyên maskulen distînin. Bi zarokan re civakîbûn pêş dikeve. Rêgezên civakê tînin fahmkirin û pejirandin. Rolên zayendê tînin standin, xurt dibin û di kesayetiyê de çiyê xwe digirin.

Zarokên ku di van emran de ne li gor teoriya E. Erîksonî ya bi navê “teoriya geşedana psîkososyal” di heyama li dijî biserketinê tînkûnê de (6-12) ne. Zarokên ku di vê heyamê de ne hunerên xwe yê hişî û fîzîkî didin der û bi pêş dixin. Zarok di tînkiliyên sosyal de bi pêş dikevin û hesa biserketinê xurt dibe. Bi vê ve girêdayî jî xwebaweriya zarokan xurt dibe. Lê belê di vê heyamê de bi tevger û tesîra derdorê dibe ku hisa tînkûnê jî pêş bikeve û ev yek jî tesîr li ser kesayetiyê çêdike.

Pirtûka yekem KURDÎ 5 ZAZAKÎ; ji aliyê Prof. Dr. Kadri Yıldırım, Alk. Doç. Dr. Abdurrahman Adak, Alk. Doç. Dr. Hayrullah Acar, End. Prwd. Zülküf Ergün, End. Prwd. İbrahim Bingöl, End. Prwd. Ramazan Pertevî ve hatiye amadekirin. Me di vê gotarê de ev pirtûk wek “py” bi nav kiriye.

Pirtûka duyem MEKTEBO MİYANİN ZAZAKİ PİRTÛKÊ MUSNAYIŞI, ji aliyê End. Prwd. Murat Varol, End. Prwd. İbrahim Dağılma, End. Prwd. Buşra Gökalp, End. Prwd.

Ayetullah Karabeyeser, Nurettin Kayğısız, Mahmut Kaya, Mevlüt Bayramî ve hatiye amadekirin. Me di vê gotarê de ev pirtûk wek “pd” bi nav kiriye.

Hejmara tema û çalakiyên ku di her du pirtûkan de hene di Tablo 1.ê de hatiye diyarkirin:

Pirtûk	Hejmara temayan	Hejmara çalakiyên	Têrbûna çalakiyên pîvanê
KURDÎ 5 Zazakî	10	159	Li gor me tema têrin lê belê çalakî kêm in.
MEKTEBO MİYANİN ZAZAKÎ PİRTÛKÊ MUSNAYİŞİ	8	167	Ma gore temayî û aktîvîteyî tayn ê.

Tablo 1 Hejmara temayên di her du pirtûkan de

Di pirtûka yekem de alfabeya ku Celadet Alî Bedirxanî latîniye kiriye hatiye qebûlkirin û 31 tîp hatine bikaranîn: *a, b, c, ç, d, e, ê, f, g, h, i, î, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, ş, t, u, û, v, w, x, y, z* yê (Py, 13).

Di pirtûka duyem de 32 tîp hatine bikaranîn. Tîpên biçûk; *a, b, c, ç, d, e, ê, f, g,ğ, h, ı, i, j, k, l, m, n, o, p, q, r, s, ş, t, u, û, v, w, x, y, z* yê. Tîpên mezin; *A, B, C, Ç, D, E, Ê, F, G,Ğ, H, I, İ, J, K, L, M, N, O, P, Q, R, S, Ş, T, U, Û, V, W, X, Y, Z* (Pd, 13). Alfabe di her du pirtûkan de ji hev cuda ne.

BEŞA DUYAN

BERAWIRDKIRINA JI ALİYÊ ZAYENDIYA CIVAKÎ (GENDER) VE

Têgeha zayendê (sex), jinbûn û mêrbûna biyolojîk yanî mêbûn û nêrbûnê pênase dike. Jinbûn û mêrbûn hew bi endamên zayendê ve girêdayî nînin. Mirovek ji endamên xwe yê zayendê bibe jî zayenda xwe wenda nake û zayenda biyolojîk naguhere. Lewma hew zayenda biyolojîk nikare zayenda mirovî binimîne (Başar, 2014: 247). Zayendiya civakî yanê gender li ser zayenda biyolojîk barkirina rol û berpirsariyên jin û mêran e. Di malbatê de zîl dide û li gor mekan û zamanî teşe digire (Aktaş, 2011: 52).

Zayendiya civakî (gender) wateyeke ji zayendê cihê dihewîne. Zarok pêşiyê di malbatê de hîn dibin bê ka keçbûn û kurbûn çî ye û bi vê ve girêdayî jî rolên keçbûn û kurbûnê ava dibin, tèn stendin û bi cî dibin (Asan, 2010: 65). Rolên ku ji jin û mêran tèn payîn li gor her civakê diguherin, ji zayenda biyolojîk wêdetir li gor wateyên ku li jinbûn û mêrbûnê tê dayîn teşe digirin. Her civak rol û berpirsariyên jin û mêran li gor taybetmendiyan xwe saz dikin. Mirovek bi çanda civakê ve girêdayî jî mêbûn yan jî nêrbûnê derdikeve û dibe jin yan jî mêt (Dökmen, 2004: 38). Rol û berpirsariyên ku ji aliyê civakê ve li jin û mêran tèn barkirin zayenda civakî ava dikin. Ev rol bi zayenda biyolojîk re eleqedar nînin lê belê bi rêgezên civakê re girêdayî ne. Û armanca zayenda biyolojîk ew e ku van rol û berpirsariyan bidomîne. Hişmendiya zayendiya civakî ku ewil di malbatê de çêdibe, bi rêya perwerdeyê xwe xurttir dike û bi vî awayî derbasî hînbûnê nîşên nû dibe. Di pergala pederşahiye de remz û nîşaneyên ku jinan dinimînin ji aliyê jinan ve nayên danîn. Ji ber hem cîhana prîmîtîf hem jî ya şaristaniyê cîhana mêran, pênaseyên ku li jinan tèn barkirin jî ji aliyê mêran ve hatine danîn (Millet, 2011: 83).


Li gor îdeolojiya zayendperestiyê, jinbûn pênaseyên li gor mêran e. Divê jin ji tevgerên ku aîdî mêran in dûr bisekinin. Di civakên pederşahiye de referansa fikr, hîs û tevgeran mêt in. Lewma divê jin pasîf bin, divê hestiyar bin, divê ne bi mejiyê xwe bi hestiyarbûnê bijîn, divê neçar bin û her tim muhtacî mêran bin. Jin hew dikarin bibin dayik û jina mêrekî. Perwerdeya ku dê li jinan bê dayîn jî divê bi van şertan bê dayîn û ji van sînoran derbas nebe. Ancax ev sînor neyên îxlalkirin perwerde bo jinan tê qebûlkirin (Helvacioğlu, 1996: 13). Lewma jî pirtûkên dersan ji bo lêkolîna me materyalên muhîm in.

Di pergala perwerdeyê de hem bi rêya pêvajoya hînkirinê hem jî bi çanda ku di dibistanan de bi awayekî eşkere yan jî veşartî tê hînkirin rêgezên civakê tèn xurtkirin û zexmkirin (Özaydınlık, 2014: 106).

Li Tirkiyeyê avaniya civakê li ser bandora mêran e û ev awa helbet di perwerdeyê de jî wisa ye. Rol û berpirsariyên ku civakê li jin û mêran bar kirine, ji pêşdibistanê heta dawiya perwerdeyê dewam dike. Di dibistanan de bi rêya mamoste, pirtûkên dersan û mufredatê newekheviya zayendiya civakî tê xurtkirin heta ji nû ve tê avakirin (Sayılan, 2012: 49). Zarok newekheviya zayendiya civaka patrîyarkal fahm nakin û nikarin bikevin vepirsîna van rolan (Tan, 2000: 23). Pirtûkên dersan jî bi awayekî aşkera yan jî veşartî tevgerên ku ji aliyê civakê ve hatine pejirandin, urf, adet û toreyan, mît û gotinan neql dikin û di mijara zayendiya civakî de peywira xwe tînin cih.

Li gor lêkolîna me ya li ser van her du pirtûkan, di pirtûka duyem de mêr li ser qursiyên û paldankan rûdinên û jin jî yan li erdê li bin çoga wan rûdinên yan jî li ser piyan sekinandî ne. Ev pirtûk ji bo zarokên 9-10 salî hatiye amadekirin û di vî emrî de hîn geşedana razber pêş neketiye û lewma zarok tiştên ku dibîne wek mutleq, teqez û rast qebûl dike.

Di rûpela 44an a pirtûka duyem de malbatek li odeyekê rûniştî ye û sehbetê dikin. Diya zarokan dûrî wan rûniştî ye û li wan guhdarî dike, neketiye nav sohbetê. Di çanda me de roleke wisa li bûkan hatiye barkirin ku divê bûk bi mezinan re, bi xwesû û xezûrê xwe re rûnenên û civatê nekin. Ev yek eyb e. Ev peyama ku bi awayekî veşartî li zarokan hatiye şandin, dê di binhişê zarokan de ciyê xwe çêbike û li ser tevger û fikirîna wan tesîrê bike.



Şekil 1 Malbatek sohbetê dike lê diya zarokan ji wan dûr rûniştî ye.

Di rûpela 103an ê pirtûka duyem de beşa “EDEB U ADAB”ê de sûreyek hatiye dayîn. “Dadi, babi u merdîmanê xu rê holi bikerên. (Enfal-75)” Li ser vê sûreyê resmek hatiye xêzkirin. Di vî dîmenî de zîlam li ser paldankê rûniştî ye û jin jî li ser piyan sekinandî ye. Ev peyama aşkera berê xwe dide zarokan û ev zarokên 9-10 vê peyamê jî digirin. Dîsa di vê pirtûkê de jin li mitbexê hatine xêzkirin û xwarinê çêdikin (Varol ûêd., 2017: 114). Ev agahî jî li binhişê zarokan de cîyê xwe çêdike û rol tê stendin.

Di unîteya yekem a pirtûka duyem de zûgotinokin hatiye dayîn.

“Cayê camerdi cor dî beno.

Cayê cahili cêr dî beno.

Vatoğ va, vateyanê verinan veramedên.


Verinan va, wa vatoği vateyanê ma vaci” (Pd, 16).

Ev zûgotinok hêmanên zayendiya civakî dihewînin. Lewre tê de mêr wek cînsê bilind û pîroz hatiye nîşandan. Zarok dê vê peyamê jî hilgirin û lawik ji keçikan bilindtir dê bên dîtin.

Di unîteya sêyan a pirtûka duyem de Hesên ji dersa matematîkê, Usman ji dersa sporê, Heyder ji dersa fenê hez dikin lê belê Elîf ji dersa muzîkê, Fatma ji dersa dînê û Şeyma ji dersa resimê hez dikin (Pd, 53). Dîsa di vê roldayînê de jî hêmanên zayendperest hene. Dersên ku ji zarokan re hatine parkirin li gor zayendiya civakê hatine belavkirin.

Di unîteya pêncan a pirtûka duyem de dîmenek hatiye xêzkirin. Di vî dîmenê de kalek nexweş e û di nav nivînan de dirêjketî ye. Li cem kalî zilamek, du jin û zarokek hatiye xêzkirin. Zilam li kêleka nivîna kalî li ser paldankê rûniştî ye, her du jin ku yek ji van jinan jî pîr e û zarok li ser piyan sekinandî ne. Di vî dîmenê de dîsa newekheviya zayendiya civakê hatiye parastin (Pd, 103).

ZIYARET



Dadi, babi u merdîmanê xu rê holi bikerên.

(Enfal-75)

Şekil 2 Zilam li ser paldankê rûniştî ye lê jin li ser piyan in.

Di pirtûka duyem de li mitbexê hew jin hene, zilam tunene. Jin xwarinê çêdikin û firaxan dişon lê belê zilam bi vê rolê nehatine xêzkin. Ev rola çêkirina xwarinan û şuştina firaxan li gor zayendiya civakî di vê pirtûkê de jî li jinan hatiye barkirin. Keçik jî li kêleka dayikên xwe hatine xêzkin û ev yek jî tê wê wateyê ku ev rol ji dayikan derbasî keçikan dibe (Pd, 114).



Ç

Goştari bikerên u biwanên



Gulizar: Dayê tî se kena?

Dadi: Ez wer pocena.

Gulizar: Tî çita pocena?

Dadi: Ez mastuwa, zerbet u xoşaw virazena.

Gulizar: Tî mastuwa pê çitayi virazena?

Dadi: Ez pê rız, du u run virazena.

Gulizar: Tî mastuwa seni virazena?

Dadi: Ez verco du girênena, dıma rız kena miyan. Heta hest bo ez pocena.
Peyni dı zi run kena ser.

Gulizar: Emşo şamiya ma weş a. Ez mastuwa ra zaf hes kena.

Şekil 3 Jin li mitbexê xwarinê çêdike û keça wê jî li kêleka wê ye.

Di rûpela 104an a unîteya heftan a pirtûka yekem de çar lîstik hatine resimkirin. Ev lîstik; veşartok, teytok, çûv û xar in. Di resman de xuya dike ku lawik û keçik bi hev re lîstika veşartokê dilîzin, hew keçik teytokê dilîzin û lîstika çûv û xarê jî hew lawik dilîzin. Diyar e ku lîstik jî di vê pirtûkê de li gor zayendiya civakî hatine belavkirin û li keçik û lawikan hatine barkirin.

Di beşa “Dêki” ya unîteya heftan a pirtûka duyem de çend mamik hatine pirsîn. Yek ji wan ev e: “Azan vendeno nîmac nêkeno, cini geno mare nêkeno” (Pd, 130). Ev mamik jî peyameke zayendperest dihewîne.

Di her du pirtûkên dersan de di metnan û resiman de jin û mêr bi çî rêjeyê hatine xêzkirin di Tablo 2.yan de hatiye diyarkirin:

Kurdî 5 Zazakî		Mektebo Miyanin Zazaki Pirtûkê Musnayîşi	
Keçik	Lawik	Keçik	Lawik
55	106	95	124

Tablo 2 Di tekst û dîmenan de rêjeya axaftina jin û mêran

Di pirtûka yekem de 55 nîgarên jinan û 106 nîgarên mêran hatine resimkirin. Di pirtûka duyem de 95 nîgarên jinan û 124 nîgarên mêran hatine resimkirin. Di pirtûka duyem de hejmara jinan jî ya mêran jî li gor pirtûka yekem zêdetir in lê belê di her du pirtûkan de jî hejmara mêran ji hejmara jinan zêdetir e.

Di her du pirtûkên dersan de li gor zayendê belavbûna pîşe û meslekan di Tablo 3.yan de hatiye diyarkirin:

Kurdî 5 Zazakî		Mektebo Miyanin Zazaki Pirtûkê Musnayîşi	
Keçik	Lawik	Keçik	Lawik
Xwendekar	Xwendekar	Xwendekar	Xwendekar
Hemşîre	Berber	Bermalî	Mamoste
Bijîşk	Bijîşk	Mamoste	Cotkar
	Aşpêj	Bijîşk	Şivan
	Hosteyê dîwaran	Mîmar	Stranbêj
	Gîşekar		Aşpêj
	Stranbêj		Mişag
	Pêşkêşkarê sîrkê		Hesinkar
			Soldir
		Necar	
3	8	5	10

Tablo 3 Li gor zayendan di tekst û dîmenan de belavbûna pîşe û meslekan

Di her du pirtûkan de pîşe û meslek li gor jin û mêran hatine cudakirin. Di pirtûka yekem de jin 3 pîşeyên cuda dikin lê mêr 8 pîşeyên cuda dikin. Di pirtûka duyem de jin 5 pîşeyên cuda dikin lê mêr 10 pîşeyên cuda dikin.

Di her du pirtûkên dersan de zayendiya civakî ya ku di nava malê de xuya dike di Tablo 4.an de hatiye diyarkirin:

Kurdî 5 Zazakî	Mektebo Miyanin Zazaki Pirtûkê Musnayîşi			
	Keçik	Lawik	Keçik	Lawik
Çêkirina xwarinan	-	-	+	-
Debara malê	+	+	+	+
Spor	+	+	+	+
Ajotina bîsiklet, erebeyê	-	+	-	+
Honandin	-	-	+	-
Xwendin	+	+	+	+

Tablo 4 Zayendiya civakî ya ku di nav malê de xuya dike

Di her du pirtûkên dersan de zayendiya civakî ya ji hêla dirûvî ve di Tablo 5.an de hatiye diyarkirin:

Kurdî 5 Zazakî	Mektebo Miyanin Zazaki Pirtûkê Musnayîşi			
	Kênekî	Lajekî	Kênekî	Lajekî
Paqijî	-	-	+	-
Xeml	+	-	+	-
Rengê pembe	+	-	+	-

Rengê şîn	+	+	+	+
Porê dirêj	+	-	+	-
Porê kin	+	+	+	+
Pantol	+	+	+	+
Sernuxumandin	-	-	+	-

Tablo 5 Ji hêla dirûvî ve zayendiya civakî ya ku xuya dike

Di her du pirtûkên dersan de zayendiya civakî ya ku bi zimên hatiye bikaranîn di Tablo 6.an de hatiye diyarkirin:

Kurdî 5 Zazakî	Mektebo Miyanin Zazaki Pirtûkê Musnayîşi
	“Azan vendeno nımac nêkeno, cini geno mare nêkeno.”
	“Cayê camerdi cor dı beno. Cayê cahili cêr dı beno.”
	“Dadiya Berfin pê awa sabunın keye pak kerdên.”
0	3

Tablo 6 Ji hêla zimên ve zayendiya civakî ya ku xuya dike

Di her du pirtûkên dersan de zayendiya civakî li mekên çawa ye di Tablo 7.an de hatiye diyarkirin:

	Kurdî 5 Zazakî		Mektebo Miyanin Zazakî Pirtûkê Musnayîşî	
	Keçik	Lawik	Keçik	Lawik
Mal û derdora malê	10	22	28	26
Dibistan û derdora dibistanê	2	5	9	13
Derve	21	41	18	33

Tablo 7 Ji hêla mekên ve zayendiya civakî ya ku xuya dike

Diyar e ku di her du pirtûkan de jî mêr herî zêde li derve hatine resmkirin û jin jî herî zêde li malê hatine resmkirin.

Encam

Li gor encamên vê lêkolînê pirtûka yekem li ser xwendin, nivîsîn, axaftin û listikan e. Di vê pirtûkê de tema li gor pirtûka duyem zêdetir in lê belê çalakiyên ku di pirtûka yekem de hatine dayîn kêmtir in. Çalakî di pirtûka duyem de zêdetir in û ev yek di hînbûnê de bandorker in. Lewre çalakî çand zêde bin hînbûn ewqas zexm dibe. Di pirtûka duyem de çalakiyên xwendin, nivîsîn, guhdarîkirin, axaftin, çalakiyên Cdyan hatine bikaranîn. Resmên ku di pirtûka yekem de hatine xêzkirin li gor ya duyem kêmtir in. Di her du pirtûkan de jî xeletiyên gramerê hene û ev yek jî bandoreke neyînî li hînbûnê dike. Digel vê alfabe jî di her du pirtûkên dersan de ji hev cuda ne. Cudabûna alfabeyan ji bo xwendekar û mamosteyan rewşeke neyînî çêdike û di hînbûnê de qelsî çêdibin.

Pirtûka yekem zêdetir ketiye tegeran û çalakî, tema û tekst zêde ne dewlemend in. Di pirtûka yekem de materyalên dîtbarî û guhdarîkirinê tunene, di pirtûka duyem de jî materyalên dîtbarî tunene lê belê materyalên guhdarîkirinê hene.

Di her du pirtûkan de jî figurên jin û mêran li gor mekan, bi rêya zimên, ji hêla dirûvî ve, di karbeşiyê de li gor zayendiya civakî hatine çêkirin. Di pirtûka duyem de hem bi rêya resman hem jî bi rêya metnan zayendiya civakî hatiye xurtkirin. Di vê pirtûkê de zimanekî zayendperest hatiye bikaranîn. Zarok û mezin, keçik û lawik, jin û mêr di pirtûka duyem de li gor rêgezên civakê li ser zayendiya civakê hatine avakirin.

Di her du pirtûkan de pîşe û meslek li gor zayendiya civakî hatine cudakirin. Di pirtûka yekem de kî paqijiya malê dike xuya nake lê belê di pirtûka duyem de jin paqijiya malê dikin. Di her du pirtûkan de lawik tiştên xemlê bi xwe ve nekirine lê belê keçikan xwe xemilandine û tiştên xemlê bi xwe ve kirine. Di her du pirtûkan de jî keçik bi porê kin û lawik jî bi porê dirêj xuya nakin. Di pirtûka yekem de keçikan porê xwe nenuxumandiye lê belê di pirtûka duyem de keçikan porê xwe nuxumandiye. Di her du pirtûkan de jî keçik bi rengê şîn hatine resmkirin lê lawik bi rengê pembe nehatine resmkirin.

ÇAVKANÎ

a) Pirtûk

Akin, S. (2013). *Lêkolînên Zimannasiya Kurdî*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Akyüz, Y. (2015). *Türk eğitim tarihi*. Ankara: Pegem Akademi Yayınları.

Başaran, İ. E. (1991). *Eğitime Giriş*. Ankara: Kadioğlu Matbaası.

Binbaşoğlu, C. (1988). *Eğitime Giriş*, Ankara: Binbaşoğlu Yayınevi.

Dökmen, Z. (2004). *Toplumsal cinsiyet, sosyal psikolojik açıklamalar*. İstanbul: Sistem Yayıncılık.

Dökmen, Z. Y. (2004). Cinsiyet kalıp yargılarının ve cinsiyet rollerinin sonuçları. Toplumsal cinsiyet. İstanbul: Sistem Yayıncılık.

Ertürk, S. (2016). *Eğitimde Program Geliştirme*. Ankara: Edge Akademi Yayıncılık.

Fidan, N. (1977). *Eğitimde Yeni Kavramlar ve İlkeler*. Ankara: Rehber Yayınevi.

Helvacıoğlu, F. (1996). *Ders kitaplarında cinsiyetçilik*. İstanbul: Kaynak Yayınları.

Malmîsanij, M. (2002). *Kürt Talebe-Hevi Cemiyeti: İlk Legal Kürt Öğrenci Derneği*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Malmîsanij, M. (2015). *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dilbilgisi*. İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî.

Saylan, N. (2007). *Eğitim Bilimine Giriş*. Ankara: Anı Yayıncılık.

Sayılan, F. (2012). *Toplumsal cinsiyet ve eğitim*. Ankara: Dipnot Yayınları.

Tan, M. (2000). *Eğitimde kadın erkek eşitliği ve Türkiye gerçeği, kadın erkek eşitliğine doğru yürüyüş. Eğitim, Çalışma yaşamı ve siyaset*. Ankara: TÜSİAD Yayınları.

Varol, M., İ. Dağılma, B. Gökalp, A. Karabeyeser, N. Kayğısız, M. Kaya û M. Bayram. (2017). *Kurdî 5 Zazakî*, Ankara: Milli Eğitim Bakanlıđı Yayınları.

Yıldırım, A. (2011). *Eleştirel Pedagoji*. Ankara: Anı Yayıncılık.

Yıldırım, K., A. Adak, H. Acar, Z. Ergün, İ. Bingöl û R. Pertev (2015). *Mektebo Miyanin Zazakî Pirtûkê Musnayişî*. Ankara: Milli Eğitim Bakanlıđı Yayınları.

b) Pirtûkên wergerê

Millett, K. (2011). *Cinsel Politika (Sexual Politics)*. S. Selvi (çev). İstanbul: Payel Yayınevi.

Tyler, R. W. (2014). *Eğitim Programının ve Öğretimin Temel İlkeleri*. E. Rüzgar (çev). Ankara: Pegem Akademi.

c) Gotarên Kovaran

Aksan, D. (2009). “Ana dili”, *Türk Dili*. (31), r. 423-434.

Asan, Hatice T. (2010). “Ders kitaplarında cinsiyetçilik ve öğretmenlerin cinsiyetçilik algılarının saptanması”. *Fe Dergisi: Feminist Eleştiri*, 2(2), Ankara 2010, s. 66-74.

Başar, K. (2014). “Farklı Yönleri İle Cinsel Kimlik: Bedensel Cinsiyet, Cinsiyet Kimliđi, Cinsiyet Rolü Ve Cinsel Yönelim”. *Toplum Ve Hekim Dergisi*. 4(29). Ankara, s. 245-251.

Bedirxan, C.A. (1932). “Elfabêya Qurdî”. *Hawar*. (1). Şam, s. 3-4.

Çiltaş, A. û Akıllı, M. (2011). “Öğretmenlerin pedagojik yeterlilikleri”. *Mehmet Akif Ersoy Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, (4). Burdur, s. 102.

Özaydınlık, K. (2014). “Toplumsal cinsiyet temelinde Türkiye’de kadın ve eğitim”. *Sosyal Politika Çalışmaları Dergisi*, (33). Ankara, s. 93-112.

d) Tezên Neçapbûyî

Aktaş, G. (2011). *Farklı sosyoekonomik ve kültürel özelliklere sahip ailelerde kız çocuklarına ilişkin aile içi kültürel tanımlamalar*. Yayınlanmamış Doktora Tezi. Ankara: HÜ. Sosyal Bilimler Enstitüsü.

Kalıpcı, G. (2008). *İlköğretim 1998 ve 2004 Sosyal Bilgiler Dersi Öğretim Programlarına Göre Yazılmış 4.ve 5. Sınıf Ders Kitaplarının Öğrenme Anlayışları, İçerik ve Kullanılabilirlik Açılarından Karşılaştırılması*. Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi. İstanbul: MÜ. Eğitim Bilimleri Enstitüsü.

Kulantaş, N. (2007). *4. ve 5. Sınıf Sosyal Bilgiler Dersinde Kullanılan Öğrenci Ders ve Çalışma Kitapları ile Öğretmen Kılavuz Kitaplarının Öğretmen, Öğrenci ve Veli Görüşlerine Göre Değerlendirilmesi*. Yayınlanmamış Doktora Tezi. Ankara: GÜ. Eğitim Bilimleri Enstitüsü.

NIVÎSKAR

NURETİN BELTEKİN

RONAYİ ÖNEN

M. ŞERİF DERİNCE

HEWA SELAM KHALED

SELDA ARAZ

ŞEHMUS KURT

RONYA BEWRAN